



Weşana
ENSTÎTUYA KURDÎ YA AMEDÊ

Kovara Dumehane
Sal: 6 Hejmar - 29
Sermawez - Berfanbar 2009

Xwedî û Berpirsiyariya Nivîsaran
Mehmet Aydın ALÖKMEN

Editorya û Redaksiyon
Serwet DENİZ - Elixan LORAN

Mizanpaj û Berg
Enstîtuya Kurdî ya Amedê

Wênayê Berga Pêşin
(Feqiyê Teyran)
Sitar ALÎ

Şewirmendê Hiqûqê
M. Nuri DENİZ

Çapxane
Berdan Matbaası:
Davutpaşa Cd. Güven Sanayi Sitesi
C Blok No: 239 **Topkapı/İSTANBUL**
Tlf: 0 212 613 12 11

Navnîşan
Kalem Sk. No: 32 / 4 Huzurevleri
Kayapınar/DIYARBAKIR

Tlf/Faks
(0412) 237 43 16

E-Mail
kovaraw@yahoo.com
kovarawe@hotmail.com

WEB
www.kovaraw.com

ISSN: 1309-1476

Şertên Abonetiyê
Nava Welat, salek: 25 TL
Welatên Dereke, salek: 70 EURO

Banqe & Nimroya Hesab
Mehmet Aydın ALÖKMEN
Türkiye İş Bankası 8300 Diyarbakır
YTL: 8300 211 48 89
EURO: 8300 073 70 70
USD: 8300 073 70 84

Nimroya Hesabê PTT'ê
Mehmet Aydın ALÖKMEN
590 24 36

- Ji editor / 2
- Stran her bedew û hunermend
her ciwan dimînin ji bo guhdaran - **Zeynep YAŞ** / 3
- Dengbêjî - **Mehmet ONCU** / 10
- Betalî - **Cihan ROJ** / 13
- Bo windayekî daxuyanî - **Yunus EROGLU** / 14
- Şeveke havînê û mirina kalekî - **Brahîm Xelilê ŞILBÊ** / 17
- Feqîr û pirtûk - **Tosinê REŞÎD** / 19
- Huso derdewer - **Mehmûd NEŞÎTE** / 23
- Axîne - **Daîmî BÎNGOL** / 24
- Zarê kevîrî - **Feratê DENGİZÎ** / 25
- Bi xatirê we- **Bozan YAMAN** / 26
- Çiya û derî- **Bîrhan KESKÎN** / 27
- Guldesteyek helbest - **Friedrich NÎETZCHE** / 28
- Pisîk - **William SAROYAN** / 29
- Sembol di helbestên Osman Sebrî de - **Siyamend BRAHÎM** / 32
- Bi rêhevalî dilxwaz in - **Sîpan XIZAN** / 35
- Dosye - **Feqiyê TEYRAN** / 36
- Ey av û av - **Berken BEREH** / 37
- Dilê Feqî - **Feratê DENGİZÎ** / 41
- Feqî xwezanîn paşxane - **Serwet DENİZ** / 46
- Mîr Mih û Mîm û Hê - **Seid DÊREŞÎ** / 49
- Şopên Feqiyê Teyran - **Mîrza RONÎ** / 51
- Warê Feqiyê Teyran; Muks û Werezoz - **M. Xalid SADINÎ** / 54
- Romana Omer Dilsoz, bêhna axê - **Lokman POLAT** 59
- Du gulî - **Dilşêr BÊWAR** / 63
- Sê helbest - **Mehmedxan GULŞENOGLU** / 64
- Berxik - **Fewzî BÎLGE** / 65
- Dêranî gundê Xurûcê - **Aşemê ŞUKRÎ** / 66
- Ji bo du yaran - **Mistefa TUNCYUZLU** / 68
- Dev ji min berdin - **Nesrîn NAVDAR** / 68
- Du helbest - **Şengul OGÛR** / 69
- Ji bo berjewendiya gundiyan - **Mihemed QOSERÎ** / 70
- Pîpa dimeşe - **Robert BROWNÎNG** / 76
- Şev - **Dr. Esed REŞÎDÎ** / 76
- Em bi tevahî zarokên mişextiyekê ne - **Baran NEZAN** / 77
- Noq - **Ezra POÛND** / 78
- Şewat - **Ciwan NEBÎ** / 79
- Ez nizanim bê tê bîra te - **Robîn ŞERNA** / 79
- Xêz - **Ahmet BÎLGE** / 80

*Nivîsên ku ji bo weşanê ji kovarê re tên şandin, li xwediyan wan nayên vegerandin.
Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji edîtor

Roland Barthes di gotareke xwe de dibêje “Nivîskar ew kes e yê ku li gotina ku dixwazî bibêji dixebite. Ji ber vê yekê ji tekane xwediyê zimên e.” Dîsa dema ku Dos-toyevskî romana xwe ya “Kawik” ji yekê re îmze dike li ser wê dinivîse ku “Ji dehan yek ji tiştê ku min dixwest ez binivîsim nehatiye nivîsandin”. Li ser van daxuyanîyan diyar e ku nivîs ev tişt e ku çiqasî ji ezmên dakeve erdê, çiqasî mirov şûjinekê di pêşîra wê re bike û wê kedî bike ji dawîya dawîn nivîs ji cihana *jimeçetiran* e. Çi tiştê ku em dinivîsin û tê nivîsandin geryanek e di cihana nivîsê de, niştasihên cihana nivîsê tune ne! Bi şertê ku em li gotinên xwe yên ku em dixwazin derpêş bikin bixebitin em dikarin bibin qaçax û penaberekî wê cihanê. Lê em bi gotinên xwe qayil bibin û lê nexebitin, dê nivîs rojekê bi me bihese û me ji cihana xwe biqewirîne. Gotina ne hêsan zû zû nayê pêşûsan. Ji ber vê yekê ji nivîs ne ew tişt e ku em çiqasî dikarin li ser avê bimin û avjeniyê bikin, meseleya nivîsê ew e ku em dikarin çend kevîran ji binê ava kûr derxin, bedena me dikare çiqasî bi zemîna deryayê muşeref bibe.

Em wêneyê mezin yê wêjeya kurdî –mebest jê kurmançî ye- bînin ber çavên xwe. Gelo çend kevîrên wêjeya kurdî hene? Ev kevîrên hanê têr dikin ku em ji xwe re malokekê çêkin? Bo qesra abadîna nivîsê hê divê em gelek kevîran ji binê avê derxin.

Serokê YOK’ê Yusuf Ziya Ozcan di daxuyaniyeke xwe ya derbarê “Yaşayan Diller Enstitüsü” yan ji bi navê wê yê din *Hemama Tîr û Fîsan* dibêje ku “Heke ku hûn li kurdî binihêrin gorî tespîtan ji sedî 60-70 farisî ye 20-25 erebî ye û em dizanin ku peyvên tirkî ji tê de hene.” Em ji li ser daxuyanîna wî dikarin bibêjin ku tirkîya tazî tem-bûrê dixwazî!

Dibêjin rojekê zilamek diçe mêvaniyê, tenê keça malê li malê ye. Keça malê ji xwe re şîvê çêdike, sifreya xwe radixe û dixirpişe ser şîvê, gişî dixwe. Jina malê tê ji keça xwe dipirse “keça min ma te çima ji mêvanê me re negot were şîvê bixwe” keç lê vedigerîne “yadê ma devê mêvanê me heye”. Di wê gavê de zîlam devê xwe vedike û ji keçikê re dibêje “Ma ev çikê te ye”. Em ji bo daxuyaniyên brz. Ozcan dibêjin “ma zîmanê Kovara Wyê çi ye?”

Berê digotin zîmanê kurdan tune ye niha ji dibêjin devê kurdan tune ye. Îcar em ê tenê qala çend peyvên kurdî ku derbasî tirkî bûne bikin, fermo çend peyv; **deste, zînde, pençe, qîz, avdest, baxçe, çarçove, serxweş, serbest, xweşav, peyamber, nêrdewan, gulistan, sêpê, mest, cîwar**. Gelo di tirkî de ev peyvên hanê ji ku tên Yusuf Ziya Ozcan? Tirkan ev peyvên hanê ji Asyaya Navîn anîn? Yusuf Zîyan Ozcan, gelo tu dizanî ku karikek heta dibe bizin an ji nêrî di her salekê de navekî wê heye? Golik, mozik, nogin, çêlek tu dizanî ku ev navên hanê her yek ên salekê ne?

Xwendevanên heja ji ber ku kar û barên kovarê bi rêkûpêktir bibin me karê edî-torya û redaksiyonê kirin yek. Û ji niha û şûnde dê ev kar ji aliyê Elixan Loran û Serwet Denîz ve bîn kirin.

Mijara dosyeya Kovara Wyê ya hejmara bê “**Romana Kurdî**” ye. Kesên ku dixwazin beşdarî dosyeyê bibin divê heta **15.12.2009**’an nivîsa xwe bişînin.

Heta hejmareke dîtir ji bilî kurdî dil nedin tu zîmanên di!

Stran her bedew û hunermend her ciwan dimînî ji bo guhdaran

Zeynep YAŞ

Di wextê xwe de li Amêdiyê, xisûmetek di navbeyna malbata bavê Gulbiharê û malbatên din de derdikeve, bi hev dikevin û mecbûr dimînî mişextî bakûrê Kurdistanê dibin

Ji bo mirov welatekî nas bike, mirov her li avahî, wargeh û şaristaniya wî digere. Gava mirov nû diçe warekî mirov dixwaze li şûnwarê wî yên berê, sûk û bazarên wî, sazî û dezgehên wî, şexsiyetên naskirî yên wî warî nas bike bê ka ew welat û warekî çawa ye? Mirov gava ev nas kirin hingê ji pê dihise ku ev war çiqas dûr an nêzikî jiyane ye. Mirov hingê dikare têz û tehlîlan li ser jiyana û civata wî warî û ya xwe bike. Mirov gava avahiyeke kevnare dibîne weke ku mirov rewşa jiyana mirovên wê tarîxê bibîne, gava mirov bazarekê dibîne weke ku mirov hemû hûrde, dan û standin û pêwîstiyên kesên demê borî û îro bibîne, gava ku mirov şexsiyeteke navdar nas dike, çi mirî, çi sax mirov pê hestên hezkiyî yên wî/wê û guhertina ku bi xwe re aniye dibîne û ev yek her wisa berdewam dike... Li van wargehan yekê rastî jineke kurd a hunermend hatim, Gulbihar.

Weke stranbêjeke kurd min li ser radyoyan bi çend stranên wê yên; "Kewa Spêde Bixwêne Ha Bixwêne", "Çi bikim Gelo", "Dilo Dilo", "Ez Keç im Keça Gundan im"... guhdar û nas kiribû û hew. Stranên ku min ji dengê wê lê guhdar kiribû bi dengê ciwanîyê, bi deng û awazên herêma Behdînanê hatibûn gotin. Yek naxwaze bawer bike ku kesa/ê xwediye dengê li pey stranê pîr an jî mirî be. Hunermendên ku muzîka kurdî ya resen dibêjin û tekane ne di asoyê hunera kurdî de mixabin bi giştî mirî ne û şensê me yê ku em wan bi şexsî nas bikin çênebû. Lê şensê min ji aliyê Gulbiharê de lêxist ku

her çendî di temenê pîrî de be jî ez wê bibînim û nas bikim.

Hewla min a ewil ji bo naskirina hunermenda bi nav û deng Eyşe Şanê bû, lê mixabin Eyşe Şanê ji zû ve ji nav me bar kiribû û çûbû, vê yekê jî nehiştibû ku ez wê bi vegotina wê binasim. Min parî û piçikên jiyana wê ya ku dixwest nas bikim bi vekolîna 3 salan ancax û ew jî bi kêm û kurtasî anî ba hev. Ji bo ku hunermenda hevçerxa Eyşe Şanê, Gulbiharê nas bikim şensekî min hebû, ji ber ku Gulbihar hê sax bû û li bajarê Duhokê dijiya. Gava li bajarê Duhokê bi ci war bûm û min bi profesyonelî dest bi karê vekolîna li ser hunermendên kurd kir, yekem car min li dergehê Gulbiharê xist.

Di 16/03/2008'an de min cîvanek pê re danî û çûme mala wê. Ji bo malê nas bikim min telefon kir, derketibû ber dergeh, berî ji texsiyê bêm xwarê şofêr çav pê ket û got: "Feqîrê, Gulbihar jixwe ketiye." Li ber dergeh, jineke bi temen, xatûnekê pêşwaziya min kir. Tevî pîriya xwe jineke gelek bi karakter û xwe ragirtî bû. Em derbasî hundir bûn, xêrhatina min kir. Min li ser nesaxlemiya wê çend tişt bihîstibûn berî ku herim. Lê min bi wê dilgermiyê hest pê kir ku weke du jinên kurd û du nifşên ku di qonaxên cihê de ne em ê sohbetê xweş bi hev re bikin. Lê ew her bi tirs û saw bû ji pirsên ku min jê dipirsiyan, ma wê çawa ne bi saw û tirs bûya, paşê çawa tiştên ku ez li ser jiyana wê fêr dibûm dihişt ku yek li sedemê vê saw û bêdengiya wê têbigihê, de kerem bikin û



Ji arşîva Zeynep YAŞ

em bi hev re Gulbiharê binasin:

GULBIHAR (Fatima Mihemed): Navê wê yê rastîn, Fatima Mihemed Ehmed Eli ye. Bavê wê ji eşîra Zêbarî û binemaleke mezin a Amêdiyê ku bi eslê xwe ji gundê Qolçnasa ku

vêga maye nav sînorê bajarê Colemêrgê ne. Navê diya wê Helîma Hecî ye, bi eslê xwe ji bakûrê Kurdistanê ye. Di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de hevjinê wê dimire, kur û keçeke wê jê hene û paşê bi bavê Gulbiharê re dizewice. Ji bavê Gulbiharê du keç û lawekî wê çêdibin; Fewziye, Gulbihar (Fatima) û Ehmed.

Di wextê xwe de li Amêdiyê, xisûmetek di navbeyna malbata bavê Gulbiharê û malbatên din de derdikeve, bi hev dikevin û mecbûr dimînin mişextî bakûrê Kurdistanê dibin. Gulbihar, li bakûrê Kurdistanê, di sala 1929'an de li gundê Mar Şemona Colemêrgê, li mala Melikê Aşûriyan tê dinyayê. Piştî ji wir vedigerin, çend salan mala bavê Gulbiharê li Amêdiyê bi cî dibin, lê paşê diçin Şêx Mema, Sersingê û paşê li Badereşkê akincî dibin. Bavê wê ji ber nexweşiyekê li Badereşkê diçe ser dilovaniya xwe û wî li wir alîgor dîkin. Wextê bavê Gulbiharê diçe ser dilovaniya xwe temenê Gulbiharê 7, 8 sal e. Piştî mirina bavê wê kes li wan xwedî dernakeve û paşê mala xwe ji Badereşkê dibin Mûsilê, demekê li Mûsilê dimînin. Gulbihar li Mûsilê dest bi dibistanê dike lê paşê di sala mala xwe ji Mûsilê dibin Bexdayê. Gulbihar, li Bexdayê jî xwendina xwe berdewam dike heta pola pêncan dixwîne û jê pêve naxwîne û dibe keça malê. Wextê li Bexdayê ne Şerê Cîhanê yê Duyemîn dest pê kiriye,

xela û tunebûn e, ji ber wê hindê di 14, 15 saliya xwe de Gulbihar bi yekî ereb re dizewice û 3, 4 salan bi hev re dimînin, paşê jî mêrê wê besebeb rojekê şimaqekê lê dide û Gulbihar ji ber vê şimaqê xwe jê dide berdan û li mala bavê xwe vedigere. Ji vê zewaca wê zarokên wê tune ne. Piştî çend salan di sala bi yekî din re dizewice ku ew jî ereb e. Derçûya kolêja Amerikî ye. Keçeke wan çêdibe û navê wê datînin Bêrîvan. Lê malbata mêrê wê tu carî bi vê zewaca wan razî nabe û ji ber sedema ku xwişka wê (Fewziye Mihemed)¹ stranbêjiyê dike dixwazin ku ji kurê wan dev ji Gulbiharê berde, jixwe paşê jî dê û bavê zîlamê wê ji kurê xwe re jineka din tinin, ew û Gulbiharê ji hev vediqetin û keçika wê li ba dayika xwe dimîne.

Destpêkirina jiyana wê ya hunerî

Gulbihar piştî ku ji mêrê xwe vediqete temenê wê nêzikî bîst salan e. Keçeke wê heye, ji hevjinê xwe hatiye veqetandin, piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn e, tunebûn e, ne malbatek mezin û têrkas in ku bikaribin li hev bisebibin. Wekî ku ew bi xwe jî dibêje: "Wextê ji mêrê xwe veqetiyam kes tune bû alîkariya min bike, dayika min bû ew jî xêşim bû. Xwişka min bû ew jî bi mal û mêr bû, her kesî ancax dikaribû li xwe xwedî derkeve." û mecbûr e ku bixebite. Ev eger tev wê didin zorê ku dest bi şixulekî bike. Di sala 1949'an de li Dîayê (Binkêyê Hunerî) Bexda, kursek dest pê dike bi hevkarî û handana xwişka xwe Fewziye Mihemed serî li kursa Îzgeya Erebi (Binkêyê Hunerî) dide û ji bo beşa şanoyê tê hîlbijartin. Piştî demekê jî di nav Dîa erebî di beşa şanogeriya de cih digire.

Şanogerî, bîzarvekirin û sînema

Li Dîaya Bexdayê wekî şanoger tê hîlbijartin. Li Dîayê bi navê Fayîze Mihemed tê naskirin. Di salên 1949 û 1950'î de li îzgeya erebî bi tîpa Muşehat'el Ensîlûsî re dest bi karê şanogeriya dike û di sala 1951 û 52'an de jî bi lîstika "El Îstîbadîl El

Kebîr” a hunermend Yûsif Wehbî cara yekê weke listikvanekê derdikeve ser depê şanoyê û dest bi şanogeriye dike. Her weha ligel şanogeriya Mesakîn (feqîr) a Seyîd Selim Betî û ligel tîpa Seyda Yehya Faiq beşdarî li radyoya Bexdayê jî dike di bin çavdêriya hunermendê bi nav û deng Elî Derwêş de û beşdarî gelek zarvekirin û şanoyan dibe ligel Ebdila Azawî.

Li nav Dîa Bexdayê yekem jina kurd bû û heta li seranserî Îraqê jî çend jinan yek bû ku karê şanogeriye dikir, ji ber vî qasî di wexteke zû de hate naskirin. Bi destkêrî û hunera xwe, di nav cihana şanogeriya Îraq û ereban de ciyê xwe girt û bi gelek listikan derket ser depê şanoyê.

Gulbihar, bi hevkarî û teşwîqkirina xwişka xwe Fewziye Mihemed dest bi Dîayê dike

û her weha stranbêjiyê jî. Wextê ku di sala 1949'an de diçe Îzgeha Bexdayê, Şêx Elî Derwêş ku ji Sûriyê hatibû, mamosteyê peymangehê (Peymangeha Hunerên Ciwan) ye.

Tîpa 14'ê Tîrmehê dadimezrîne û Gulbihar di bin banê vî tîpê de, di koroya wê de ciyê xwe digire û stranan dibêje.

Di zimanê erebî de gelek zîrek û pêşketî ye û xebatên xwe hemû bi zimanê erebî dikirin. Lê ligel vî yekê jî girêdana wê ya bi zimanê kurdî û netewekariya xwe her bi şanazî diparêze û dixwaze ku rojek ji rojan xizmeta milletê xwe bike. Piştî ku di sala 1956'an de li Îraqê, li Bexdayê televîzyona Îraqê dest bi weşanê dike ew jî ciyê xwe di

nav de digire û beşdarî gelek bernameyan dibe û her wisa jî jiyana wê ya hunerî di warê sinemayê de dest pê dike. Bi mezin-tirîn hunermendên îraqî yên wekî; Yehya Fayîq, Fewzî Mehsîn El Emîn, Weciye Ebdilxenî, Esed Ebdilrizaq, Ziya El Beyatî û hwd... re xebatên hunerî bi rê ve dibe di warê şano û sinemayê de. Di sala 1956'an de beşdarî du filiman dibe, yên bi nav: *Werde (Gula Sor)* û *Erûs El Ferat (Bûka Fîratê)* dibe û her weha dişa beşdarî filimekî bi navê: *Lileib (Ji Bo Gel)* dibe lê ev filim destûra weşanê wernagire û nayê weşandin.

Ji ber ku kadroya Dîaya Bexdayê ye, her çendî li Îzgeha Kurdî dest bi stranbêjiyê dike jî lê ligel stranbêjiyê di hemem demê de ligel Tîpa şanoya 14'ê Tîrmehê² wextekî dirêj dişixule û berhemên wekî;

Nû Bexiv Ne-se'er, hindek zarvekirinên nû yên Tv'yan bi hunermendên wekî; Üceyhe Ebdilxenî, Es'ed Ebdilrizaq, Mihemed ElîHadî Seid, Ziya El Beyatî û hwd bi zimanê erebî pêşkêş dike û heta sala 1965'an jî ligel Tîpa 14'ê Tîrmehê beşdariya listikên; Yahûfe El Hurre, Menî

Ya'exûdeha El Fetah-l El -Xalib dike û her wisa jî heta sala 1968'an zarvekirinan ji bo televîzyona Bexda û Kerkûkê dike ku navê wan: Basit e, W'ebseid Mînha Man Makû ye.

Asoyê hunera wê û stranbêjî

Di sala 1961'an de li Îzgeha Kurdî bi pêşniyara Ehmed Xelîl ku wê hingê mi-



Ji arşîva Zeynep YAŞ

dûrê radyoyê bû dest bi karê stranbêjiya kurdî dike. Jixwe ji sala 1949'an û pê de di bin banê Tîpa 14'ê Tîrmehê de stranan dibêje lê zêdetir stranan di nav koroyê de pêşkêş dike. Xebata bi vê tîpê re zemînekê ji destpêkirina stranbêjiya wê ya bi kurdî re amade dike.

Cara yekê di 11'ê adara 1961'ê de bi strana, '*Kurê gundî bejindarê heyzeran*', a ku helbestkarê wê Mihemed Emîn Osman û awazsazê wê Ehmed Xelîl bû dest bi stranbêjiyê dike û Ehmed Xelîl bernavkê wê yê Gulbihar lê dike.

Gel ji dengê wê û ji vê şîrovekirina wê ya nû gelekî hez dike. Bi vê strana xwe dibe pêngavek di strana kurdî ya nûjen de. Ji ber ku di nav stranbêjên jin ên heta wê demê stranbêjî kiribûn, yên wekî Dayika Cemalî, Meyremxam, Nesrîn Şêrwan, Gulîzar, Fewziye Mihemed, Eyşe Şan û hwd... her çiqasî stranên nûjen strabin jî, lê her ew bi stranên xwe yên gelêrî dihatin nas-kirin. Lê Gulbiharê stranên xwe ji helbestên nûjen hildibijartin, beste û awazên wan ji nû ve datanîn û ligel firqeya muzîkê ya radyoyê bi muzîkjenî giyan dida stranên xwe û wisa pêşkêş dikirin. Ev yek destpêkek bû di qonaxa strana kurdî û stranbêjiya jina kurd de.

Gulbihar di koroya radyoyê de ligel firqeya muzîkjenan ji gelek hunermendan re vokalistiyê jî dike û dibêje: "Fewziye, xwîşka min a mezin, berê min da radyoyê. Wê beriya min çend stran tomar kiribûn, lê paşê şû kir û çû êdî nezivirî radyoyê. Ez bi tenê mam ligel Nesrîn Şêrwanê û heta sala 1978'an me ligel yekûdu kar kir û vokalistî jî hunermendên radyoyê re kir."

Û her weha wê çaxê mecbûrî ye ku her hunermendek li îzgehê kadro ye, mehê stranekê pêşkêş bike. Stranên ku Gulbiharê hildibijartin bi hevkarîya gelek hunermendên îzgehê, heval, hogir û dostên wê ve awaz ji wan stranan re dihat danîn û besteya wan dihat çêkirin. Ew stranên ku dihatin çêkirin jî heta sala 1973'yan li radyoyê bi awayek mubaşir dihatin strîn.

Gulbihar ji sala 1961'ê heta sala 1987'an ku xaneşîn dibe bi tevayî 272 stranan çêdike û distrê. Qet dengê wê li ser sêlik û şerîtan nehatiye tomarkirin. Stranên xwe hemî ji bo Îzgeha Kurdî çêkirine û pêşkêşkirine. Jixwe ew li ser vê yekê bixwe weha dibêje: "Ez keça kurda me, min stranên xwe ji bo gelê xwe distra. Min jî şohretê hez nedikir, dervediketim ser sehneyên şahî û ahengan û heta ji ber wê hindê jî stranên xwe ji ezber nizamim. Yanî min şixulê xwe yê ku diket ser milê xwe dikir."

Ew heta xaneşîn dibe li îzgehê kadro ye û karmend e û bi pereyên wê çaxê 6 dînar meaş werdigre ku hê jî miaşê xaneşîniya wê 150 hezar dînar yanî 120 dolar e.

Stranên Gulbiharê ji aliyê; Mihemed Emîn Osman, Evdilhafîz Enwer Mayî, Mehsûm Mayî, Feysil Mistefa, Salih Elî Gulî, Mehîfûz Mayî, Sebrî Botanî, Fexredîn Doskî, Bizad û Mihemed Hesên, Bedirxan Sindî, Sekvan Evdilhekîm, Îbrahîm Xelîl û hwd... ve hatibûn danîn. Awazsaziya stranên wê jî bi giştî ji aliyê Ehmed Xelîl, Nazim Neîm, Yasîn Şêxlî, Semîr Zaxoyî û Mihemed Qedrî, Cemal Celal, Şêrwan Mihemed Seîd, Nûredîn Îbrahîm, Beşar Mihemed, Tehsîn Taha û hwd... ve dihat çêkirin.

Gulbiharê stranên duqolî ligel; Fexrî Bamernî, Tehsîn Taha, Beşar Mihemed Zaxoyî, Mihemed Gîp Gahar, Îsa Berwarî, Semîr Mihemed Zaxoyî, Evdila Zêrin, Şakir Mihemed Emîn, Fuat Mihemed gotiye.

Bi Fexrî Bamernî re strana; 'Masîfiroş', bi Îsa Berwarî re; 'Zembîlfiroş', bi Semîr Mihemed Zaxoyî re; 'Ez keç im Keça Kurdan im', bi Tehsîn Taha re; 'Xalxalokê' û çend stran jî bi soranî pê re gotine. Û her weha li îzgehê ligel firqeya muzîkê di koroya radyoyê de her ciyê xwe girtiye. Wekî din jî bi Eyşe Şanê re stran avêtine ber hev, ne stranên duqolî gotine lê her yekê jî wan bi hev re strana xwe avêtiye ber û ya di strana xwe lê temam kiriye.

Di sala 1973'yan de ligel M. Arîfê Ciz-

rawî û Îsa Berwarî ji bo çend konsertan diçe Libnanê. Li Beyrûdê çend konsertan didin û paşê jî beşdarî festîvala Ba'edre dibe ku ev festîvala çand û hunerî gelek bi nav û deng e û di asteke navneteweyî de li Libnanê tê sazîrîn, gelek hunermendên bi nav û deng ên cîhanî ancax dikarin beşdarî vê festîvalê bibin. Û her weha wextê li Libnanê ne hevnasiya wê û Seîd Yûsiv çêdibe, li mala wî dimînin û bi hev re çend konsertan saz dikin.

Di sala 1976'an de ji bo çend konsertan diçe Ewrûpayê, li Frensa û Nemsayê konsertan dide û stranên xwe pêşkêş dike. Piştî vê seferê cara duyemîn di sala 1978'an de diçe Frensa, Brîtanya û Nemsayê. Di vê geryana wê de, Jak Şîrak ku wê çaxê Serokê Şarevaniya Parîsê bû, wê bi kilîla bajarê Parîsê xelat dike û siyane teke mezin didê. Piştî vê geryana wê ya Ewrûpayê di sala 1981'ê de ji bo çend konsertan diçe Amerikayê.

Piştî ku Gulbiharê ji Ewrûpayê vedigere ji bo diyardeyekê li ser televizyona Bexdayê ji bo ku li ser geryana xwe, xelat û diyariyên anîbûn biaxeve, xelatê xwe bi xwe re dibe televizyonê û beşdarî bernameyê dibe, lê piştî ku bername xelas dibe, hindek ji xelatên wê wînda dibin û nayên dîtin. Bi vê yekê gelekî diqehire û xemgîn dibe. Û jixwe di sala 1987'an de ji îzgehê xaneşîn dibe û li mala xwe rûdinê.

Wextê ji radyoyê xaneşîn dibe ew bixwe dibêje ku qene straneke wê ya tomarkirî ji arşîva radyoyê pê re tune bûye û her weha ji ber ku dengê xwe li ser sêlik û şîritan ji tomar nekîrbû di destê wê de ji berhemên wê tişteke tune bû. Lê paşê ew ji xwe re stranên xwe ji tomargehan (ku tomargehan ji dengê wê bi giştî ji ber radyoyê tomar kirine û xistine ser kasetan) dikire û



Ji arşîva Zeynep YAŞ

wisa li stranên xwe guhdar dike. Pêwîst e bê gotin ku ji wan 272 stranên wê yên ku niha halêhazir li to m a r g e h a n peyda dibin û lê t ê n guhdarîkirin 85, 90 stran in û y ê n d i n n e d i y a r i n .

Naverok û hêmayên jiyan û stranên wê:

Naverok û hêmayên stranên Gulbiharê bi giştî, li ser sirûştê Kurdistanê ne. Her wisa li ser; şivan û bêrivan, çiya û newal, dar û ber, gul û kulîlkan, av û çol, belal û rûbar û evîndariya gundiyan a paqij û bejî ne. Ew bi xwe dibêje: “Em hunermend berî her tiştî kurdên jidil bûn, netewekar bûn û wê hingê mirovên rewşenbîr û pêşengên civata xwe bûn û stranên me hildibijartin jî bi taybetî, her çi qas bi awayekî veşartî be jî me ji bo pêşxistina civata kurd digot û stranên me û bi gotinên wan me palpiştiya şoreşa kurd dikir. Stranên wekî; ‘Kewa Spêde Bixweyne Ha Bixweyne’, ‘Ez Keç im Keça Gunda me’ û hwd... Raya desthilatê wê hingê her çendî zext û dijwari bû jî lê me bi şêweyekê peyama xwe digihand guhdarvanên kurd û tê de behsa Kurdistanê dikir. Me di warê hunerî de xebata şoreşgerî dikir û em xwedî helwest bûn ligel neteweya xwe û heta gava me stran digotin em her bi cilikên xwe yên kurdî derdiketin ser sehneyê.”

Di salên 50 û 60'î de ji bo jineke kurd zehmetiya hîlbijartina hunerê:

Heta ji îzgehê xaneşîn dibe jî derûdor û cîranên wê, wê wekî mamosteyekê nas dikin û ji bo parastina xwe nikare bêje ku ez stranbêj û hunermend im. Divê bê gotin ku di wan salan de, di salên 1950'yî û pê de, hîlbijartina karê hunerî wêrekî û bed-

lek mezin diviya, nexasim ji bo jinê û heger ev jin jî kurd be, ku wê hingê zilaman bi zehmetî dikaribûn hunera şanogerî, sînemayê û stranbêjiyê bikirina. Di warê şanogerî û sînemayê de û her wisa di warê stranbêjiyê de jî, Gulbiharê bi destpêkirina Diaya Bexdayê, berdewam li Îzgeha Kurdî ku karê hunermendiyê di warê şanogerî, aktrîstiya sînemayê, zarvekirina radyo û Tv'yê û her weha stranbêjiyê dike ku wê hingê ne di nav kurdan de, bi giştî di Rojhilata Naverast tev de ev yek hîlbijartineke gelekî zehmet bû ji bo jinekê. Lê Gulbiharê wekî hunermendeke jin, xweragirtina him di nav kar û xebatên derûdorên ereban de ku wê çaxê jî her bi nasnameya xwe ya kurdî tê de ciyê xwe digirt û him jî li Îzgeha Kurdî misyona xwe ya jinbûn, netewî û mirovî xwe bi hunera xwe, helwesta xwe dide çespondin. Û bi taybetî li devera Behdînanê bi serbilindî her ciyê xwe girtiye û gel ji hunera wê hez kiriye. Ev rola ku wê di nav kurdan de leyistiye û bi taybetî li herêma Behdînanê, wekî jineke kurd û pîraliyên xwe yên hunerî heta roja îro jî ku gelek keç û jinên kurdan nikarin pê rabin. Ji ber wî qasî, ev yek dibe ciyê rêzlanînê û her wisa di 17 û 18'ê adara sala 2005'an de li başûrê Kurdistanê, li bajarê Duhokê, Wezareta Rewşenbîriyê ya Kurdistana Federe festîvaleke rêzlanînê ji bo hunermenda kurd Gulbiharê saz dike. Di nav vê çarçoveya qedirgirtinê de li bajarê Duhokê malek jê re hate dabînkirin û mûçeyek jê re hate danîn.

Xaneşînbûn, bêdengî û tenêti

Piştî ku di sala 1987'an de ji îzgehê xaneşîn dibe êdî li mala xwe rûdinê. Heta wê hingê jî keça wê bi yekî filistînî re şû dike û diçe li Urînê bi cî dibe, jê û pê de carê hin zaroyên xizmên wê tîn li balê dimînin lê ew her bi tena serê xwe ye heta rûxandina desthilatdariya Be'as jî ew li Bexdayê, di malekê de bi tena serê xwe dijî û îdareya xwe bi miasê xwe yê xaneşîniyê dike. Lê piştî ku rejîm rûxiya dirûvên Bexdayê zehmetir bûn û wê hingê hin rewşenbîrên

kurd hewlek dan û di sala 2005'an de bi boneya festîvala rêzlêgirtinê, ku hêjayî gotinê ye ev festîvala rêzlêgirtinê ku ji Gulbiharê re hate sazkirin nimûne bû di tarîxa Kurdistanê de ji bo xwedîlêderketina hunermendeke kurd, hat û li bajarê Duhokê bi cî kirin. Lê ev hewldan hemû nebûn çareserîya tenêbûna wê.

Di temenê pîrî de, li bajarê Duhokê, di xaniyê ku Wezareta Rewşenbîriya Kurdistana Federe dabînkirî de dijiya. Di sala 2007'an de ji ber egerek niştegerî çaveke wê bi xeletî tê emeliyatkirin û rehên çavekî wê bi xeletî dibirin û çavê wê lê tarî dibe. Di vê rewşa wê de dîsa dezgeyên Wezareta Rewşenbîrî yên li Duhok û Viyan Mayî³ lê xwedî derdikevin, alîkariya wê dikin, lê tevî hewildanan jî di tirmeha sala 2008'an de bayê falinc(celte)ê lê dixê û şelelî dibe û her wisa nexweşiya jibîrkirinê lê peyda dibe ku zû bi zû xwe ji bîr ve dike. Ev yek wê yekcarî bêçare dike heta ku birayê wê pê dihesê ku şelelî bû û rojekê ji Bexdayê tê serdana wê. Bi hatina birayê wê re her weha bi alîkariya Enstîtûya Kelepûra Kurdî xêrxwazek, jineke kurd pereyekî jê re terxan dike û bi vî hawayî niha ligel ku birayê wê li balê ye jî xedemeyek jê re hatiye dabînkirin û tete xwedîkirin û niha di 80 saliya xwe de ye.

Çi jî bo kesên wekî Gulbiharê re bête kirin kêma bêguman, ji ber ku wê û gelek hunermendên di yên ku xwe goriya muzîk û hunera mîletê kurd kirin bûn pêngavên pêşketin û ragirtina mîletekî û hiştin ku bi rewîştî xwe ya pak bûne pêşengê civata kurd. Nexasim, hunermendên jin ên weke; Meyremxan, Eyşe Şan, Gulbihar, Nesrîn Şêrwan, Fewziye Muhamed, Leyla Bedirxan û hwd. di sedsala bîstan de bi hunera xwe sînor dabezandin û bûne serfiraziya jinê û mîletê xwe.

Bi wê serdana mala wê re min di sala 2008'an de min weke projeya Eyşe Şanê, li ser berhem û jiyana wê projeyek amade kir û pêşkêjî Enstîtûya Kelepûra Kurdî kir. Ev proje hate pejirandin. Di nav çarçoveya vê projeyê de me bi sedan stran arşîv kirin

û yên bi kêrî çapê dihatin
me dengê wan bi teknîkeke
baş paqij kirin, jê 6 CD
kom bûn û me ev 6 CD
wekî koleksiyona ji stranên
Gulbiharê, di albûmekê de
çap kir û heta niha jî xe-
bata li ser pirtûk û arşîva
wê berdewam e.

Rojên xwe bi lêguhda-
kirina stranên xwe derbas
dike û herî zêde jî ji vê
strana xwe ya bi navê;
“Yadê Rebenê” hez dike û
gava lê guhdar dike, di ber
re jî di ber xwe de pê re di-
bêje:

*“Yadê rebenê min çi gotî
tu xeyîdî*

*Giyayê mêrga li min û
delalê dilê min seridî*

*Her çend kesê fesadiyê
navbeyna min û delalê dilê
min de bike*

De heke mêr bî nezewicî

De heke jin bî newelidî

*De heke kiç bî bi ci-
wanya xwe şah nebî*

Ay dil ay dil ay dil”

Navên stranên wê yên
ku tên zanîn û di nav al-
bûmê de tune ne

Stêra Geş

Negrî Negrî

Bo Te Ez Hêlam

Bike Kenî

Bilbilo
Heyva Gulanê
Helatîn
Min Tu Divê
Hêvî
Spêde
Zozan
Pêve Naçim
Dêw û Gûrî
Kesk û Sor
Kovan
Bilîl
Dayîkê
Te Ji Bîr Nakim
Ev Ro
Bes e
Werin Werin
Dilê Bêbirîn
Xunav
Nesrîn
Dilgeş
Gulbihar
Kurê Gundî Bejindarê
Heyzeran
Lawo
Çiwîşk
Çûme Destî
Payîz
Mijdevan
Min Nevêt
Xemrevîn
Name
Canê
Nêrgiza
Derew e
Payîz e
Hêviya Lawî
Newroz
Serfirazî
Jîna Min
Ey Biharê
Hey Nermê

Şeva Tarî
Heyva Çardeşevî
Gazind
Hîro
Nêrgiz
Cejna Newroz
Hêdî Hêdî
Ez Gul im
Derdê Evîne
Rûbarê Dila
Mayîne Tenê
Dilkewîn
Nêçirvan
Hêviya Berze Bû
Dilê Gunehbar
Peltîng
Keyf Sema ye
Sûlav
Bihara Gundî
Bawerî
Qefta Gula
Tarî Bû Dil
Dilberê
Ez Ew Hizr im
Narîn
Jiyan
Bo Çî
Tu Car
Xelatê Cêjnî
Kurê Min
Nizanim
Gulnîsrîn
Xalxalok
Evîni Dav e
Ez im
Ji Derdê Biharê
Bîrhatiyek
Destê Xwe Bîne
Nazdar
Dengê Dila
Jariya Zînê
Xalxalokê

Têbînî:

¹ Fewziye Mihemed: Ew jî di serdema Radyoya Bexdayê Îzgeya Kurdî de stranbêjeke kurd a bi nav û deng û dengxweş bû ku wî wextî, piştî Meyremxan, Elmasxan şecereya stranbêjiya jinên kurd li îzgeyê berdewam kiriye û gelek stranên folklorîk ên kurdî gotine.

² Tîpa 14'ê Tîrmehê: Ev tîpek bijarte ye ji hunermendên wê çaxê ku wekî rêxistina Hunermendên Serbixwe hatiye damezrandin.

³ Vîyan Mayî: Jineke kurd a rewşenbîr e û derhênera fîlmên sînemayî ye.

Dengbêjî

Mehmet ONCU

Dîroka dengbêjiyê ji sumeriyên dest pê dike, bi gutî, qasî, mîtanî û medan didome, heta ku tê roja me di nav kurdan de dibe saziyeke bi hîm û qedîm

Di lingê wan de çarix, destê wan de çokal,

Digotin, em ê bêhna demên wendayî bi-gihênin rojê

Ber bi welatên nedî nebîna diçûn,

Bi kevneşopiyê qedîm şopa dengan dajotin...

Çand an jî keleşor, nîrx û rûmetên ku di pêvajoya dîrokê de bi ked û cerebeya hezaran salan bi kelijandinê pêk hatî ne. Ew nîrx û rûmetên ku di parzûnê dîrokê re derbasbûyî, di her dema dîrokê de xizmeta yekîti û wekhevbûna gel kirine.

Çand û keleşor dikare bi du beşan bê nîrxandin. Ji van yek a devkî, ya din a nivîskî ye. Dîroknas didin zanîn ku; “beriya nivîsê gotin û bêje hebûn.” Piştî ku nivîs derket holê, tê gotin ku nivîsê şûna gotinê girt. Belam di nav kurdan de wîsa nebû, nivîs di nav şaristaniya kurdan de cihêkî birûmet digire, lê gotin bi coşê xwe ya berê her dem şûna xwe di çand û keleşora kurdan de diparêze, lewra di nav qewmên kurdan de saziyeke bi navê dengbêjiyê hebû û heta roja îro jî ew sazî heyîna xwe diparêze.

Pêyva “**dengbêj**” ji deng û bêjtinê pêk tê û peyveke kurdî ye. Mehna bêjevaniyê dihewirîne yanê dengbêj kesê ku bûyerên dîrokî, çandî bi şewaza dengî radigihîne civakê ye.

Dengbêj; kesên ku nîrx û rûmetên gel bi efsûna pêyvê dixemilînin û ji nîfşan radigihînin nîfşên din in...

Dîroka dengbêjiyê ji sumeriyên dest pê dike, bi gutî, qasî, mîtanî û medan di-

dome, heta ku tê roja me di nav kurdan de dibe saziyeke bi hîm û qedîm. Li gorî pêvajoyê îro saziya dengbêjiyê lawaz maye û hindekî ji ser rahên xwe qulibiye, belam dîsa jî heye û hindik be jî heyîna xwe bi hêza pêyvê diparêze.

Dengbêj bûyeran di dema pêk hatî de radigire, bi trajedî, xem, şahî û hezkirinên wan dihûne, bi rîtm û melodiyan dixemilîne, bi sêhra muzîke dikemilîne û vedibêje girseya netewê.

Berhemên ku ji aliyê dengbêjan ve tên afirandin, bi tevahî ji bûyerên qewimî û rasteqîn pêk tên. Ew berhem mohra xweza û giyana civakî radigirin û xwedî hêza vegotîneke bedewkar û estetîk in.

Tê gotin ku; ji ber ku kurdan nekarîbiye çanda xwe ya nivîskî biparêzin, çanda devkî pejirandine.” Ev gotin rast e. Lê belê, ne ku nekaribûne çanda xwe ya nivîskî biparêzin, ji ber ku kurdan çêja çand û wêjeya devkî seh kiribûn, tu caran nedikaribûn ku dev ji reng, aheng û rîtmê wê berdin. Îro di roja me de, kîjan kurdê/a xwedî hiş û hest dikare dev ji guhdarkirina Mem û Zîn, Siyabend û Xecê, Dewrêşê Evdî, Ferza Çolê, Filîtê Quto û hê bi sedan destanên weke vana berde û xwe ji van arazûyên bihûştî bê par bihêle.

Mirov dikare bêje ku cara yekem nivîs li welat û xaka kurdan hatiye bikaranîn û mucîdên nivîsê jî dîsa kurd in an jî gelên li derdora kurdan in. Kurdan di gelek qadên dîrokê de şaristaniyên nivîskî û mayînde li pey xwe hiştine û îro jî ew berhem û mayîndeyên dîrokî li cihê xwe, li ser piyan in. Ji van şaristaniyan yek jê

Komagene ye, Kommagene ji şaristaniyên kurdên zîlanî yek e.¹ Îro dumdarê komageniyan eşîra bi navê Kawa ye, ew eşîr teva mezinahî û qedîmîyeta xwe îro jî li wê heremê ye, hê jî bi kurdiyeke zelal û herikbar diaxivin.² Mirên Komageniyan ew qes rûmeteke mezin li dengbêj û sazbandên xwe kirine ku cara yekem di dîrokê de derbarê dengbêjan de zagonên parastinê derxistine û zagon jî li ser kitabeyên xwe yên berîni dane nexşandin.³

Di ferhenga civaknasiyê de gotineke gerdûnî heye, tê gotin ku; “peyv difire, nivîs dimîne.” Belam kurdan di pratîka xwe ya dîrokî de bingeha vê gotinê vale derxistine. Ji ber ku ji aliyê neyarên kurdan ve her dem welatê wan hatiye dagirtin, berhemên ku mohra kurdan radigirin hatine talankirin û wendakirin. Îro li ser xaka ku bapîrê kurdan lê jiyane berhemên ku li ser navê kurdan bîna xwendin tune ne, ku hebin jî gelek kêma in. Ma mirovahiya pîr û qedîm nizane ku bapîrên kurdan bi sedan şar û şaristanî ava kirine? Ma qey nizanin ku Bardaysanê Hewlêrî di sedsala duyemîn de li Ruhayê bingeha muzîka dêra yaqûbiyan daniye.⁴ Mînaekeke din Zîryab e ku ji wî re “Bavê Flamenko” tê gotin⁵. Zîryab, kurdekî ji derdora Mûsilê bû, di dawiya sedsala heştêyî de hat dinê, di sedala nehemîn de bû Serstranbêjê Qesra Bexdayê. Weke ku her dem li kurdan fen û fit tînin kirin, bi van fen û fitên nas ew jî ji Seraya Bexdayê tê dîrxistin. Dema ku ew neheqî li wî tînin kirin ew jî bi zehmeteke pîr mezin malbata xwe radike û koçî Spanyayê dike. Li Spanyayê muzîka Flamenko îcat û îcra dike.⁶ Ew her du mînakên li ser muzîkê, bi tenê têra kevnariya kelepura kurdan a nivîskî dikin.

Belam, çima ku kurd her dem bi zordestiyê re rû bi rû mane di vir de hêza kelepura dengî û rola dengbêjan derdikeve pêş. Dengbêj, ne bi tenê li ser bûyerên dîrokî radiwestin, di heman demê de bûyerên heremekê radigihandin heremeke din jî, çima ku dengbêj gerokên dema xwe


bûn. Demekê li derdora Cebel-el Ekrad⁷ digeriyan, demeke din li herêma Serhedê li rex serokeşîr û miran bûn, li diwana wan cihekî bi rûmet digirtin.

Kesên dengbêj bi qaîde û meqamên muzîkê dizanîn, gihîştibûn ilmê pêyvsa-ziyê, lewre pêyvên xwe weke libên tizbiyê berdidan ser hev û kesên li doraliyên xwe ji xwe re heyran dihiştin. Bi huner û zarxweşiya xwe her dem her kes li benda hatina wan bû, çima ku guhdarkirina wan bextewariyeke mezin û rûmeteke giranbûha bû.

Tûrikê dengbêjan gencîneyeke bê hempa bû, dema ku diçûn heremekê, ku çi stran û lawijên wê heremê hebûna tevahiya vegotin û melodiyên wan dadigirtin tûrikê xwe li derên din ji mirovên nû re ew bi hûnereke nû vedigotin.⁸

Di navbera dengbêjan de kesên ku xwendin û nivisandina wan heyî kêma bûn. Bi gelemperî bîra xwe bikar dianîn û klam, stran û berhemên xwe bi rêbaza jiberkirinê radigihandin. Dengbêjan ew qas berhem afirandine ku piraniya wan berhemên folklorîk her dem bala seyahên rojavayî kêşandiye. Çima ku bi piranî dengbêj ne xwedî xwendin û nivisandin bûn, afirandina wan berheman li ser jixweberiyê bû.

Dema ku mirov stranekê ji dengbêjekî dixwaze pêş de melodiya wê bi bîr tîne, tere-niya wê stranê dibêje, pişt re dest bi gotina kilamê dike. Çima



ku di dengbêjiyê de berhem tevahiya melodya wê tê jiberkirin.

Bi gelemperî wateya van berheman karên dinyayî ne. Evîn, xweza, qencî, hê di gelek qadên weke vana de gotin li ser gotinê dirêj dibe û diçe. Bûyer carinan doza di nav mîran de ye, carinan di nav du hezjêkiriyên belengaz de ye, carinan jî doza di nav du gel an eşîran de ye.

Carinan dengbêjiya kurdan li gor herêman hin ciyawaziyên biçûk jî dinimîne. Tê zanîn ku li gelek herêman dengbêj stran û kilamên xwe bê enstrûman distrên, belam li herêma rojavayê Ferêt di stranên dengbêjan de enstrûman heye û enstrûmana sereke tembûra kurdan a sêtêl e. Tembûra sêtêl sazêkî kurdan ê pîroz e. Ji ber ku berê kurdên herêmê bi piranî elawî û êzîdî bûn, weke ku tê zanîn di van her du zavên ola Yêzdanî de⁹ ayîn û rîtuêlên olî bi gulbang û stranên enstrûmanî pêk tên. Di zava ezdatiyê de rîtuêlên olî muzîka ku bi hevalbendiya bilûr û hêldefkê¹ çêdibe. Di zava elawîtiyê de jî ayîn, bi gulbangên ku bi hevalbendiya tembûra sêtêl tên gotin pêk tê. Di nav van dengbêjên hemdem ku hêza xwe

ji kevneşopiya xwe ya qedîm distînin de mînaka herî balkêş Ayzerê Şirfinî ye. Ayzerê Şirfinî (Şirfin navê gundê wî ye) fenomenekî bi serê xwe ye. Bi tembûra xwe ya sêtêl, dikare sê roj û sê şevan bê xwarin û vexwarin stran û kilaman bibêje, ne yek bêjeyê şaş dike, ne jî notayeke şaş ji têlên tembûra wî derdikeve. Hê gelek dengbêjên weke wî ku ji kevneşopiya dengbêjên di serdema Komeganiyan de mayî dajo hene. Mirov dikare ji heman heremê dengbêjên weke Hem Sorê, Seydiyê Kor, Êma Hecxelîlî û yên wekî wan jî nîşan bide. Gelek destan û kilamên ku van kesan bi dengê xwe navdar kirî hene. Ku mirov ji van destanan çendekan bide nasîn “Kerî Kawî, Eyşana Îwê, Mihemedê Enawî, Derwêşê Evdî, Hemê Mûsekê, Tar û Zar, Delalê Baronekê, Delalê Keçikan” û hê gelek kilamên wekî vana.

Wek pêyva dawîn mirov dikare pirsgerêka dengbêj û dengbêjiya kurdan wiha vebêje; Li bakurê welêt saziya dengbêjiyê piştî 1960’î ketiye asteke nû, yanê ketiye qada mirinê. Ji ber vê yekê êdî ne dengbêjên nû digihîjin, ne jî civata ku dengbêj stranên xwe lê pêşkeş bikin maye.

Têbinî:

¹ Mêhrdat R. Îzady, *Bir El Kitabî Kurtler*

² Eşîra bi navê “Kawa” di çavkaniyên dirokî de bi navê “Koa, Kowa, Kowend û Kav” derbas dibe. “Ko”ya di navê wan de di kurdiya kevn de û îro jî di zaravayê dimilkî û goranî de tê mehna “çiya” kawa jî mehnaya kesên ku li çîyan niştecî ne, li çîyan rûdinên dihewirîne. Eşîra Kawa berdevama qewmê Koma ku dûgelek bi navê Komuh damezirandiye û ew dewlet beriya zayîna Îsa bi nêzikî di navbera sedsalên 1400 û 700’î de 700 sal jiyaye û paşê jî aliyê Asuriyan ve hatiye hilweşandin e.

³ Ew kitabe îro jî li ser çiyayê Nemrûd, perestgeha mîrên Komegeneyê ya havînî, bi zimanê girekî ye.

⁴ Bardaysan kurdekî Hewlêrî ye. Ji ber ku ola mesîhî pejrîrandiye, jî bo suryaniyan kesayetiyeke gelek bi rûmet e û suryanî wî jî xwe dihesibînin. Bi tevahî bingeha muzîka mesîhiyan a dêrê wî daniye û gelek berhemên ku wî beste kirî hene, hê jî li dêran ew berhem tên gotin.

⁵ Zîryab, enstrûmanjen û dengbêjekî ji derdora bajarê Mûsilê ye. Di dawîya sedsala 8’emîn û serê sedsala 9’emîn de jiyaye. Sers-tranbêjiya Qesra Xelîfeyê Bexdayê kiriye. Muzîka Flamenko, bi rîtma ku wî kifş kirî pêk hatiye û gelên ewrûpî wî nas dikin û dizanin.

⁶ Flamenkoya îroyîn a modern, bi rîtma çepik û linglêdana erdê û hevalbendiya dengê têlên gîtarê pêk tê. Dema ku rîtma linglêdan û çepikan dibe mijar, ez dixwazim bala we bikêşim ser govendên Herêma Botanê ku, gelek govendên wê herêmê bi tenê ji rîtma çepik, linglêdan û dengê staranbêj pêk tên. Zîryab jî cara yekem ew muzîk ji rîtma dest, linglêdan û ûda xwe ya ku têl û çêkirina wê taybet e pêk aniye û xistiye xizmeta gelê dinyayê.

⁷ Di çavkaniyên ereb û osmaniyan de navê Çiyayê Kurdan wisa derbas dibe.

⁸ Lewma her stranek gelek wersiyonên xwe hene û jî bilî kakilê stranê (çîrok heman çîroke) şêwe û teşeyê gotinê ji hev cuda ne.

⁹ Mêhrdat R. Îzady, *Bir El Kitabî Kurtler*

¹⁰ Hêldefk jî hêl û defê pêk tê pêyveke bi kurdî ye. Li herêma Semsûrê jî bo erebaneyê “hêldefk” tê gotin.

Betalî

Cîhan ROJ

Kêliyêk betalîyê; di wê kêliyê de ez niza-
nim ez bi dû çî ketibûm, wekî reşbelegekê
vê xebatê xwe da der. Ez dizanim alozî û
hewl hebûn, ez dizanim ez di wê kêliya be-
taliyê de li tiştêkî digeriyam. Kêlî kêliyeke
betalîyê bû. Piştî reşbelegekê ez hay jê
çêbûm bê ez li dû çî bûme û min ew bi
dest xist.

li xwe vegere, pîrsekê ji xwe bike,
bersivê bide
pîrseke din ji bo wê bersivê bike
bê bersiv bihêle heta pîrseke din xwe da der
bersivekê bide bêtî pîrs bikî, piştî bersivê
pîrsekê bike piştî pîrsê bersivekê bide
li dilê xwe vegere beriya li hişê xwe vegerî
li hişê xwe vegere beriya tu li dilê xwe vegerî
li dil û hişê xwe vegere
beriya tu li jiyanê vegerî
li jiyanê vegere bêtî pîrsan ji jiyanê bikî
pîrsan ji jiyanê bike bêtî pîrsan ji xwe bikî
jiyan dilê te ye, pîrsan ji jiyanê meke

Ji siya xwe xwar
Ji xwe xwar
Xwe xwar
Xwar

Xweş, gotin digotin
Xweşgotin digotin
Gotin digotin
Digotin, gotin
Sar bû
Mat bû
Di mala matê de bû
Bû mala matê
Bû mal
Mal bû
Mat bû
Sar bû
Matesar bû.

Ji bo dost ez çûm kafeyê
Ez ji kafeyê tîm
Ji kafeyê tîm!
Çûm kafeyê!

Çûm
Tîm
Ez çûm
Ez tîm
Dost... çûm
Tîm ... dost

*Ne delav e / hiş av e / çavkanî be ji bo
gundekî / baran be ji bo rindekê / robar be
ji bo welatekî.

*Bilind bû hîv / hîv bilind bû / bû bilind
hîv / dîtîyîsîn stêrk / stêrk dîtîyîsîn / spî
dîtîyîsîn stêrk/

Stêrk spî dîtîyîsîn / hîv bilind bû /
stêrk dîtîyîsîn

*Li xwe vegere ey însan li xwe / silavekê
li xwe bike / li xwe bike silavekê / li dilê
xwe vegere/

Vegere dilê xwe / li vegera dilê xwe ve-
gere / li dilê xwe bike / silavekê li dilê xwe

Sala par bû... pêrar... na; sala beriya
sala par bû...pitîrpêrar... roja beriya çar-
şemê bû... danê êvarê... hê roj neçûbû
ava... ez ew qas westiyayî bûm... hal nema
bû bi min re... nêzikî roj biçê ava... ew
hat... roj çû ava... lê tarî baş daneketibû
erdê... navbera tariyê û ronahiyê bû... den-
gek bi xwe xist... ew deng hê va di guhên
min de... bi dûre ez haydar bûm ku yê ku
ew deng dibihîst bi tenê dilê min bû... ez
haydar bûm ku di wê kêliyê de ne zeman
mabû ne jî nav... her tişt bêtî bû... deng
hebû... dengê wê yê ku hew min dibihîst...

“Agir bi can ketiye.”

“Piliyên kulê ji xwe dike.”

“Ber Mehemed selawat.”

“Ne bi ya Îsa dike ne jî bi ya Mûsa.”

“Ray lê nabe.”

“Deng ji kevir tê ji wî nayê.”

“Şeva ker û lal e.”

Bo windayekî daxuyanî

Yunus EROGLU

Firîk heçko dixwest tiştina ji wan re bibêje xwe li dora wan dibir û dianî, lê xuya bû vana guhên xwe nedidanê, bala wan li ser wan mirovên ecêb û wî dengê ecêb bû.

Jina wî ji Uruguayê bû. Ew jî bi qandî ku nîgaşa Ûrisetê ya di serê mirov de bi tevayî bişikîne yekî qemer bû. Go Rotterdam û hey Rotterdam... Ma li wê derê wiha bû?

Min çî dizanibû ku wê ji bilî mêvanên herî xerib û balkêş ên Qesra me, bi wateyeke ditir li ser me rûnên. Cil û bergên wan jî ew qasî temaşe bûn. Ji xeynî xebatkar û xizmetkarên me, li vê derê, zû bi zû riya kesî bi ser me nakeve.

Dîsa çavên min ketibûn lewta qahweyê ya li ser merşa ku vê sibê qewraşa me çaxa ji min re dianî şewişbû û pê de kiribû, min dît dengê kurê wê yê biçûk ji nav deriyê odeyê hat. Karkerê mazotxaneyê me li jêrê li berniga avahiyê li benda min bû ku bi çewçew ji min re vebêje ku jin û mêrekî biyanî hatine û hîn neqedand, ez bi lez û bez firiyam. Tu nabêjî bavê min jî bi vê xirecirê ketiye meraqê, gopalê wî di nav destên wî yên hizhizî de, li ser rêka kevirin a hewşê bi reqereqa pêlava xwe ya binqêsele, dabû dû min. Tew gava kûçikê me yê bi hêsp re yarî dikirin xwe fetiland û li me meyzand, min dengê wî bihîst li gel ku feqîro tişteke negotibû jî bi ser de qîriya, "Huşş kurro!..." gotê bi hêrs û hêbet; û tew tew siya gopalê wî yê ku weke tîfîngê li hewa bi ser kûçikê de rast kiribû jî di wê teşqeleyê de bi ber kuja çavên min ket. Piştî birêveçûneke dirêj ku gihaştim ber deriyê baxçe, bêtî ku paxavê pê bikim, di dêrî re derketim û min bi şîngînî ew li dû xwe girt. Erê ez wiha dibêjim, lê hîn ez negihîştibûm wir bavê min û lawikê karkerê wî li wê derê, li dora erebeyê de teşeyê cemseya leşkeran de bi meraq û

heyirîn çîrvîtik didan. Te digot qey kêfa wan ji wî dengê ji hundirê tirimbêlê bilind dibû re dihat.

Erebeyê hespan a Firîko jî, ku ji ba me don distend û li gund û bajarokan digeland, li wê derê bû. Firîk heçko dixwest tiştina ji wan re bibêje xwe li dora wan dibir û dianî, lê xuya bû vana guhên xwe nedidanê, bala wan li ser wan mirovên ecêb û wî dengê ecêb bû.

Tu yê bêjî çiqas ez şa bûm ku min cara yekemîn bi çavên vî seriyî dît ku zimanê biyanî li vê devera me jî bi kêrî mirov tê. Lê ez a niha xwe bi xwe difikirim, ez dibêjim xwene ku min hema yek ji wan baxnotên wan ên seyrî jî qebûl nekira û ew verê bikirina dê çetir nebûya? Çi îşê me hebû ji wan rêbiwarên jin û mîr, bira bi ber dûmana xwe biketina biteriqiyana. Jixwe dema ku min wê pêşniyara xerîbdost û mêvanperwer li wan kir, rûyê wan ên bi xwelî û rijika erdên şewitandî tarîbûyî walgeriyan, kuxikek li qirika wan aliqî. Ez jî çî dizanim...Hema di bin simbêlên tenik re beşîşim.

Diya min li ber serê min dike pitepit û bi berger û dubare ji min re dibêje ku eseh ez bibêjim ku çawa wê ew her du dîtine û nas kiriye ku ew ne mêvanên xêrê ne, lewra mêvanên meqbûl çî carê berî mazûvanê xwe goreyên xwe ji piyên xwe naşiqitînin. Hûn ya rastiyê bixwazin, ê min bi xwe nayê bira min ku gore di piyên wan de hebûn an na. Bes, diya min pir bi cir e û belkî di dilê xwe de min weke sersebeba şîna ev mehek e li Qesra Qado vegirtiye dibîne, loma ez naxwazim pê re têkevim gengeşiyê û bira weke ku wê gotî be.

Dema ku em li odeya ku qewraşa me fîncana qahweyê lê rijand, rûniştin, bavê min êdî yekcar ketibû halekî nebûyî. Ji nişkê ve qirpikên wî hildihatin, şaşomaşo dibû, tevzîn didan xwe û girnîjînên xiloxavî li ser wechê wî vediniştin. Wê gavê ji bo ku balê nekişîne, bi serikê gopalê xwe li raxera odeyê dikire tirketirk û diket rewşeke seyrîr.

Herçî her du biyanî bûn, piştî ku bi baldarî û tengezari çavên xwe li der û dorê, li raxerê, dolab û ref û paldankan gerandin, rabûn hatin li ber yekane tabloya li odeyê çik rawestiyan. Tiştê duyemîn ku bû sebeb diya min çavreşiyê bavêje wan, vê tevgera wan î bê rê û rêzan bû. Lê ji bê liv û lebt mayîna wan xuya bû ku mat mabûn.

Gosirmeta mezin jî li dû vêya hat. Bêyî ku ew tiştêkî pirs bikin an berê xwe bidin me, bavê min hişka bi gopalê xwe yê ji dara hincasan girt û ji ciyê xwe quloz bû, xwe rakişand ber wan. Bi xîzexîza qirika xwe ji wan re daxuyand ku wî wêneyê ku lê dinihêrin şeweyekî *Xulamê Menoyê* Platon e, ku di sed sala hijdehemîn de li girava Qibrûsê ji aliyê şewekarekî kurd ê bi navê Keyo Rasim ve hatiye wêrandin. Qirpîkeke dirêj û hêlî bi wî girt û di pey re gote wan ku di wan refên li wê hêlê (bi gopalê xwe refên li rex pencereya li hewşa paşiyê dinihêrî nîşan da) de nisxeyeke şîroveyên Farabî yên li ser Arîstoyî heye ku ji aliyê miftiyekî bajarê Amedê dused sal berê li kurdî hatiye wergerandin. Heger bala wan bikêşe dikare... Piştî dît ku bêyî ku berê xwe bidinê hê ji bi rengekî matmayî zoq li *Xulamê Meno* ku gopal di nav çongan de, li ser tahtekî rûniştî û çavên wî yên firehbûyî li çargoşeyên di nav hev de yên li erdê xêzkirî, dinihêrin, bavê min bi gavên sivik fizkirî ba min û serpehatiya xwe yî ku heya hingê gelek caran ji min re vegotibû, vê carê bi taswas, tirs, poşmanî û ji bo ku deng nere wan her duyên ku haya wî jê tune bû ku ji zimanê wî fahm nakin, bi dengêkî nizmîk, bo cara dawî ji min re

vegote û ez hişyar kirim. Diya min, ku nikare bixwîne (helbet ji vê yekê ne bêzar e), ji serî de qewitî li min kiribû ku ez bi devkî binivîsim. Ango tiştên ku dinivîsim pê re pê re jê re bixwînim. Îcar di vir de xwe dixwe navê û dixwaze vê qisetê, ku xuya ye wê ji min bêhtir, bi şevan lê guhdarî kiriye, ew ji we xwendevanên xemxur û alîkar re bibêje.

“Bavê te hîna sebî bû, rojekê ku ew jî li gel bavê xwe û mamê xwe bi kelekê êzingan dibin Mûsilê, li hinda Heskîfê ji şikefteke devtarî şewqa ronahiyekê bi ber çavên wan dikeve. Ew jî dikevin meraqê, ka bê çi ye, xwe lê digirin. Dertên bi aliyê şikeftê de hildikişin, ka bê dixwazin hinekî vehêsin jî bê çi ye; lê hema ku piyê xwe davêjin devê şikeftê dîtina ku dibînin, wa jinik û mêrikekî şilfitazî, porên wan dirêj, îşê ecêban, li wê rastê li ber êgir in. Çawa ku çavên wan bi bavê te dikevin, vana bi paşiyê, bi ciyekî tarî de dibezin ji tirsan. Evanêd me dimînin metelmayî, tu seriyekî ji wan dernaxin. Fahm nakin çi teba ne. A soxî, dibêjine wan ev çi halê we ye û tep û rep, dikevin ser dilê wan, wan têr dikutin. Dawiyê ku li hal û meseleya wan dipirsin, zilam û pîreka tazî dibêjin ku ji roja ku fêhmberî xwe bûne bi wî awayî, di wê şikeftê de bûne. Qey berî bavê te û xezûrê min, wan kesî serê xwe li wan ranekiriye, ew nedîtine.

Axir, berî ku herin rehetê xezûrê min û birayê xwe çî qapût û palasên xwe hene didin wan, li wan dîkin û li ser çem bi riya xwe de diçin. Diçin barê êzingên xwe difiroşin, lazîmatiyên xwe dikirin û tevî karwên dibin û tîna malê.

Piştî vê bi salan, ku rojekê cardin bavê te diçe Mûsilê, kar û bazara xwe diqedîne, li sûka bajêr camêrekî xweş û tîgihiştî tê balê, dibêje ileh tê îşev mêvanê min bî. Hey dibêje na na jî, ya soxî radibe pê re diçe. Li malê, xanima malê bi gelberiyê xweş wan pêşwazî dike, piyên wan di ava germ de dişon, şîva wan datîne, qahweya wan tîne, tiştêkî namîne ku ji aliyê xizmeta mêvanperweriyê de nake. Piştî şevbihêrkê

viya zoq li nava çavên bavê te dinihêre û pirsan jê dike. Pirsê bavê wî yê rihmetî, mamê wî, kelekê, êzingan, Çemê Dicleyê, devera ku herî xweş diherike, devera ku rengê wê herî xweş dibe, dike, heya ku tîne wî di devê wê şikeftê radike. Wê qula ku tu nabê wî û wê hurmeta qedirgir bi salan ji wir de bi dizî ew raçav kiribûn ku di ser çem re dişûjikîn diçûn. Ev e ku wan bavê te nas kiribûn, ma hebû ku êdî bavê te ji ew nas nekira."

Bavê min bi rastî jî wê rojê ve bawer kiribû ku evana ew her du kes in. Yên Mûsilê. Ku ew nas kiribûn. Ango yên şikeftê. Ku ew şopandibûn. Îcar ez serwest bûm, dibêje, diya min. Nexwe agirê ku wê şevê di xewna xwe de dîtibû, ne agirê donê lembeyan, lê yê ku bûbû îşareta vê bobelatê, agirê ku ew ji ser çem kişandibûn şikeftê bû.

Divê ez hinekî din jî bi vê mijara êgir de herim. Lewra pêwîst e xwendevanên birêz û dîlzîz ên vê kovara ku hejmara xwe yî ewil di meha ku bavê min wînda bû de derxist, bizanibin ku bi dirêjahiya şevbihêrka xwe yî li banê Qesrê, berê me li çemê li biniya me diherikî û deşta fireh, em û wan biyaniyan bêhtir li ser êgir axivîn. Agirê ku piştî çinîna zadî bi pirêzeya erdan dixistin. Heta fotografên ku kişandibûn û li ba fotosazekî Midyadî derxistibûn jî li ber ronahiya çirayên li pîkê banî û heyv û stêrkên Xwedê nişanî me dan. Bi qasî ku me jî hev fehm kir, zilêm xebateke li ser kêzik û mûriyên çî bi ber şewata pirêzan diketin çî jî ber direviyan û koç dikirin amade dikir. Ji germiyanên Îraqê dabûn rê, dever bi dever li pey şewatên her ber bi ciyên hêniktir ku çinîna wan derengtir pêk dihat re rêwîti dikirin.

De bes e, dirêj neke, dibêje diya min, ku her ew mirovên hevalên kêzik û heywanatan tîne bîra wê îmana wê terka wê dide. Xwendevanên ezîz bila bizanin: Sibeha mêvandariya wan bavê min wînda bû. Jina min, ku min ew ji Mûsilê aniye, serê sibê zûka ez hişyar kirim û pirtûkeke di destên xwe de bi kelogirî dirêjî min kir.

Si dios fuera mujer, Mario Beneditti. Min gotê ku ez nizanim bi kîjan zimanî ye. Tu nabêje wê ew di nav pirtûkên li refên me de ditiye. Dema ku nimêja sibehê kiriye û derketiye odeyê bo ku beşa karê îro ya tîpguhêziya ferhenga bavê min a kurdî-kurdî ku ji 176.540 xalan pêk tê bike, li şûna wê cilda qerase ev pirtûkok ditiye.

Dev ji qul û qewerên Qesra mezin berdin, ev nêzîka mehekê ye ji aliyekî de Firîko gund bi gund, bajarok bi bajarok digere û çî bigire rih ji hespê xwe yê bûyî ronahiya herêma me derxistiye, ji aliyekî ve jî min zîlamê qewraşa me û karkerekî mazotxaneyê şandîye ku şopê bigerînin lê hîna venegeriyane. Û kezêba me di devê me de ye mirovên me yên xêrxwaz! Em jî hew dizanin ku xwene heye ku ji niha bi şûn de em xebereke xêrê derbarê bavê xwe de bibihîzin, an salixekî wan her duyên biyanî hilînin ku xwestibûn li banê Qesrê, nêzîktirî kêz û mûriyan razên û dawiyê hew pêjna wan û wê xirxiroka wan î gewrik hat. Weke ku bablîsokekê ew li nav hev kiribin û biribin.

Gopalê wî yê kunêrî, va li ser maseyê, li ber me ye. Ji wî ev tenê ma ye ji me re. Bi wî re hemû tehm û kêfa Qesrê jî çû. Weke ku vikîvala bûbe. Bira gelê me yê xwedanxêr qedrê wî kedkarê xwe yê mezin bigire û êşa me malbatê fahm bike. Ev mehek e dilê me ji her tiştî sar bûye.

Wexta ku me bihîst kovara *Rojbaş*, kovara derdê gelî dertê û karkerekî me ji ajokarê qemyoneke li ba mazotxaneyê me rawestiya wê hejmara wê ya yekemîn a delal û birûmet peyda kir anî, em fikirîn ku ji daxuyaniyeke ji xebatkar û xwendekarên vê kovara ku bavê min ew bidîta wê pir pê şanaz û serbilind bibûya re, çêtir tu rê nîn e. Yên ku ev daxuyanî xwendin û avek li vî agirî kirin û bûn sebeba ku sermiyanê me, rohnîya me bavê me yê xweşdivî, ku a niha cerga me bi şewat e ku em nizanin li ku ye, li kîjan aliyî ye, li me vegere, Xwedayê mezin emrê me jî di ser ên wan xe. Nav û nişana me jî jixwe belî ye.

Şeveke havînê û mirina kalekî

Brahîm Xelîlê ŞILBÊ

Ên ku paştûyên wan hatibûn şewitandin, ên ku zikên wan hatibûn dûzankirin, ên ku bin guh û bin zimanên wan hatibûn cilêtkirin. Dermanê wê yê herî şîfadar xwînjêberdana mil bû.

Stêrkek di kûrahiya ezmên de, ji bakur ber bi başûr ve xuricî û şopeke bihurbar li pey xwe hişt. Mehme Şêrîn di hemêza bavê xwe de, piçekî din xwe spart singê bavê xwe. Bi destê xwe yê çepê rûyê bavê xwe ber bi bajêr ve zivirand. Bi pêçiya xwe ya eşhedê ya destê rastê, bi awirekî tirsnaq nişan da;

“Bavo! Bavo! Tu dibînî?”

“Çi dibînim berxê min”.

“Li diyarê gund, ber bi bajêr ve binêre!”

“Berxê bavê xwe çi bûye! Çi qewimiye!”

“Binêre! Gur wa ye li diyarê gund dêla xwe dihejîne!”

Hemo bi rûyekî nîvkenî li kurê xwe nihêrt;

“Berxê min ew ne boça gur e. Ew projektora balafirgeha eskerî ya bajêr e.”

Îro çend roj bûn Mehme Şêrîn nexweş bû, ketibû tayeke giran. Canê wî dişewitî û ji kûr ve dinaliya. Pîra Xemsa digot; “Bi serobinan ketiye”. Gorî nexweşiya wî derman kiribû. Bi pêçiya xwe ya şîfadar, bi teniya bin beroşê du xêzik kişandibûn eniya Mehme Şêrîn. Du roj bihurîbûn, li ser eniya Mehmed Şêrînê piçûk nişana duxtorîya Pîra Xemsa hêj xuya dikir. Dermanê wê şîfadar bû. Navê xwe ji pîrejintiya xwe negirtibû. Ji duxtorîya xwe girtibû. Li gund kî nexweş biketa, ne hewceyî duxtor û dermanan bû. Pîra Xemsa duxtora gund bû. Şopên dermanên wê di laşê hemû gende û xortên gund de hebûn. Ên ku paştûyên wan hatibûn şewitandin, ên ku zikên wan hatibûn dûzankirin, ên ku bin guh û bin zimanên wan hatibûn cilêtkirin. Dermanê wê yê herî şîfadar xwînjêberdana mil bû.

Nexweşê/a ku paşseriyê wî/wê biêşiya, yan dewxa wî biçûya bi cilêta xwe ya zengarok piçekî xwîn ji damarên milê wî berdida.

Tavilê êşa serê nexweş derbas dibû û dewxa wî disekinî. Yên ku dest an nigên wan bişikestana, ji wan re digot “Ev ne îşe min e, divê tu herî ba Îboyê Hesên. Ew dikare bicebirîne yan bike ciyê wî. Duxtorê şikestî û jiciderketinê ew e.”

Li gund kî ducanî ye, çend roj û çend mehî ye, haya Pîra Xemsa jê hebû. Jixwe temamê pîrekê gund bi alikariya wê welidibûn. Ji ber ku Pîra Xemsa, pîrika hemû zarokan bû, temamê zarokan jê re digotin “Pîrê”. Pîra Xemsa, navika hemûyan bi kêrika xwe ya zengarî biribû.

Şeveke tavehîv û ezmanekî bi stêrkan dagirtî ya gelawêjê bû. Ji dûr ve bajar bi ronahiyên lambeyên bêhejmar diçirsin. Projektora balafirgehê, ji rojhilat ber bi rojava, hêdî hêdî diçû û dihat û ezman dimalaşt. Ronahiya wê, şopeke bihurbar, nîvdaireyek li pey xwe dihişt û dişa ezman dikete nava nîvreşahiya xwe. Gundîyan li ser xaniyan di bin holikan de şiv dixwarin û radizan.

Dengê qurequra beqan ji newala gund dihat. Qurequra beqan û dengê barebara Hesoyê Gero yê kal ji holika cîranan dihat û tevlihev dibûn. Dengê ne zelal û nedihat fêmkirin. Wekî nexweşek binale. Di nava qîreqîr û nalenala dengê wî de, hew mirov dizanibû ku dibêje “Qîza...! Qîza...!”

Qîzaya Pîr, jina Hesoyê Gero bû. Di gund de hemûyan jê re digotin “Pîra Qîza” Hemo, fitilî ser Pîroza jina xwe. Pîroz, di bin holikê de, serê wê pê de hatibû xwarê û diponijî. Ji siba Xwedê de genimê sorgul şûştibû. Wes-

tiyabû. Ji pertav ketibû. Bi dengê mêrê xwe re veciniqî û ji ciyê xwe hol bû. Hemo;

“Hurmet, Hesoyê Gero ji êvar de barebara wî ye, tî ye yan birçî ye? Çima zikê vî extiyarê belengaz û nexweş têr nakin? Ji êvar de dinale û ji pesna xeber dide. Gelo çi dibêje, çi dixwaze? Çima ba Pira Xemsa nakin. Dermanê wê şifadar e”

Pirozê bi dengêkî nîvkenî bersiv da mêrê xwe;

“Van extiyaran, di dawiya emrê xwe de xurifine. Pira Qîza dibêje;

“Heso ji bo min, bi sê telaqên jinberdanê sond xwariye. Niha jî dibêje; were ji min re jinitiyê bike. Wele qîza min ez xwe gunekar nakim. Ji Xwedê ve malûm e!”

Barebara wî ji bo wê sedemê ye. Ne ku tî yan birçî ye.”

Şev ker bû. Bêdengiyek kete nava şevê. Qurequra beqan hêdî hêdî kêm bû û paşê hat birîn. Ji holika Hesoyê Gero dengêkî lawaz li reşahiya şevê bela bû û bêdengiya şevê xera kir. Weke dayika ji dergûşa xwe re bilorîne. Nalîn, lorîn û axîn... Hesoyê Gero, kilama “Evdalê Zeynikê” digot;

“.....

Evdal digot Temo lawo çavê bavê te kor e rê nabîne

Tu yê bi destê bavê xwe bigrî,

Bibî bavê ser ziyareta Şêx Badîn e

.....

Wey kaliyê, wey koriyê

Mirin çêtir e ji feqîriyê.

Temo lawo ji kulê dayika te re

havîn e xweş havîn e.

Qaz û quling tên ji beriyê dixwîne

.....

Wey kaliyê, wey koriyê

Mirin çêtir e ji xizaniyê..

Ha.. ha ..hahû....

Geh lorîn... geh nalîn... û geh axîn...

Hemo bi lebitîna kurê xwe şiyar bû. Careke din kurê xwe bi dilovanî ber bi hemêza xwe ve kişand. Destê xwe yê lertzok danî ser eniya wî. Xwedana wî lê sar bûbû. Agirê wî daketibû. Jina wî ketibû xeweke giran. Bayekî hênîk dihat. Bayê kur. Bayê xuşînî ji spîndarên newala gund dani. “Ba di jiyana gundiyan de gelek girîng e. Bayê benderan. Bi taybetî bayê rojava. Bender li ber vî bayê tê li bakirin. Ji bona bender were bakirin gundi gelek caran bi rojan li benda vî bayî radiwestiyan” xwe bi xwe got Hemo.

Hemo xwe qeliband ser piştê. Çavên wî careke din bi kûrahiya ezmên ketin. Stêrkên bêhejmar diçirsin. Qefleyek ber bi rojava ve çûbû. Qefleyeke din derketibû. Li aliyekî stêrka “Pêr û Mêzin” li aliyê din “Komika Sêwîyan” dibiriqîn. Di vî kêliyê de çavên wî bi stêrkên “Leyl û Mecnûn” ketin. Stêrk gelek nêzikî bûbûn. Kelecanekê ew girt. Bi hêviya her du stêrk bigihîjin hev bi deng dua kir. Daxwaza ji Xwedayê xwe yê dilovan bixwaze anî bîra xwe. Dijwariya xizaniyê, bêkesiyê, stûxwariyê, paşê, azadî, dewlemendî, di carekê de ji devê wî “Ya Xwedanê dilovan, axret û îman...!” derket.

Di vî kêliyê de dengê Hesoyê Gero bi temamî hatibû birîn. Hesoyê Gero yê dengbêj, bilûrvan û nêçîrvanê bi nav û deng... Bilûra wî ya bijare... Bilûra Nişoyê File. Bilûra bi gulikê rengî rengî nexşandî... û kilama Emê Gozê, Bavê Seyro, Seydxanê Ker, Cembeliyê Kurê Mîrê Hekariyan... Ji aliyê din ve, tajiya wî ya bi navê Xemlê. Nêçîra kêvroşkan, xem û xeyal, dem û dewran... Belê niha jî kalî, korî û xizanî.

Careke din stêrkek di kûrahiya ezmên de xuricî û şopeke bihurbar li pey xwe hişt. Dengê girînê ji holika cîranan hat. Dengê însanan her çû zêde bû. Dengêkî nas digot “Xwedê deriyekî xêrê jê re vekir. Îroj roja îne ye. Xwedê nake qismetê her kesî” kî dizane!

Feqîr û pirtûk

Tosinê REŞÎD

Wî hema roja dûre artêşa Paşayê Mûsilê, bi femandariya kurê xwe, Asêm Beg, şand ser êzdiyên Şêxanê. Berî rêketinê ji eskeran re gotin, wekî kuştin û talankirina êzdiyan xêr e, derê bihuştê li ber wan vedike.

Destpêka payîza sala 1892'yan bû, hê rast nîveka Îlona wê salê. Lê Geliyê Lalişê hê jî bi xeml û xêza havînê nitirandî bû. Cî cîna belgên dara rengê xwe guhastibûn, lê ew jî qey bêjî ji bo bedewiya gerdûnê hê belû bikin.

Geliyê Lalişê benda şahiyê bû; li benda Cejna Cemayê, li benda hatina heciyan û ji bo wê şahiyê xemla nuhbûkan wergirtibû.

Ev jî yek ji mezintirîn daxwazên dilê her êzdîkî bû, wekî dema Cejna Cemayê Lalişa Nûranî ziyaret bike, ber nîşangehên xas û bavçakên êzdiyan pante bide, bi ava Kaniya Spî xwe mor bike. Wekî beratan bi xwe re bibe malê.

Heft roj û heft şevan Geliyê Lalişê di vê cîhanê de, dibû cîhaneke mayîn, cîhaneke batinî. Û Geliyê Lalişê xwe jî bo cejnê amade dikir.

Lê ev gişk sê roj berê bûn.

Roma Reş a rûtik kîngê hiştiye êzdî çavên xwe vekin, wekî niha bihêle. Kuştinê, talanan, wêrankirinê bi sedsalan didomand. Lê niha jî bo siltan Ebdulhemîdê xwînxur vê ji êdî tîr nedikir; êzdî bûbûn kelemê çavên wî û wî niha tenê nemana êzdiyan dixwest.

Împêratoriya Osmaniye cara çendan li êzdiyan dihat xezabê.

“Kê xwest bibe misilman, bila bibe, kê nexwest, gerek bê kuştin. Li seranserê Împêratoriya Osmaniye gerek êzdî nemînin, heta peyva êzdî jî gerek ji rûbarê dinyayê bê hildan.”

Di fermanê de wisan jî nivîsibû, wekî êzdî berê misilman bûne û divêt diyan vegehin ser ola xwe ya kevn.

Ev bû biryara siltanê Împêratoriya Osmaniye Ebdulhemîdê II'yem û wî pêkanîna vê biryarê spartibû femandarê Mûsilê, Omer Wehbî Paşa.

Paşayê Mûsilê berê gazî serokên êzdiyan kir ew birin diwana xwe. Wî jî wan re fermana siltan da xwendin û xwest wekî ji nav milyonekê, sed hezar êzdiyên Împêratoriya Osmaniye jî siltan Ebdulhemîdê II'yem re nameyê binivîsin, ku ew dibin misilman.

Lê êzdiyan nexwest. Wan digot, wekî ew çawan berê ne misilman bûne, wekî ola me çend hezar sal berî îslamê hebûye. Paşê jî kal û bavên wan bi hezar salan li ber xwe dabûn, bi sedhezaran bûbûn cangorî, lê diyan jî dest ji ola xwe nekişandibûn.

Û êzdiyan nexwest dest ji ola xwe bikişînin. Ji rîspiyên êzdiyan yek hema li wir, li ber çavê gişkan, bi lêdanê kuştin. Lê kuştinê jî çare nekir.

Omer Wehbî Paşa li benda berxwedaneke wiha nîn bû. Ew bi hêrs ji cihê xwe rabû, beriya ku berê xwe bide êzdiyan di nav diranan re got:

“De hûn ê bibînin, ez ê wisan bînim serê we, wekî heta kurê kuran bê gotin.” Got û jî hundir derket.

Wî hema roja dûre artêşa Paşayê Mûsilê, bi femandariya kurê xwe, Asêm Beg, şand ser êzdiyên Şêxanê. Berî rêketinê ji eskeran re gotin, wekî kuştin û talankirina êzdiyan xêr e, derê bihuştê li ber wan vedike. Hemîn çî wan talan kir, para mezin a wan e.

Di tamarên eskerên tirk de xwîna bapîrên wan, koçerên beriyên Asyaya Navîn hişyar bûbû, wana niha tenê kuştin û talankirin dixwestin. Noli canegê ji bîna

xwîne sewdeser bibin, dixwestin her jîndarî bikujin, her şênîyê wêran bikin.

Gava kuştin û wêrankirina deverê qedandin, vê carê hatin ser Lalişa Nûranî.

Asê Beg li pêşîya eskerê xwe dihat. Serê kalemêrekî bi rû û guliyên çilqerqaş bi serê rima wî ve bû. Wî ew wek alekê bilind girtibû û li pêşîya eskerê xwe dihat.

Li Sûka Merîfetê ew ji hespê peya bû, serê kalemêr bi rimê ve da piştîmêrekî xwe, wekî bive deyne ser dîwarekî bilind. Serê wî hinekî di ber de çend gavan bi pêş ve çû, qey bêjî difikirî ka ji çi dest pê bike. Paşê li ser milê xwe zivirî û emir kir:

“Li vê derê kuçikekî mezin dadin. A, wan darê hanê bibirin, bînin.” Wî, darên zergûzê nîşanî eskerên xwe dan.

Darên zergûzê, ku bi belgên wan xerqe û kulik reng dikirin, birin û bi êzingên wan li Sûka Merîfetê kuçikekî mezin vexistin. Seva agir baş pê bigire bizrê zeytûnê, ku ji bo çirayên pîroz bû, ji Mergehê derxistin anîn û bi ser darên ter de kirin. Gava agir pê xistin, alavê bi carekê ve xwe avêt êzingan û hilkişîya jor.

Feqîr Neqaş li şûneke dûr rawestiyabû, çavên wî nîvgirtî bûn û hema wisan pitepita wî bû; wî di ber xwe de ‘Dirozge’ digot.

Çavên wî reş û mezin bûn, birûyên wî six. Di bejnê de nîvçe bû, lê bi dest û pê, bi ser hev de kutayî. Baqê simêlên palikî, ku tu caran dest pê neketibû, li ber bêvila beranî bû. Porê wî dirêj, ku bi çend guliyên vegirtî bû, bi ser navmilê de dihat xwarê. Dêmen wî li ber tava havînê qimilîbûn. Li ser dêma wî ya aliyê rastê dexmeke kûr ji derba şûran hebû.

Niha wî her du destên xwe kiribûn kulm û bi kêleka xwe ve guvaştibûn. Tenê carcaran destê xwe yê rastê nêzî devê xwe dikir û devzendekê xerqe bi lêvên xwe ve diguvaşt.

Û ‘Dirozge’ digot!

Ew ji vê dinê hilatibû, wî zanibû, ew ê bên û herin, evdên serreş in. Ka hê rastiya Xwedê ji bo wan diyar bibe. Ew xalifiyên

Xwedê hê gelekî ji heqîqetê dûr in.

Û wî “Dirozge digot”;

“Şemsê êzdiyano,

Milkê mêrano...”

Benîadem di jiyana xwe da çi bibêjî nake, lê tişt nabe, roja gişkan wê bê. Gişk dê rojekê li ber mîrê xwe bersiva kirinên xwe bidin, çi baş û çi jî xerab.

“Ez wê kim ro hatiye erşan e,

Ez wê kim ro hatiye erşan e,

Hilatiye manga giran e,

Nûr û nedera Şêşims,

Ji erşa daye masiyê binê beran e”.

Ew niha difikirî ka giyana Omer Wehbî Paşa wê ber bi çi lawirî de bê. Ew ê ku giyanê vî zalimî di ber mirovan de nayê, tu guman tune bû. Û li ser zarê wî ‘Dirozge’ hebû;

“Navê te mîr e, navê te mîr e,

Ezîzê min navê te mîr e,

Şêşimsê min navê te mîr e...”

Wî di bîra xwe de yek bi yek lawir bibîr dianîn û giyanê Omer Wehbî Paşa hêjayî tu lawirekî nedît. Dilê wî seva lawiran diêşîya.

Û Omer Wehbî Paşa kurê xwe şandibû ser êzdiyên Şêxanê.

Kur ji bavê zalimtir bû. Eskerên wî ketin gundên êzdiyan. Çi kuştin, çi wêran kirin, çi talan kirin. Niha jî xelk bi zor berhev kirine, ka wê çi tiştê nebînayî û nedîtî binin serên wan.

Asê Beg, kurê Omer Wehbî Paşa, destê xwe yê çepê dabû paş xwe, li dora agir diçû dihat û emir dikir. Wî zûzûka bi destê xwe ye rastê simêlê xwe badida. Dême wî teherekî şidiyayî bû, tu yê bibêjî qey bûyerên ew niha pêk tîne, kirinên wî, ji bo jiyana wî gişî girîng bûn.

Asê Beg zalimiya bavê xwe dîtibû û niha nedixwast ji bavê daxwe. Wî dixwest nav û dengê wî derkeve, wî dixwest nav û

dengê wî li seranserî împêratoriyê belav bibe.

Û li wê împêratoriya ser zilm û zorê, ser kuştin û wêrankirinê hatibû avakirin, te tenê bi zalimiya xwe dikaribû nav qazenç bikira.

Niha jî wî emir kiribû, wekî gorên xasên êzdiyan bikolin, hestiyên wan derxin û bînin ber çavên êzdiyan bavêjin nav agir, bişewitînin.

Niha jî dora miriyan bû!

Feqîr Neqaş ‘Dirozge’ digot.

“*Ya rebî, xatra pîrê Memê Şivan, Gavanê Zerza,*

Pîra Fat, Xatûna Ferxa,

Qere Şêx Mendê Ferxa kî.

Xatra wan mêra û wan meleka kî...”

Asêm Beg dûre tu yê bibêjî qey ji çûyîn û hatinê westiyabû, hinekî ji kuçik dûr ket û li ser zinarekî rûnişt.

Wî bi serbilindî li agir dinihêrî. Roj bi dilê wî bû; eskerên wî zêdeyî çarsed êzdî kuştibûn, agir berî malên wan dabûn. Bi fermana wî bestûyê girvanê gişkan dirandibûn.

“Divêt tu nîşaneke êzdiyantiyê li rûbarê dinê nemîne!

De bira bizanibin, ka Asêm Beg çi mêre. Pey roja îro re nav û dengê wî wê li seranserî împêratoriyê belav bibe, wê heta bigihîje siltan EbdulHemîd jî!”

Wî planên mayîn jî kiribû; wê niha tîrb û nîşangehên xasên êzdiyan gişkan li ber çavên wan xera bike; hest û pestên xasên wan li ber çavên wan bişewitîne.

Paşê jî...

Paşê jî wê Lalişa Nûranî bike tekiya derwêşên misilman!

Vê baweriya dawîn dilê wî gelekî şa dikir. Tu kesî berî wî ev yek nekiribû. Cara yekemîn Asêm Beg wê pîroztirîn perestgeha êzdiyan bike tekiya derwêşên misilman.

“Êzdiyên mayî jî bila ji derdan xwe bikuşin!”

Îcar bavê wî dê çiqas şa bibe, gava vê plana wî bibihîze. Wê li ber gişkan gazî wî bike, serê wî bi pêsira xwe ve biguvêşe û eniya wî paç bike. Ev bûyer wê seva bavê jî bibe serbilindî. Çawan jî hebe, wê ji siltan Ebdulhemîd re bibêjin, wekî Asêm Beg kurê Omer Wehbî Paşa ye.

Wî ev daxwaza dilê xwe hê ji tu kesî re negotibû. Û niha di bîra xwe de digot û xwe bi xwe şa dibû.

Ew di nav van mitalan de bû, gava ofîsêrek nêzî wî bû.

“Ezbenî, gava li gundekî me agir berî xaniyan didan û em nêzî malekê bûn, xortekî ku xurcek di dest de bi lez ji mal derket, xwe bi carekê re avêt ser piştê hespê û xwest bireve. Lê tiving di destê min de bû û min di dest xwe de gule berî hespê da. Hesp ket, lê tiştê bi siwar nehat. Wî xurc hilda û da pala fêza gund. Lê du siwaran da pey, ew kuştin, xurc jî anîn. Di xurcê de tenê ev pirtûk hebû.” Wî got û pêçeka di destê xwe de dirêjî Asêm Beg kir.

Feqîr Neqaş pêçek nas kir û wî zanibû, wekî kurê wî êdî kuştî ye. Kur heta bîn di ber de hebûya wê pirtûk neda destên wan.

Teherekî xwêdaneke sar ser re avêt. “Gelo ev bêbav dê niha çi bike?” Di cî de çila bûbû, mabû. Te xencer lêxista çilkek xwîn jê nediçû.

Asêm Beg pêçeka sor a ji qumaşê zêrbenî vekir, pirtûk jî nav derxist, carekê duduyan di destê xwe de wergerand, çend pelên wê vekirin, lê nihêrî. Paşê pirtûk dişa girt û bêxem dirêjî ofîsêr kir.

“Bavêje nav agir.”

Ofîsêr pirtûk jî destê Asêm Beg hilda û ber bi agir çû.

Feqîr Neqaş bi carekê ve veciniqî. ‘Na, tenê ne ev yek’.

Ew pirtûk bi destê Melek Şixisin hatibû nivisandin. Kerameta Xwedê bi Melek Şixisin re hebû, ew xweyê qelemê bû û di vê pirtûkê de gotinên Xwedê hebûn. Heftê û heft bavên feqîr Neqaş ew pirtûk parastibûn; ji avê, ji agir, ji fermanên mîran, paşayan, şah û siltanan. Hê tu caran destê biyaniyan li wê pirtûka pîroz neketibû. Îcar çi qas di rihîna vê pirtûkê de serê xwe dabûn. Û niha wê bavêjin nav agir? Ew ne tiştê bûyîne bû. Û feqîr Neqaş derket pêşiya ofîsê û zarî wî bû.

“Ezbenî, ew gotina Xwedê ye, nabe ku tu biavêjî nav agir, guneh e.” Wî got û destê xwe dirêjî pirtûkê kir.

Ofîsêr qamçiyêke zexm kişand dêmên wî. Wî destê xwe yê çepê da ber çavên xwe, destê rastê dîsan dirêjî pirtûkê kir. Vê carê eskerekî bi qûndaxa tivingê heta qeweta wî hebû da hêta feqîr a rastê. Feqîr Neqaş hinekî şewişî, paşê nola simbîla dirûti ji jor de hat xwarê.

Pirtûk avêtin nav agir. Feqîr Neqaş ji cih rabû, çiqas jî dilikumî, lê xwe gihande kuçik, gavda nav agir û pirtûk di dest de derket.

Pirtûka bi çerm rûkirî agir hê jî pê neketibû.

Agir cih cihan bi kincên feqîr girtibû, lê xema wî nîn bû, wî pirtûk bi singê xwe ve guvaşt û xwest bireve. Lê du eskeran xwe pê re gihandin, girtin, anîn bal Asêm Beg, bi zor û ber ew dan ser çokan û li bendê bûn ka qumandarê wan wê çi emir bike.

Asêm Beg bi xwe nêz bû û bêtî tiştêkî bibêje, pihîneke zexm da defa singê feqîr. Feqîr ket, lê hê jî pirtûk bi singê xwe ve guvaştibû. Asêm Beg vê carê mîna dînan destên wî, milên wî, serê wî û lingên wî da ber pihînan. Pê re jî digot, “han ji te re, han ji te re!” Lê wî hê jî pirtûk ji destê xwe bernedida. Eskeran bi zor pirtûk ji nav destên wî derxistin û dan Asêm Beg. Asêm Beg vê carê bi xwe nêzî kuçik bû, beşereke qelp li ser lêvan, li êzdiyên komkirî nihêrî, paşê teherekî bêxem û tewekelî pirtûk avêt nav agir. Demeke pir kurt li agir nihêrî, paşê pişta xwe dayê û çû li

ser kevîrekî dûr rûnişt.

Feqîr Neqaş bi lez ji ciyê xwe rabû, bi pişta xwe girt, bi teherekî ji êşê kûzbûyî, dîsan xwe avêt nav agir û pirtûk derxist.

Vê carê çend eskeran xwe gihandinê, dan ber qundaxên tivingan, kulm û pihînan. Dîsan pirtûk ji destê wî derxistin û avêtin nav kûra agir.

Agir çiqas diçû gur dibû, fire dibû. Niha alavê êdî xwe davêt ber perê esmanan.

Feqîr Neqaş vê carê êdî hêdîka ji ciyê ketî rabû, serê xwe bilind kir, di dilê xwe de dua kir û hêdî hêdî ber bi kûra agir ve çû.

Wî êdî lez nedikir. Wî zanibû êdî dereng namîne. Rasterast gavda nav kûra agir, pişta xwe rast kir, serê xwe bilind kir û rawestiya. Li ber alavê taba xwe neanî, serê xwe hinekî mîl kir û milê xwe yê rastê da ber çavên xwe. Paşê bi teherekî xwe civand ser hev û di cih de qincilî.

Zarîn ket nav êzdiyan. Jinan li xwe xist. Paşê ji nişka va hey li vir, hey li wir qewalan dest bi qewla ‘Seremêrgê’ kirin. Dengên mayîn gişk bi carekê ve temirin.

Koma qewalan ew ber bi xweyê wî verê dikir.

Deng çiqas çûn, zêde bûn. Demek hat tu dibêjî qey Geliyê Lalişê bi kubra qewlê tijî bû.

“Dengê wan bibirin.” Asêm Beg kir qîrîn. Esker ketin nav xelkê, bi ser wan de diqijîyan, gule di ser wan re berdidan, bi qamçiyên li xelkê dixistin. Kesên diketin ji dîsa qewl digotin.

Asêm Beg bi xwe bi nav xelkê ket; mêr, jin, zar, kal û pîr nedinihêrî, çep û rast xelk dida ber qamçiyên. Lê demek hat, tu bêtî qey westiya, emir kir ku hespê wî binin. Li hespê siwar bû û ajot.

Hinekî paşê ewravî bû, ewrên reş û giran rûyê royê girtibûn.

Lê ji nişka ve ewr ji hev qelişin û Şems nedir da.

12.01.06

Huso Derdewer

Mehmud NÊŞÎTE

De bêre ver mekewe ha! Şima dî, no sîreto misteqîn de meşka na feqîra Homayî dirîya. Homa aye rê bêro rehm. Ko nika bê meşke se kero?

Yew dewe de bi nameyê Husênî yew mêrdek estbi. Hûsên zî sey dewijanê xo wayirê keyeyî, kar û gureyî bi. Sey heme dewijan, o zî dosere ra werîştene, dest bi kar û gureyê xo kerdêne. Şan de zî şîne keyeyê xo, Homa çi kerdibi qismet, niştêne ro eke qirrika ey ra bişiyêne war, werdêne û dima zî eke hewnê ey biamêne raqelebiyêne û rakewtêne.

Mi va, “eke wer qirrika ey ra bişiyêne war... û dima zî hewnê ey biamêne”. Labelê Hema-hema her şan ne werd qirrika ey ra şîne war û ne zî hewn kewtêne ey çim. Çünke Hus timûtim derdnak û lomedar bi...

Eke yew roje gureyêkê Hesî sey zerrîya ey nêşînê sere, a roje o sews bine: Lewê ey bine derg, mirûzê ey bine tirş û seke herediya bo, xo merdiman ra dûrî dayne, şîne yew kunc de xo antêne pêser..

Semedê xo tena wina nêbi. Gureyê dewijêkê ey zî çewt bişiyêne reyna Hus kewtêne ver û werdiş û şimitişî ra bine. A roje ne huyêne ne bermêne wina mirozyayemirozyaye sey xîntan şîne-ameyne.

Na dinyaya şîrine de çend ke hadîseyê başî yê ke keyfê merdimî pê yeno, endêke zî ê nebaşî estê çew kuno ver û bi rojan xemgîn beno. Labelê tay welecaxê şenikî başî zî bibê çew ende zî ê nebaşî yê ke merdim keweno ver bi rojan pê xemgîn beno estê. Tayê hadîseyê şenikî estê ke baş zî bibê xirab zî bibê kes înan ra zaf keyf nêgêno yanzî zaf nêkeweno ver. Labelê Husî rê wina nêbi, tifaq pîl bibêne, şenik bibînê ey rê derdêko pîl bi.

Eke bieşnawêtêne ko ra dareya yew

merdimî şikîyaya, yan cuwên de nîreyê gayê yewî şikîyayo, yan yaban ra mangayêka yewî nêweş kewta yan meşka yewî diryaya, Husî xo rê kerdêne derdêkê giran, kewtêne ver û ne werdêne ne şimitêne.

Xo bi xo vatêne: Haaa ha, de bêre ver mekewe! To dî desteyê dareya ey şikîya! Ko (do) feqîrê Homayî bê darey se kero? De ko darêya şikîti bigêro bero çarşî, ko bigêro hededan dima, ko hedadî destey darey darey wa nê, ko mêrdek bêro reyna hera xo aspar bibo, şêro daristan, hema newe ra velgê xo bibirno! De bêre ver mekewel.

Yan zî vatêne:

-Haaa ha de bêre ver mekewe! No wext wextê şikîyayîşê nîreyî bi?! Tay mend bi cuwenê ey biqediyênê, nîreyê gayî ey şikîya. Ko feqîrê mi hema şêro nacarî het. Newe ra nîreyêk virazo, ko hema bêro berzo milê gayê xo.... de bêre wa werd to qirreke ra şêro war ha!

-De bêre ver mekewe ha! Şima dî, no sîreto misteqîn de meşka na feqîra Homayî dirîya. Homa aye rê bêro rehm. Ko nika bê meşke se kero? Meşke pine zî nêbena ke meşka xo pine bikero. Ko hema şêro nata-weta meşkêka newa bivîno, ko bêro bihesilno û newe ra bierzî sêdare. De bê ha, de bê ver mekewe. Ez ewnîyena halê na feqîre ra adir keweno qeseaya mi adir!

Rojêke senî beno Hus bêderd yeno keye. Sey her roje bêkeyf nîyo. Rîyê ey huyeno. Mirozin nîyo. Parsê cîniya xo keno. Bîkeyf şîno axur, îş û karê xo keno.

Nê rewşe rê keyfê cinî ey zî yeno. Cinîke vana:

-Hûsên ewrokeyfê to ho ca de. Ez belxurêk virazî, ma a kerga sîyaye zî sere birnê û berzê belxurî ser ma pîya ronişê, bi zerrîya xo biwerê.

Na pêşnîyaze weşê Husî şîna. O zî ke qebul keno, cinîke hema leze leze kerga sîyaye qefelnena dana ey, Hûs hetanî kerge sere birneno, cinîke zî belxurî nana ser.

Şan beno, cinî goştê kerga surkerdî, lengeriyêke belxur û uskurayêke zî doye meşke ronana, herdî nişenê ro bi koçikan feletênê ser.

Hema koçika diyîne yan dê piro yan nêdê piro, teber ra yew vengê qelebalixêke eşnawîyeno. Cinîke werzena şîna teber ke biewnîyo hela no çi qelebalix o. Ber ra ke-

wena teber, qederêk ra pey agêrena yena zere. Gama cinîke yena Hûs perseno vano:

-Cinîke, se bîyo, o çi qelebalixo?

Cinîke vana:

-Fek ci ra vera de, çike nîyo. A hera cîranê ma zaya, ci rê cehşêko bê boçe bîyo. Şar ser o ameyo pêser,

bîyo qelebalixê înan.

Hûs ke na xebere eşinaweno, hema koçika xo gêno û seqêneno sifrî ser. Vano:

-De bêre ha, de bêre nan biwerê! Nika ko wayirê a here xo rê sekero? O cehş ko bibo herêko pîl. Ko wayirê ci, arişê xo bar biko û bero arê. Eke rayir de o hero bêboçe erd gino, ro kewt, o feqîrê Homê ko çayê (kamçayê) herî bigîro û werezno? De vaje! Ko çayê herî bigêro werezno?

Axîne

Daîmî BÎNGOL

çarewerê Dêrsimî ko yê
mordem ke biqîro
kane asparê ma
koyî ju fek
kane asparê ma
gegane veng kuno ra asmên
cikîyayîş qîrayîş
hard û asmên lerzeno
kîlidê koya esto
heya bawo
e zonî ke
vatena ê verena
eşq û muhabbet
dem ge perperikî dormê çila de per-
vane
ge awa zelale çerxê areyî çarnena
domanî zonê ma qesînêkenê
koyî miradiyê
koyî bêveng ê

Munzur mîyanê koya ra der beno
çever o
şawuya rojî ya
nazlî yo
nazik o
pîyo bira wo
Munzur axîna veyvikanê tezîyan o
koya kîlidê xo eşto Çemê Munzurî
nika Munzur bêveng o
bêveng ê darî berî
rüyê xo çarno Duzgin Babayî
mî rê mucxil be şanika Şahê Maran.
vaya reyhan ere.

Zarê kevirî

Feratê DENGIZÎ

Evîn, dilînî dilkevir e, dilkevirî ye, dilê me bûye kevir, kevir e. Lê kevir ji hez dike, dihele ji bo evînê, tenê ku tu zarê wî bizanibî, zarê kevir, zarê kevirî...

Herê, kevir jî dipeyîvin.

Dibin evîndar, evîna zaferanî; û evînan, destanan, çîrok û jiyanan vedibêjin.

Herê ev der warekî, efsûnî ye...

Tenê ku tu ji zarê wî fêm bikî.

Xuya ye ku birêz Cihan Roj ji vî zarî, jî vî zimanî fêm kiriye.

Carinan dil kevir in, lê kevir jî bi dil in. Kevirê bédil kêman in.

Evînê gelek kevir helandine, mehandine.

Meseleyek dirokî ye, ev pirs. Gelo, war ku ye? Bersiv jî cur be cur in, lê dil rehet nakin. Nakokî didome. Bibêje jî G. Sandêyî û bi vir ve, belkî jî hê kevintir. "Ciyê ku zikê min lê têr dibe warê min e" yan jî "War, ax e, xak e, ciyê ku rehên te xwedî dikin bi xwêdan û xwîn û evînê, yanî war, welat e."

Belê ev nîqaş didome û birêz Roj, di romana xwe ya "Gîtara Bê tîl" de van bersivan dixê pêşbirkê. Bi ya min, bersiveke dirokî tê de heye û xweş hatiye hûnandin, tenê hest nayên derkirin tê de! Gund, bajar û axa ku dihat gotin "gum-gumok jê direvin" çawa dibe, çawa bûye warê evînê. Lê çi bikim li welatê me, li ser axa me heskirin hatiye kuştin. Evîn, dilînî dilkevir e, dilkevirî ye, dilê me bûye kevir, kevir e. Lê kevir ji hez dike, dihele ji bo evînê, tenê ku tu zarê wî bizanibî, zarê kevir, zarê kevirî... Hilbet ku dil ne kevir be, dil û ûjdan hebe, wek Beriya Mêrdînê ji Keleha Mêrdînê

xuya dike rastî... Ax, warê min î efsûnî... Ax, axa min î dilkeser î bêkes û sêwî. Lê wê qedrê te bê zanîn mîna qehweya te ya bêhnxweş î di taya rihanê de, wek herikîna reyhaniyê...

Cihan Roj, dest û hest û hesteyê te her hebin...

Derbarê teknîka romanê de zêde nikarim tiştêkî bibêjim lê dixwazim ji aliyê zimanî ve hinek tiştan, ku li gorî min kêmanî ne, li gorî ku ez dizanim, par ve bikim:

Bi nav xeyalan diket / rp. 7; bi ya min "diket nav xeyalan" wê çêtir bûya.

Teeen sodayê, teeen kolayê (Sodayê bine... Kolayê bine...) / rp. 10; bi erebî ev "werin sodayê, werin Kolayê" ye. Ji bo bibêje "sodayê bine" divê bigota "Cîbil sodayê" û ji bo kolayê jî bigota "cîbil kolayê".

Em her tim ne bi aîdî xwe ne, ne wanî ye Şadî? / rp.76-78; bi ya min 'bi' li vira zêde ye.

"Em her tim ne ayidî xwe ne, ne wanî ye Şadî?" wê rastir be.

Ji Heskîf li wî digeriya / rp.84 – Taxa Kotek / rp.87 – di bin dara behîv de rûniştin / rp.89; tewang kêman e. Divê 'Ji Heskîf li wî digeriya' - 'Taxa Kotekê' - 'li bin dara behîvê rûniştin' bûna.

Rih geh çû wextek li Îzmîr geh hat Mêrdîn / rp.155; 'geh çû wextek li Îzmîr' qels e. Divê, "ruh geh çû Îzmîrê geh hat Mêrdînê" an jî "ruh geh çû wextekî Îzmîr geh hat Mêrdînê" bûya.



Bi dûre em hincas dixwar / rp.156; nabe, divê, “di dû re me hincas dixwar” bûya.

... tiriye Zinar dixwarin / rp.196; tewang tune ye, nabe. Divê, “.... Tiriye Zinarê dixwarin” bûya.

Gîtarekî bê têt, an jî ‘nameyekî...’ / rp.196; amûrên mûzîkê tev ‘mê’ ne, li gorî rêzimana kurmancî, ‘name’ jî wisa; divê, “gîtareke bê têt” û “nameyeke...” bûna.

Wekî din, ji aliyê çapê dizayn hebekî zeîf e. Xwezîka berg ne reş bûya. Reş, bûye wek sembola me kurdan, hêviyê qut dike. Lê hêviya me xurt e. Disa mîzanpaj qels e, germî

û herikîna xwendine sist dike.

Wek gotina dawîn; bêhna Mêrdînê jê difûre. Ez dibêjim bêhn bikin, bêyî vê nemînin.

Hezkirên vî warî û hezkirên vî zimanî; evîna kevir, evîna kevirî li hêviya we ye...

Bi hêviya gelek berhemên wiha kurde-war...

Gîtara Bê Têt- Roman- Cîhan Roj- Weşanên Do- Çapa yekem: Adar; 2009- 222 rp

30.09.2009 - Amed

Bi xatirê we

Bozan YAMAN

Ji bo Mehmed Uzun

Kê xêr di kê ro di
Gulok hate ziyîn
Hat bi dawiyê sekinî
Kê xêr di kê ro di

Rojên geş borîn êdî hembez nakin birûsk çîyan

Li şûna hespên kimêt
Bergîrên qelp sekinîne li ber deriyan

Xwediye kêfxweşîyan çûn
Xwediye derd û kulan vegeriyan
Xwediye dar û ber
Ezmanê şîn

Pincarên ber çeman
Hekên germ
Çûn û bi xwe re birin
Neynika demên borî
Xwediye tovên riziyaî li me vegeriyan

Min li temenê xwe lezand
Bayê xerbî bû hat û borî
Min guloka xwe zî
Anî bi dawiyê sekinand

Baskê ronahiyê şikestin
Bi bayê bezê derbas bû di temenê min re
Li ser striyan raketin
Û Hêrikîna bi çeman re

Çiya û derî

Bîrhan KESKÎN

Wergera ji tirkî: Elîxan LORAN

Derî

Ji min bibihure, ez disekinim,
ez dipê, ji min bibihure,
lê tu yê ji min biborî ku ez nizanim.

Gotin ku, mêweyeke stewiyayî heye
di binê perdeya sebrê de
dê dinya sebrê hînî te bike,
tehma mêweya stewiyayî jî.

Gotin ku, tu mîna van daran
li bendê mayî, mîna van daran xeyal,
mîna van daran bi keser.

Vebûm, hatim girtin, vebûm, hatim girtin,
bi qasî yên hatin min ên çûn jî dîtîn,
ka dawiya sebrê, ka kera xemxur,
hinara bêperwa ka,
ka baxçe?

Yek bihata.. yekê/i bidîta...
yek hatibû... vekiribû... sekinibû...
hê jî li ba min e.

Ji çend zemanan û vir ve
valahiya hundirê min diçinge,
destê kê lê rabû,
şengebiya baxçe bû, tûya li hemberî min?
herî zêde me li hev mêze kiribû,
bila carekê ziman têketa devan,
min pir dixwest

Bi ya min bûya ez ê hiş bibûma,
lê belkî kilîla zingarî ya zimanê min vebûya
Dizinge hevoka min a bi riyên çep ketiye,
da ku rih bi kurmên hundirê min were,
min bêtaqet kire çirkeçirk.

Min hemû dît, min hemû dît, dawiya sebrê!
yek bihata, yekê/i bidîta, yekê/i bidîta,
vêga, ba min kil dike.

Çiya

Axaftina li hemberî sibehê çi diwar e!
Tu mîna xweliyeke zirav dimînî,
Çiya rîya ku diçe hişbûnê dizane
tu nizanî.

Kevir diqelişe bo kulîlkekê, rê didiyê.
Kurt lê dixê kulîlk: Dibêje “dinya”,
“min dît, bi min re temam dibe.”

Axaftina li hemberî rûyê erdê çi diwar e!

Ji pesêr li jêr binihêre, kendêl bibîne!
bibîne lalûtewo
xwîna lawaz a hundirê te, zimanê pûç,
halê nebûyî
li lûtkeyeke zîvîn dihele.

Guldesteyek helbest

Friedrich NÎETZSCHE

Wergera ji almanî: Husên M. HEBEŞ

Li vir zêr digindirin...

Li vir zêr digindirin, li vir ez bi zêran dilizim

–Lê ya rastî zêr bi min dilîzin – û yê digindire ez im!

Merdî

Tu li ku derê bî

Kûr bikole

Kanî li jêr e!

Bihêle mêrên tarî biqîrin

Li jêr tim dojeh e!

Ev e mirov

Belê!

Ez dizanim ji kîjan kokê me

Birçî me weke alavê

Vêdikevim û vedimirim

Destê xwe bi çi dikim dibe ronahî

Çi li şûna xwe dihêlim dibe komir

Bêguman ez alav im.

Sirûda serxweşiyê

Ax mirovo! Baldar be

Kûraniya nivê şevê çi dibêje?

Ez razam, ez razam

Û ji xewneke kûr hişyar bûm

Cîhan kûr e

Kûrtirî gumaniya rojê jê re be

Êşên we kûr in

Şahî ye – lê ji êşên dil kûrtir e

Êş dibêje: Biçe!

Her şahiyek dixwaze hemdemî be

Kûr dixwaze

Hemdemiya kûr!

Zîrebûna cîhanê

Li zeviyeke dûz nesekine!

Pir hilnekişe jor jî.

Nêrîna herî baş ji cîhanê re

Ew nêrîna ji nivbilindiyê ye.

Kaj û birûsk

Bilind mezin bûm, ji mirov û dewaran bilindtir

Dipeyivim – lê tu kes bi min re napeyive

Di tenahiyê de mezin û bilind dibim

Li bendê me – lê li benda çi me?

Cihên ewran nêzikî min in

Li benda birûska destpêkê me.

Zanatî diaxive

Hişk û nerm, sert û tenik,

Kedî û ecêb, gemar û pak,

Soza dîn û zana

Ev tişt hemû ez im

Û dixwazim di eynî demê de

Kevok, Mar û Beraz bim.

Nivîsandina bi lingan

Ez ne tenê bi destê xwe dinivîsim

Lingê min jî dixwaze pê re binivîse

Di cih de, bi azadî, bi merdî, min dibe

Carina di nav zeviyan re,

Carina jî di nav pelan re.

Gulên min

Belê! Şahiya min – tu dixwazî şahiyê bidî

Belê her şahiyek dixwaze şahiyê bide!

Hûn dixwazin gulên min jêkin?

Divê hûn di nav zinar û striyên sêncê de

Xwe xwar bikin û veşêrin

Pir caran tilî wê xwe dirêjî we bikin!

Şahiya min – ji henekan hez dike

Şahiya min – ji jîrbûnê hez dike

Hûn dixwazin gulên min jêkin?

Pisîk

William SAROYAN

Wergera ji îngilîzî: Aydin RENGÎN

Wî bi tilîka xwe tîpa M şahîk û rast kir lê belê wê nespehî xuya dikir, loma wî biryar da ku tişteki xweşiktir li devereke din a baştir a peyarêka nû binivîse

Keçika biçûk li ser patenên xwe, ji zîlamê ku dest û kabokên xwe danîne erdê ku çîmentoya li ser peyarêkê misêwa dikir, pirsî, “Ma pisîka te heye?”

Zîlam got, “Pisîkek min î nûwaze mezin û ew dibêji mîouoow heye.”

Keçika biçûk li zîlamê li ser dest û kabokên xwe ku bi kevçîk bi lez xerc şahîk diki nihêrî. Keçik fikirî ku ew bi tevahî wek pisîkeke mezin î nûwaze ye, gava miyawkirina zîlamî jî dibihîst ew difikirî ku ev bi rastî jî tişteki gelekî xweş û serkeftî ye. Dibe ku ew pisîkeke mezin be ku wisa li ser dest û kabokên xwe ye.

Wî serê xwe wek pisîkeke ku bi dilşewatî bimawîne rakir û got, “Mîouoow, mîouoow.”

Wî ne ku henek dikirin. Ev parçeyekî wî yê herî baş bû. Keçikê jî vê pisîkê gelekî hez kir.

Ev ji saet heştê sibehê ve bû ku zîlam dixebitî û niha saet li der dora deh û nîvan e. Ev cîraniyeke pir xweş bû, bi oqyanûsê re. Hemû xaniyên wek hev, tekûz. Xwediyê van xaniyan karkerên li ofisan dixebitîn û xwedî diravekî ne zêde bûn û jinên wan jî xanimên mala xwe yên baş, listikvanên biricê û guhdarên radyoyê bûn. Wî her sibe li anîşkê li radyoya xanîkî jî wan guhdarî dikir. Ew orkestraya jazzê ji Chicago bû xwedî spîkerekî dengêki henekçi bû. Ya rastî wî bi zelalî peyv his nedikirin lê belê ji dengê spîker û şeweya bikaranîna peyvan û hilberîna tona dengê spîkerî wî dikaribû bibêje ku spîker yekî henekçi bû. Serê sibehê muzîk gelekî xweş bû. Wî dizanibû oqyanûs ne dûrî wî ye jî û wî bêhna oqyanûsê dikir. Wî jî kar pir hez dikir û wî xwe li nava vî welatî li vê devera ku xanî

nêzikî hev û tekûz in, weke parçeyekî mîsyonekê didit.

Karê wî seraqet li nava bajêr li deverên ku dengê qerebalix û heyteholê jê kêr nedibûn, deverên ku her dem trafîka li hev gelicî û dixan lê heye û bêhna mazotê û bêhn û pi-xara tiştên qurmî bûne jê kêr nabe, mirovên feqîr, ew deverên ku bajar bi xwe ye û ew bi wan deveran pir xweş dizanî, bû.

Ji bilî vir, ev rojavabûn, tişteki pir cuda bû û wî nava xwe bi bêhnstendineke kûr bi bêhna oqyanûsê û bi bêhna zurçikê kesk î teze dagirt.

Ew bi salan re ne mirovekî ciwan bû, lê weke karkerî ew xwedî xîret, camêrekî xwedî dilekî pak û ne xwedî fitne û finas bû û ew xwedî kapasîteyeke herî ciwan ku ew bi kêrî xwe û çareserkirina bertekan were bû.

Hatina keçikê û pîrsa wê ya li ser pisîkê ew gelekî bextewar kiribû.

Keçika biçûk pirsî, “Ma ew pisîkeke baş e?”

Wî got, “Ew carinan baş e û carinan jî gelekî xerab e.”

Keçika biçûk pirsî, “Pisîka te kengî baş e?”

Zîlam got, “Gava ku ew mişkekî bigire.”

Keçika biçûk pirsî, “Ew kengî pisîkeke xerab e?”

Zîlam got, “Gava ku ew nagire.” Wî bêhna deryayê kişande nava xwe û xwe ciwan û dîlşad his kir.

Keçika biçûk jî xwe re li ser vê dûvdirêj ramiya, deh an yazdeh çirkan, gava ku

zîlam li benda pîrseke
din bû got,

“Mîouoow, mî-
ouoow.”

Keçîka biçûk pîrsî,
Ev pisîk çawa mişkan
digirin?”

Zîlam got, “Baş e,”
û berdewam kir, “Pê-
şiyê pisîk xwe vedi-
şêre. Piştîre mişk
derdikeve holê. Paşê
pisîk mişk digire û
oxir be ji mişk re.”

Keçîka biçûk dibêje, “Oxir be?”

Zîlam dibêje, “Oxir be.”

Zîlam dibêje, “Erê lê ma,” û didomîne,
“Pisîk mişk dixwe.”

Keçîk dipirse, “Ma ew diêşê?”

Zîlam dibêje, “Bi texmîna min helbet
mişk diêşê. Her çiqasî be jî, ew pisîkê naê-
şîne. Pisîk jî vê hez dike” û wî got, “Mî-
ouoow.”

Kurîkekî biçûk li ser patenan xwe dişe-
mitand û hat li cem keçîka biçûk sekinî.

Wî ji zîlamî pîrsî, “Ev tu çi çêdikî?”

Zîlamî got, “Ez peyarêkê tamîr dikim.”

Keçîka biçûk ji kurîkê biçûk re got, “Pisî-
keke wî ya mezin heye û ew mişkan digire.”

Kurîkê biçûk pîrsî, “Navê pisîkê çi ye?”

Zîlam got, “Tiger.”

Keçîka biçûk got, “Mîouoow.”

Zîlamî got, “Erê rast e, mîouoow, mî-
ouoow.”

Kurîkê biçûk got, “Mîouoow,”

Bê gotina peyvekê keçîka biçûk û kurîkê
biçûk bi hevdu re xwe li ser patenên xwe şe-
mitandin û gotin mîouoow û bi dûr ketin.

Kar li ber qedandinê bû. Wî devera biçûk
ku xerca nû lê valakiriye şahîk kir û rabû
ser xwe. Wî ber bi deryayê ve serê xwe rakir,



kêfa xwe ji bêhna
paqij û teze re anî.
Wî amûrên xwe
xist nava çewalekî
ji qumaşê stûr, bi
jor ve meşîya blok
li xwe bada û li
erebeya N siwar
bû û vegeyriya
nava bajêr. Gava
kurîkê biçûk û
keçîka biçûk ve-
geyriyabûn ew
çûbû. Ew bi hev
re li ser serê karê

bi xweşikahî hatibû kirin rawestîyan. Peya-
rêyeke bê deverên şikestî paqij û xweşik bû.

Keçîka biçûk got, “Wî ev çêkiriye. Zîlamê
xwediyê pisîkê.”

Kurîkê biçûk got, “Ev der hê jî nerm e.
Mîouoow,”

Wî qirşîkekî biçûk ji giya jêkir û bi qirşîkî
tîpên nav û paşnavên xwe li ser çîmentoya
nû qewart, D.R.

Wî ji keçîka biçûk pîrsî, “Paşnavê te çi
bû, Ella?”

Keçîka biçûk got, “Hagen.”

Kurîkê biçûk du tîpên din jî li ser çîmen-
toya ku hê nerm e qewart.

Tîpên wî li qurçîkekê û yên keçîka biçûk
jî li yeke din.

Wî bi rêkûpêkbûnekê tîp diqewartin.

Kurîkê biçûk ramiya ku ew gelekî kêfx-
weş bûye ku tîpên sernavê wî bi yên Hella
Hagenê re li ser çîmentoya teze ya peyarêkê
hatina qewartin. Piştî demeke kin wê çî-
mento ziwa bibe û tîpên sernavên wan heta
bi hetayê wê li ser peyarêkê bimînin. Ew ra-
miya ku ew tiştêkî nûwaze ye. Piştî demekê
ew dê mezin bibin û wê kolejê biqedînin û
ew ê here devereke dûr, belkî here New
Yorkê, an belkî here Ewropayê, û gava ew
vegeyriya û ji xwe re li kolanê li ser peyarêkê
meşîya û ji nişka ve li qorzikê sekinî û wî
weke her dem heta bi hetayê ew ê tîpên li ser

betonê bibîne. D. R., David Romig, ew bi xwe û E. H. Ella Hagen, keçika ku wî jê hez dikir.

Keçika biçûk got, “Ew zilamekî pir baş bû.”

Kurikê biçûk got, “Ez zanim.”

Wan bi hev re li ser patenên xwe li peyarêkê jî nû ve meyizandin.

Kurikê biçûk dîsa li nivê peyarêkê dest bi qewartina tiştêkî din î nû kir.

Wî tîpek tenê qewart, M û li keçika biçûk zivirî.

Wî got, “Gelo ev mîouoow çawa tê nivîsandin?”

Keçikê got, “Mîouoow? Ez nizanim. Ma ew peyvek e?”

Kurikê biçûk got, “Erê jixwe lê ma.”

Wî got, “Mîouoow” û wî hewl da ku gelo ev çawa were nivîsandin.

Lê dîsa jî wî nikaribû ew bitîpanda.

Wî jî keçika biçûk pirsî, “Ez çi binivîsim? Ez nikarim mîouoow bitîpînim, ma tu dikarî.”

Wî bi tilika xwe tîpa M şahîk û rast kir lê belê wê nespehî xuya dikir, loma wî biryar da ku tiştêkî xweşîktir li devereke din a baştir a peyarêka nû binivîse. Wî dixwest zilam bi pisîka wî re bi bîr bîne jî ber ku wî bi rastî jî dizanibû ev tiştêkî gelekî girîng e û keçika biçûk jî bi vê wisa dizanibû.

Wî peyvek qewart, pisîk û wî got, “Mîouoow.”

Keçika biçûk jî got, “Mîouoow” û her duyan xwe li ser patenên xwe şemitandin û dûr ketin.

JI we anxaneyê RONA H. jî bo zarokan
2 berhemên Samed BEHRENG.



Sembol di helbestên Osman Sebrî de

Siyamend BRAHÎM

Mamosteyê nemir li ser gelek mijar û babetên rengereng nivîsiye. Wergerandin, çîrok û helbest, ew di mêjûya dîroka ziman û wêjeya kurdî de xwedan nîşaneke bilind bû û navê xwe li nav nivîskarên Hawarê çespanî û wî bi xwe ji min re gotibû ez ne alîkarê Celadet Bedirxan bûm, ez hevparê Celadet bûm

Dewlemendiya jiyana Osman Sebrî çî di warê rêzanî, civakî an jî berzbûna wî ya herî balkêş di cihana rewşenbîriya kurdî de cihekî bilind girtiye. Dr. Nuredîn Zaza der mafê Osman Sebrî dibêje: Osman peyayekî zîrek û hingê bi kurmanciya axaftinê xweş dizanî, xwedan kurmanciyeke bilind bû û xweşik bi rengê berz û bilind bala Celadet Bedirxan kişand. Di hejmara yekemîn a HAWARE de gava mamoste Qedrî Can helbesta xwe ya pêşîn diyarî hevalê xwe Osman Sebrî kir û tê de jiyana xwe li welatê xwe, li nav bav, bira hestê xwe diyar dikir û digot:

*Jiyîn çiqas delal e
Di nêv bav biran da
Dil heye ko nenale
Ber birînên rîman da
Ev birîna rîman e
Barekî pir giran e
Kezeb gurçik nemanê*

Di hejmara 2'yan de mamoste Osman Sebrî, kete bax û gulzarên toreyê kurdî, bi pênûsa xwe ya tûj û bi dilê xwe yê nazenîn lê vegerand û got:

*Jiyan xweş e bi xurtî
Li Kurdistan bi kurdan
Bav û biran, çî bikim
Hemû min tê bi derdan
Min dil tu car nenalî*

Min zar tu car nekali

Bi dilhişkî bi lalî

Singa xwe da ber rîman

Tovê behreweriya mamoste Osman Sebrî li ser rûyê kovara Hawarê derket. Zeriye wî yê wêjeyî teqîyan, kaniyeke zelal asoya wêjeya kurdî bilind kir, wî di pêvajoya Hawarê de roleke xurt û bingeîn list,

Osman Sebrî di hemû beşên jiyana xwe de dasitaneke mezin bû, wek dara spîndarê tu caran bejna xwe ji kesî re netewand ew dibêje:

*Xwe danînim bo sîtem û zorê
divê serbilind ez herim gorê
Gava bi rûmet çûme goristan
hêjayê bibim lawê Kurdistan*

Mamosteyê nemir li ser gelek mijar û babetên rengereng nivîsiye. Wergerandin, çîrok û helbest, ew di mêjûya dîroka ziman û wêjeya kurdî de xwedan nîşaneke bilind bû û navê xwe li nav nivîskarên Hawarê çespanî û wî bi xwe ji min re gotibû ez ne alîkarê Celadet Bedirxan bûm, ez hevparê Celadet bûm, rojhilatnasê ewropî Tomas Bois di pirtûka xwe de (connaissance des kurd, Naskirina Kurdan) kêfa xwe gelekî ji Osman Sebrî û nivîsên wî re tîne, nemaze çîrokên wî yê li ser nêçîr û nêçîrvanan.

Mamoste Osman Sebrî di kovara Hawarê de 17 helbest û çîrok nivîsandîye û di kovar û rojnameyên kurdî yê wek Ronahî, Çiya,



Berbang,
Gelawêj,
Stêr, Dicle
û Ferat de
nivîsiye.

P i r a -
niya şê-
w e y ê
helbestên
O s m a n
Sebrî bi
rengê di-
b i s t a n a
s e m b o l î
hatine ris-
tin, ev
r e n g ê

hanê digihê dibistana frensî, ew xwedan endîşeyeke (xiyaleke) xurt bû, belê xwedan hesteke nazdar û balkêş e, mijar û pêveçûna mijara helbesta xwe xal bi xal pê diçe, helbest li cem wî yekîtiyeke tevahî ye, qut nabe. Ferhenga wî hêsan e, her wekî Aristo dibêje: Endîşekirin liveke encama hestê û wêneya têgihiştina hesteyî bi dirûvê xwe her wekî wêneyên endîşekirinê ye.

Ho Humayê pirr şîn! Tu yî xurt û mezin û bilind

*Digel me gunehkara zor dilovan û çak û rind
Xudayê min her lavakar im ji te bi navê te
Qet tiştêk nîn e ku bê veşartin ji ber çavê te
Tu afrandeyê hemî asîman û zemîn î*

Kirên me gunehkaran di şeva reş de dibînî

Ez xwe dispêrim xurtiya te, bazgûrî te me

Dema holê nekim şaş im, teqez dûrî te dibim

Tu min her ji bayê nefsê biparêzî, gurr nekî

Me nexî ser riya sitemkar û neqencan û hovan

Ji kir û gotênên ramanên paqij nekî zîvar

Nermî û aşî her bi navê te digihên dil

Di helbesta Osman Sebrî de helbestvan li paş sembolên cur be cur xwe vedişêre û ew formeke hêsan dinimîne, ku gelek helbestvan dikevinê yan ji ber tevlihevbûneke ne bi

rêk û pêk rist dikan an jî ew xurmandina bayê xurtiyê li cem wan dijwar e. Û bi dehan ji helbestên xwe li gor dibistana Frensî rist kiriye.

Nêrîkî kovî hilmiştî şeng

Di devşagekê diçêrî bêdeng

Hate wî pêjna zirrîna kerê

Dengekî werî pîs nedîbû berê

Serê xwe hilda ka kî dizire

Hew dît kerê reş dike qoreqor

Dema biçûk bûm diket guhê min ji devê bav û kalan

Çêl û pesna şêr şahê dirrendan bi dem û salan

Saw û suhna wî, rew û hêlên wî, nav û dengê wî

Dilê min dagirt hezkirinek xurt kesm û rengê wî

Belê sembol li cem Osman Sebrî daçe-keke hunerî her bi awayekî xurt dihûne. Axaftineke bi hostayî ji diyarkirina wêneya helbestî û afirandin û dahênana hunerî siyeke balkêş li ser rûyê helbesta xwe radi-xîne.

Raza me li ber dergehê meyxanê naçim sermestî û bê heş

Mîna keseyê sundxarî paresteyê xaç im wergirtî cilê reş

Min xaç û pûtên xwe wekî Îbrahîm şikan-din ez bûm bi serê xwe.

Ew di helbesta xwe de radihêje bobelatên gelê kurd, derdên wan, nexweşiyên wan ên ku di her warî di cihê xwe di canê kurdan de girtine. Û bi gelek dirûvên axaftinê helbesta xwe rist dike. Belê sembol rêçeke her bingeîn e ji bo nêzîkbûna kesên ji civata kurd. Lê carna dikeve tevliheviyeke di cî de, alavên wê yên axaftinê dadikeve. Lê xuya ye ev rengê hanê ji ristina helbestî hezkirineke xurt li cem wî, di can û wijdanê wî de hatiye afrandin. Bandoreke xurt di bingeha derûniya wî de saz kiriye, nemaze hîn ji ferhenga wî ya gunditîyê, ew bêje û gotinên gundiyan

di xeyala wî de cihê xwe bi xurtî çap kirine,
em vî dirûvê hanê ji axaftinê bi xurtî di pi-
raniya helbestên wî de xuya dikin.

Serê şêr,

Hate bîra min ev çîroka han

bûye meselok di nava kurdan

kûzê ji axê nagre ava zêr

cendekê pisîk navê serê şêr

eva ye çîroka her wekî zanim

mîrekî kurdan xwedî nav û deng

bi xwedî fikir şêrekî çeleng

li ber dilê mîr gelek xoşewîst

hezkirinek welê hê kes nebihîst

Kûçikê Bekiran, Şûrê Elo, Hêviya Kalmêr,
ev çîrokên wî gelekî di kevçika dilê kurdan
de ne, rastiya gelê kurd in, wekî wênekêşekî
hosta, nexweşiyê xuya dike û derman salix
dide. Wêneyên zordestiya dijmin û bindes-
tiya gelê kurd xweşik dixivîne.

Di hin helbestên Osman Sebrî de dasîta-
nên kurdan ekameke xurt li seqa helbesta
wî heye. Nemaze "Qulingo" ya ku Evdalê
Zeynikê rist kiriye.

Lê Osman Sebrî di vê helbestê de gelek
doz, mijarên têvel, nexweşiya kurdan, qel-
siya kesayetiya wan, gewhera doza wan,
hevnegirtina wan, rewşa wan a kambax,
keysbaziya dewlemendên kurdan, reva ji xe-
batê, hemû raxistiye. Lê di dawiyê de riya
xebata gelê kurd xweş diyar dike.

Kesên şêr rabûne ser piyan û berê xwe
dane doza welatê xwe dibêje:

Sembola quling di berzbûna wî ya asî-
manî de, tevgera wî, derdê wî, koçên wî yên
demsalî nîşan dide.

*Ho qulingo ku de diçî berve Bakur kil dibî
her*

*Ta rana ustiyê xwe, pêl bûn ji te bazik û
perr*

*Ji bo çî zû te berdan berî dema ew germi-
yan*

*Qey diçî nava welêt, zozanên kurd serê
çîyan*

De fermo venişe tu pêlekî em bipeyvin

Osman Sebrî bendewariyeke mezin da
doza gelê xwe û komeleya xwe, ew ket cî-
hana welatê xwe navçe û herêmên wî. Lê ya
herî balkêş hezkirina wî ya ji Çiyayê Agiriyê
ye, ew dibêje;


Ho çiyayê pîrr qenc û rind

Bi şax û qûntarên xwe

Teqez wê navê vî lehengê mêrxas, mirovê
welatê wî, zimanê wî, gelê wî tu car ji bîra
wî, bi qasî bihnekê ji bal, wijdan û dilê wî bi
dûr neket, dêwê çiya, siwarê xebat û xameya
pîroz, xwedan navê rêzdar û birûmet, xwe-
dan hesta herî nazdar û pêtdar bi rastirîn
gotina dawîya jiyana xwe rist dike û dibêje;

Dawî va westîm bûm kalemêr

Zindan ji bo min wek rikeha şêr



Bi rêhevalî dilxwaz in

Sîpan XIZAN

Li ser erdnîgariya welat
Keç û law her dîkin xebat
Bi serbestî bînin jîyan
Bi demokrasiya serbixwe

Demokrasi bi destên wan
Ew keç û lawên Kurdistan
Lew ji bo wî tevgera wan
Bo demokrasiya serbixwe

Mafê ji bo keç û lawan
Lew ew in xwediyên Kurdistan
Jîyanek serbest û azad
Bi demokrasiya serbixwe

Ew dem ji bo wan şahîb e
Pêşeroja wan ronî be
Lewre bo wan bendewar e
Demokrasiya serbixwe

Bo ciwanan del deyndar e
Lewre her dem spasdar e
Serkeftin armanca wan e
Bi demokrasiya serbixwe

Bi tevgera keç û lawan
Cefakarên best û çîyan
Fedakarî bikin rizgar
Ew demokrasiya serbixwe

Bi tevgera xwe şanaz in
Lewra her dem awaz in
Bi rêhevalî dilxwaz in
Bo demokrasiya serbixwe

Keç û lawên herî dalyan
Şêr û pilingên Kurdistan
Zanyar heyran in ji bo wan
Bo demokrasiya serbixwe

Demokrasiyê bi kar bînin
Serbestiyê lê vejînin
Digel wan daxwaza Sîpan
Bo demokrasiya serbixwe

Dosye: Feqiyê Teyran



Amadekar:
Elixan LORAN

Ey av û av
Berken BEREH

Dilê Feqî
Feratê DENGIZÎ

Feqî xwezanîn paşxane
Serwet DENİZ

Mîr Mih û Mîm û Hê
Seîd DÊREŞÎ

Şopên Feqiyê Teyran
Mîrza RONÎ

Warê Feqiyê Teyran;
Muks û Werezoz
M. Xalid SADINÎ

Di avabûna wêjeyan de carna kesên wisa radibin, ev kesên hanê mohra xwe li sedsal û serdeman dixin. Di wêjeya kurdî de yek ji van kesan jî Feqiyê Teyran e. Feqiyê Teyran di berhemên xwe de zimanekî ku gel jê fehm dike bi kar tîne, peyva xwe ji tu kesî teqşîr nake, ji ber tu kesî danaxwe, ya dilê xwe dibêje û dirêse. Dilbereke wî heye, vê dilberê kiriye ku Feqî

sewdaser û terkese bibe. Qêrîna dilberê heta vê çaxa milenyûmê jî hatiye.

Dema mirov li helbestên Feqî dinêre, mirov beriya her tiştî rastî hestên mirovbûnê tê. Geh devê wî xerabe ye (*Jixwe bûka mala Şêx Evdila ye / Xelkê jî di kunê gaye / Ew jî hatiye bela xwe / Li Feqiyê Teyran daye*), geh Xwedênenas e (*Ne diçim dêra ne mizgefta*), geh şîretbêj e, geh evîndarekî serxweş e, geh tik û tenê ye. Gelek aliyên Feqiyê Teyran hene ku mirov dikare xwendinên mîkro li ser wan bike.

Di jiyan û berhemên hemû wêjevanên klasîk de angaş û guman hene. Mixabin di jiyan û berhemên Feqiyê Teyran de jî angaşên wisa hene. Em jî wekî Kovara W cih didin hemû fikr û angaştan da ku li ser wan nîqaş werin kirin û hinek agahî eşkere bibin.

Di dosyayê de Berken Bereh li ser sembolên di helbestên Feqiyê Teyran de derbas dibin analîzek kiriye. Feratê Dengizî li ser naveroka helbestên Feqiyê Teyran nivîseke hêja nivîsiye. Serwet Denîz jî ser têgehên xwezanîn û paşxaneyê li ser helbest û helwestên Feqiyê Teyran xwendineke cihê pêşkêşî me dike. Seîd Dêreşî li ser "Mîr Mih" û "Mîm û 'Hê" lêkolînekê pêşkêşî me dike. Mîrza Ronî û M. Xalid Sadînî di sa bi dû şopa Feqiyê Teyran û warê Feqiyê Teyran ketine.

Ey av û av

Berken BEREH

Em di helbesta wî ya bi navê “dilo rabe” de rastî navên gelek zanist û feylesofên mîna Sokrat û Platon tîn. Ev jî bi me dide zanîn ku Feqî xwendayekî hêja bû

Bê guman yek ji gewretirîn helbestvanên me yên klasîk Feqiyê Teyran e. Lewre Feqî di nîrekî zor dijar de jiyaye û di berhemên xwe de digel helbestvanî û afirîneriya xwe felsefeyê xurt jî afirandiye. Di helbestên wî de em rastî gelek fikr û ramanên der barê çêbûna dinyayê û hemû heyberên li ser erdê dijîn tîn.

Sokrat di vê derbarê de behsa çar hîmên bingehîn dike; av, ax, agir û hewa, Feqî jî di nivîse;

Zahir kirin “çar bakir”e

Ba û av û ax û agir e

Dar û heywan jê çêkire

Dar û nebata kiswetê”

Li ser bûyer û qewimînên hiziriye û xwestiye bi guherîn û veguherîna van tiştan bigihîje encamê ku ev felsefe bo dahatûya insanan bibe zanîneke hêja û di her tarî û tengasiyê de pêşiya wan ronî bike, ango bi kurtasî jî bo mirovahiye bingeha kêfxweşî, bextewarî û jiyaneke bi rûmet ava bike. Ji ber ku Feqî mirovekî jixwebawer, zana û fêhmker bûye, beriya her tiştî xwe mamosteyekî ditiye û li gor wê berhemên xwe nivîsiye;

Ew. “Mîm û Hê”qelb û mitalan

Her bi wan fikr û xiyalan

Rast dikit pend û misalan

Şairê nesîhetê

Em di helbesta wî ya bi navê “dilo rabe” de rastî navên gelek zanist û feylesofên mîna Sokrat û Platon tîn. Ev jî bi me dide zanîn ku Feqî xwendayekî hêja bû. Felsefe xwendiyê û li ser felsefeyê kar û xebat kiriye. Ewî

jî mîna Sokrates girîngiyeke mezin daye ruhê însên û her tiştê hêja û çê û her wiha selameti û kemilandina civakê jî encax bi ruhekî paqij û bi fikr û ramanê kemilî dikare pêk were. Lewre ewî jî mîna Platon di felsefeyê de idea (raman, fikir) bingehîn didît. Feylesofên ola îslamê Farabî û Îbnî Sîna jî dabûn pey şopa Platon û şagirtê wî Arîsto. Bo van sedeman divê ehlaqekî kamil li ba civakê hebe da pergala jî li gor wê ji bo civakê bibe pergaleke bextewariyê. Her çiqas em di vê felsefeyê de li gor îro rastî gelek kêmasiyan werin jî dema em dem û qonaxa jiyayê didine ber hev em dibînin ku gewretirîn rewşenbîr û feylesofê dema xwe ye. Yekemîn car Feqî rahiştiye pênuşê bi riya helbestê dahûrandin û dahanîneke li ser dunyayê û diyalektikê nivîsiye. Di helbesta “Ey av û av” û “Dilo rabe” de em rastî gelek remz û sembolan tîn ku Feqî xwestiye şiroveyekê li ser bûyer û qewimînên dunyayê bike û bigihîje encamê. Di van helbestan de angaştê wî ya herî bi wate guherîn û veguherîna dinya û civakê û yekîtiya dijberiyên e;

Çar teb’etî vêkra zidin

Hem ateş in hem barid in

Di behra heyûla di warid in

Macûs bi vê wechîyetê”

Lê ji ber ku di wê demê de li Ewropayê jî hê nû dest bi ronesansê hatibû kirin û kesên mîna Hegel, Kant, Marks hwd. nehatibûn dinyayê ewî jî bivê nevē vê diyardeya veguherînê bi awayekî metafîzîkî vegotiyê û gihîştîye wê angaştê ku her tişt di dawiyê de bi îzna Xwedê tevdiqere û di liv û livbaziye de ye.

Feqî gelek qîmet dida aqil û li gor felse-

feya wî aqil, dikare bi saya raman û fikr û hêza sehekan bigihîje encamekê. Ev angaşt tam jî pişta xwe dide Aristo. Lê li gor wî aqil tenê bes bû;

Xelkê Xwedê aqil kirî

Hemî arif û kamil kirî

Nûrek di dilda hilkirî

Eslê qisan rî dibetê

Di babetê ehlaq de jî dîsa xwe dispêre wî;

Ava mezin fîrfîr meke

Zîkrê bike fexrê meke

Ehlê Xwedê aciz meke

Bes bide min eziyetê

“heta heyin em mailîn

hişyar bibin ey xafilîn

em jî heyatê dest hilîn

jî we’deya emanetê” (sofîst)

“Felek çerxe û dewran e

Mîsalê mewcê behran e

Me’aşê ehlê şeytan e

Dinê dewr û dewware”

Bi gor şopgerên Sokrat erdem di ser her tiştî re ye û divê însan heta dawîya jiyana xwe bo kamilbûnê bijî û dev jî vê dinyaya derewîn berde û taetê bike.

Li ser pergala û desthilatdariya civakê feylesofên wê demê û berî wî bêhtirîn mîna Platon difikirîn an jî xwe dispartin Aristo ku wan digotin ku kesên xwedî desthilatdariyê ne ku xwedî ehlaqekî baş û kamil bin dê tu pîrsgirêk hem jî desthilatdariya wan re hem jî di civakê de çênebe. Heta tu mafê zarok û jinê tune bû û wan feylesofan jî ev rewş wek tiştêkî sirûştî qebûl dikirin. Lê Feqî jî vê felsefeyê dûr e û doz û daxwaza pergaleke wisa dike ku li wir ne mîr ne beg û ne jî kole û jar hebin. Ma îro jî em ne li pey pergaleke wiha ne da jiyana bi nirx û rûmet bibe.

Dema em bala xwe bidinê parzemîna Ewropayê ya wê demê em ê baş bibînin ku li seranserî Ewropayê rewşeke malxerab û zordarî û stemkariyeke ecêb heye li ser civakê. Bandora ola xiristîyanî wisa xurt e ku hemû keşe û pêşengên olî wek nîrekî li ser pişta civakê forta davêjin. Dadgehên engizîsyonê tenê bi me dide zanîn bê ka civak di bin sitemkarî û zordariyeke çiqas dijwarde ye. De îcar li hişmendi û ramana Feqî binihêrin ku çiqasî rewşenbîrekî hêja û mîrxas e.

Lê Fêqî di helbestên xwe yên bi navê “Dengbêjê Jaranî, Mihacir, Dewran, Ê bîn.” de teoriya ku wê di pêşerojê de bê selmandin ku jiyan her bi ber û pêş diçe û di navbera dewr û qonaxên mirovatîyê de têkiliyeke xurt heye û her qonax li ser rûxandina qonaxekê ava dibe. Dîsa di hemû helbestên wî de em rastî tespîtekê tên ku ew jî di felsefeyê de jê re tê gotin “yekîtiya dijberîyan”

Cemal Sureya gotiye “helbest dijberî hemû makezagonan e” Arîf Damar jî “helbestvan ne tenê şahidê dewra xwe ye her wiha suçdarekî wê ye jî. Lewre her helbestvan bivê nevê di nava civakê de dijî ango bi rabûn û rûniştina xwe, bi têkiliyên civat û xwezayê xwedî bîr, bawerî û helwestekê ye. Dema em li gor vê li berhemên Feqî binihêrin ev rastî wek ronîya rojê di ristên wî de dixuyê. Ew di gelek helbestên xwe de helwest û bertekiya xwe ya li hember mîr û began êşkere dike û her wiha bi baweriyeke xurt dibêje ku ev pergal dê wiha nedome.

“Ez dengbêj im hatim vira

heta hebin dengê mîra

ez ê binivîsim ser kaxeta

ne diçim dêra ne mizgefta”

dîsa

“lê ez diçim xortên cahil

hez bikin gerek e şer bikin timê

hez bikin hûn jî jin zaro ahil

pêşîya mîra pêşîya zilmê”.

“wê bên dewranê kibîr
namînîn hakim û mîr
lazim ê hingê benda tivdîr”

Di sazîkirin û honandina helbesta xwe de Feqî jî qesîdeyê ta helbesta ku em îro jê re dibêjin helbesta nûjen her cure û teşe ceribandîye. Lê bi piranî helbestên xwe bi awayekî çarînî û kafiye (kêşeyî) nivîsandîye. Sedema vê jî bi ya min ewî dixwest bi hêsanî bêne xwendin û jiberkirin.

Ger em bên ser naveroka helbestan di helbesta “ey av û av” de ewî bi awayekî ji awayan helbesta xwe mecazî û bi remz û sembolan nivîsiye ku îro em jê re dibêjin helbesta mirov zû tînegihîje. Di helbesta xwe de “yan şubhetê qelbê me yî” yekemîn car helbestvanekî kurd, bûyer û qewimînan dişibîne uzvên însanan.

Ziman di helbesta Feqî de zimanekî şayik, afirîner û wêjeyî ye her çiqas peyv û biwêj û qalibên bi kar anîne jî aliyê civatê ve bên naskirin û yên rojane bin jî di wate û barê ku hilgirtine ser xwe de tiştekî din in. Ango her peyv ne ew peyvên di jiyana rojane de em bi kar tînin in. Tiştekî din in, bi sêr û efsûn in. Jixwe bo hêmayeke watedar û xwedî bandor divê her peyv jî nû ve bê afirandin û kirasekî din jê re were fesilandin. Da ku bikaribe xwe bigihîne asta hêmayeke ronak û bi efsûn. Li gor vê angaşte dema em xwe bera nav afirînerî û hostatiya Feqî didin bi hêsanî em rastî vê efsûnê tînin. Remz û sembolen ku Feqî bi kar anîne her yek jî wan gihîştine qonaxêke wilo ku di hiş, mêjî û jêrhişîna me de panorama û asoyeke din dinexşînin.

Minak av ne ew alav û heybera ku em her roj pê dest û serê xwe dişon an xwarina xwe çêdikin e. Av di helbesta Feqî de remz û simbola civakê ye bi ya min. Peyva kaxetê jî ne ew wateya ku pelê ku li ser tî nivîsîn e, lê li wateya çarenûsa insan hatiye barkirin. Eşq bi du awayan hatiye bikaranîn yek li wateya eşqa Xwedê dudu ya dilberê lê gelek caran tî xuya ye ku eşqa Feqî ne eşqeke in-

sanî ye ew eşqeke Platonîk e. Ango ewî jî yeke wilo hez kiriye ku hê ne bejn û bala wê ditiye û ne jî navê wê bihistiye. Eşqa wî eşqeke tesewifi ye;

Muptela qametfena me

Ji yar û dostan cuda me

Aşiqê nûra xewda me

Kes bi halê min nezan (husna te’lîl-pîşeyê rindkirinê)

Di hemû helbestvanên tesewifê yên wê dewrê de di her pesindana evîn û evîndara xwe de bi remz û sembolen ku dijî jiyane ne, hatine pesindan. Wek mijang û birûyên tîr û kevan-çavxezal hwd. bêhtirîn ev remz û simbol di helbestên kesên xwe li ser gel û dûrî jiyana wan ditine nivîsandine. Lê Feqî bi van sembolan re peyvên mîna mey, bade, şerabqedeh, serxoş, tule, se bi kar anîne ku di jiyana rojane de bêhtirîn gel ew bi kar anîne nivîsiye. Ji vir jî dixuyê ku Feqî bêhtirîn girêdayî jiyane ye û berhemên wî realist in.

Ev eşq hema bibêje li gelek helbestvanan tî. Lewre helbestvan li pey jiyaneke wisa ye ku hê nehatiye jiyîn. Ango li pey dahatûyekê ye. Jixwe dema helbestvan jî jiyana xwe razî bû afirîneriya wî diqede, tiştekî ku bibêje wê nemîne. Bêhtirîn jî helbestvanên rastgo û civakparêz tim bi vî awayî tevdişînin û helbestan dirêşin. Ger tiştên dixwazin pêk werin jî dê dîsa tiştekî din bikin bahane ku rexneyê lê bikin. Feqî jî yek jî wan kesan bûye ku bi pey mukemeliyetê ketiye. Ev cure helbest û poetîka heta sedsala 19’în jî dom kiriye li welatên cuda.

Di helbestên jî bo civakê û li hember pergala wê demê hatine nivîsîn de teşe û şewaza wan jî cuda ye. Dengbêjê Jaran î, Mihacir, Dewran, Ê Bê, di van helbestan de her beşek sê rist in an jî her beşek jî ya din cudatir e hem jî aliyê ristan û hem jî jî aliyê kêşeyî û rîtma xwe ve. Ziman zimanekî herikbar û gelek sade ye. Rist kurt in. Mebest jî vê vegotinê ew e ku kesê bixwîne zû tîbigihîje û bikaribe jî ber

bike. Heta wan mîna stranan bibêje. Di van helbestan de hêvî û daxwazeke xurt heye. Baweriyêke xurt heye.

Ev helbest nişanî me didin bê ka Feqî çiqasî rewşenbîr, siyasetmedar û têkoşerekî jêhatî ye. Bi rastî di wî nîrê dijwar û zor de kêmkî kes dikarin bi helwesteke bi wî rengî rabin û rûnên.

BABET;

Feqî di helbestên xwe de li ser gelek babetan nivîsiye; eşq, evîn, tebiet, felsefe, exlaq, dîrok hwd.

Feqî di helbestên xwe de gelek cureyên pişekariya wêjeyî Husna Te'lîl, Wahdetil wucud, şibandin, nimandin, danberhevkirin, şayesandin, telmîh bi kar aniye. Di bikaranîna hunera wêjeyî de pir jêhatî bûye;

Xwezî min sed ser hebana

Sed hezar dev pê ve bana

Ew hemû l'methê te bana

Hêj bi wan noqsan im ez. (mubalaxa-pirandin)

Ez kiz û zer bûm ji qehrê

Dê devek çî bikî ji behrê

Yan du çav bikin ji sehrê

Li dîtina eynan im ez- (teşbîh-mînanandin)

Ew meyê gerden dirêjan

Şîşe û wan baderêjan

Min nema hiş li nîmêjan

Li deftera dînan im ez (şibandin)

"vê illetê beyan bike

tu vê sirê penhan bike

carek li min e'yan bike

da seh bikin hikayetê" (telmîh-bibîrxistin)

TEŞE;

Feqî li gor naverok û babetê teşeyekî cuda bi kar aniye. Di helbestên eşq û evînê de teşeya klasîk ango mîna hevçerxên xwe, lê di helbestên civakî de teşe diguhere û ceribandineke nû ye (sê rist). Ziman jî her wiha bi gor teşe û babetê diguhere yên jî bo civakê sade ne. Ew carna bi awayekî çîrokî, dastanî nivîsîne.

Helbestên F. Teyran bi piranî jî çarînan, şeşînan pêk hatine û kêşeyî ne. Bi piranî kafiye ya wan kafiye ya dewlemend e. Her çarînek bi ya du xwe tê, bi rîsta tê dubarekirin ve tê girêdan. Ev hem rîtm û melodiya helbestê didomîne û hem jî jî aliyê xwendevan ve dibe hêsaniyêke xwendinê. Her wiha ev cure teşe bo dengbêjan jî hêsaniyêkê çêdike da ku bikaribin helbestan bikin stran û bistrên. Di helbestên şeşînan de balkêşiyek heye rîstên kit (yekane) yek kafiye û yên cot jî yek kafiye ne. Wezna wan bêhtirîn li ser heşt kîteyî saz bûye. Wekî din qesîde jî nivîsandine. Her wiha hinek helbestên wî bi sê rîstan in ango ne çarînan in. Wekî din helbesteke wî ya bi navê Hawar Sînem heye ku naşibe yên din. Li gor rîtm û awaza kilama hatiye honandin û mîna-keke baş e bo helbesta me ya nûjen.

Berhemên Feqiyê Teyran;

*Bersîsê Abid

*Kela Dimdimê

*Qewlê Hespê Reş

*Şêxê Sen'an

Dilê Feqî

Feratê DENGIZÎ

Mirov dikare bibêje Melayê Cizirî nûnerê Wêjeya Dîwanî, Feqî jî yê Wêjeya Gelêrî û Ehmedê Xanî jî senteza wan e, her du şax; wêjeya dîwanî û ya gelêrî bi hev re hûnandiyê

Her çiqas ez dibêjim dilê Feqî; ya rast ez dixwazim cihana wî, dinyaya wî, şewra wî, bi qasî ku taqeta min hebe, bînim ziman. Ku mirov bibêje “Dilê Feqî” mijar kêr dimîne. Ku mirov bibêje cihana wî, ev jî angaşteke (îdiayek) mezin e. Lewre dinyaya Feqî, yanî warê ku raman û dilê wî, dilîniya wî tê de dijî, zehf fireh e. Deryayeke bêserî û bêbinî ye! Tu hêz nikare vê binexşîne û deyne ber çavan. Lewre mirovan têra wî nedikirin, îcar siruşt tev di dil û mejiyê xwe de hewand. Bêtir jî bû dostê teyr û tilûran. Tawilê ku mirov vê ya ji bîr bike. Bê heq nebûye Feqiyê Teyran...

Lê ez dixwazim çend dilopên vê deryayê şirove bikim. Hest û ramanên ku bi min dide jiyan par ve bikim.

Ez dixwazim deriyê vê gencîneyê vekim. Û tiştên ku biriqîna wan ez mest kirime, ji ser xwe birime bînim ziman. Feqî, yan jî warê ku ew tê de dijî; him jî aliyê jiyanî û him jî ji aliyê hestewarî, timî, di her demsalê de, berbanga biharê ye, sibehên biharê... Ew berbanga ku dilan serxweş dike, wateyê dibarîne mîna haviyê, mîna şebnema ser sorgulan, ser hêşînayî û binefşan... Sewda, evîn, dildarî di dilê mirov de dibe kevok, dipirpir e, nahewe, dixwaze qefesê bişikêne. Her tiştî û warê jiyanê bi mirov re şêrîn dike. Tew ew bêhnxweşiya şefeqê, bêhna bihuştê zehra; nayê gotin... Ku ji lêvên wî;

Ey dilberê gerdên zerî,

Way nazika dêm qemerî,

Qamet ji mûma fenerî,

Wêran ezim, malam xerab. (Dilber)

Difire, evîn di dilan de difûre, çiqas mirov

hov û dilhişk be jî...Tew hosteyî, hozanî li aliyê dinê. Hosteyê peyvî û hosteyê rêsan-dinê... Lewra ew bilbil e, ew şalûl e, ew kewê ribat î bi qebeqeb e... Bes, dilopên gewherê ne ev tenê ne.

Bi helbestên dilîni tê nasîn, lê bi rastî ew, ne ev tenê ye. Evîndar e, li hember zilmê serhildêr e, hosteyê peyvî û hosteyê rêsan-dinê ye... Bi peyvî qesran lêdike. Bi dorê, ez dixwazim van sê xalan şirove bikim.

1) Pêşiyê, evîndar e, Feqî... Evîndarê hebûnê ye; yê mirovan, ê candaran û yê xwezayê. Mîna her mirovzadeyî, wî jî evîna xwe di xweşikahî, spehîti û gewrehiya dilberê de bi lêv kiriye. Lewra ew neviyê Hori (hûrî) yan e. Horiyên ku xweşikiya dilberên wan di cihanê de bi nav û deng bû. Ev xweşikahiya xewrevînên evîndar û bengînan. Ne bes e, xwedza dan alim, feylesof, keya û pêxemberan, bûn pîroziya hebûna mirov, bûn zerî, bûn horî, hûrî... Hûriyên jiyan û axretê... Jixwe ev evîni ne ya bedenê tenê bû, ya Xwedayî, derûnî û hebûnî bû jî... Lê bi lihevhatin û rasteqînê, di keys û fesala dilberê de nexş dibû. Bê heq helbestên wî ne bi navê ‘dilberê’ bûn, ku hestên wî yên xweşmirovî gihan heta vê demê û dê heta herhebûnê bijîn. Mirov ‘dîl’ê ‘ber’ wê ye, ‘dîl’ê ‘berê’ wê ye, bend û koleyê bejnziraviya wê ya siruştî ye. Dilber, dilê wê li ber wê ye, aşîkar e û xweşkêş e. Mirovê ku dil û mejiyê wî heye, nikare jê bi dûr keve. Lewra ew bingeş û pîroziya hebûnê ye. ‘Şêx’an ji ola wan bi dûr dixwe. Mislimanan dike fileh, filehan dike êzîdî, dike dîn û berdide dinyayê. Û elhasil, bi her awayî mirov dike insan, dike xwedî rûmet. Tu bi çi olî û bi çi zimanî bi lêv bikî ferq nake.

Gotina kin, em peyvê radestî xwediye wê bikin. Lewra evîndar ew e. Bila evîna xwe bi-bêje, vebêje, mîna bilûra dîlşewat. Bila ce-geran bisote.

Way dîlbera dêm bi şemal,

Bo te digirim war bi war,

Her bo te bûm xirabmal.

.....

Qewî îro min ced kiriye,

Dirhem li xelqê zef kiriye,

Sêsed şêst beyt hazir kiriye,

Li nav xelqê belav kiriye,

Havekî rind li xwe kiriye. (Dîlber)

Zimanê wî û gotina wî ewqasî zelal e ku, salên di navbera me de wînda dibin, sînor radibin. Mîna Mem bangî Zînê dike; geh Yûnis Emre ye, geh jî Siyabendê kilê çavê Xecê... Bi piranî jî Cembeliyê evîndarê Bînefşê ye. Lê Mecnûnî, Ferhatî, Keremî qet jê ne dîr e. Kurd e, lê dilê her kesî ye, dilê her gelî ye. Bila kilama xwe ya li ser dîlberê qut meke, lewra mirov jî sewta wî têr nabe.

Ey dîlberê, way dîlberê,

Feryad ji destê k' eserê,

Avik ji ava kewserê,

Wêran ez im, malim xerab.

Ey dîlberê gerden zirav,

Dêma şûşeyê, t'ijî gulav,

Êy duxtorê bejna zirav,

Wêran ez im, malim xirab.

Sibhan ji şahê bi t'enê,

Xalik li xala gerdenê,

Ez dîn kirim berdama dinê,

Wêran ez im, malim xerab.

Eşqa merac p'eyda bûye,

Îro li min dijvar bûye,

Hivî dikim heqîqî ye,

Wêran ez im, malim xerab. (Dîlber)

Ma kaniya hebûnê diqede? Evîna dilê wî kaniya jiyanê ye, her diherike.

Nero dilo, dilê bazî,

Çi ji halê min dixwazî,

Bes e bikî hewar û gazî,

Te ez kirme belengazî.

Îro siveke ji her sivan e,

Ez xiyala dil da me,

Nizanim, şerqê hatme Şamê

.....

Bes e bike şîn û girî,

Hesab bite-qet ne li vir î,

Çi ra ji evna zor digirî,

Birîna dilê min sax û silî,

Ji kezevê da dixilî,

Her dil bike şîn û girî.

.....

Şerbeta lewz û k'laman,

Da dest xas û aman,

Dilê min însanê bê ziman,

Li min dike hewar û ferman.

Bû payîz li van deran,

Xezan zer bûn serê daran,

Sefa nabe li wan deran.

Dilo çima tu ha xwar î,

Tu ji min re bê îtbar î,

Gelo heye însanê ne mirî. (Feqiyê Teyran û Evîna Dîla)

Wek di rêza dawîn de jî eşkere dike ku ew, ne tenê bengîn e, lê ramankûr e jî... Feylesof e, feylesofê hebûnê, yê jiyanê... Feylesofê gel e; ne mehkûm û bêçare û qure û bêhêviyê qesr û qonaxan e...

2) Li hember zilmê serhildêr e. Hejar e, xizan e, alîkarê bindestan e Feqî. Mirov dikare bibêje şoreşgerê dema xwe ye. Şûrkêşê çînê ye, peyva wî şûrê tazî yê feqîran an jî yên ku keda wan tê xwarin e. Li ser tovê Baba Tahirê Uryanê ku li hember kedxwariyê û mijokdariyê ye, li hember xwînmijan e, şîn hatiye. Ew Baba Tahirê ku bi qîrînî dibêje; “Ku destê min bighê / Çerxa felekê, / Ez dê bêjimê: / Pir şerm e ev karê te, / Tu sed texlît nîmet / Didî hinan... / Hin nanê ceh / bi dest naxînin, / Ji bo xwarinê!..” Kesera Pir Siltan Evdal e. Bi her hozanê ku êşa gelan kişandiye re rêheval e. Hêza Babek e, li hember zilma serdest û biyanîyan... Tu dibêjî qey ew e yê li Bînboxayan Dadaloxlî, yan jî axîna dilê Aşiq Mahzûnî... Demara mirovahiye ya kevn î ku bi ber îro ve tê û ber bi bédawîtiyê ve dihere ye. Ka em peyvê qut bikin bila ew bibêje, bila ew biqaqe li hember neyaran. Lewra ew dengbêjê jaran e:

*Dijminê mîrê deca lîm,
Mehmûd Feqiyê Teyran im,
Bira Xudê şihedê me be,
Biçûk ê bêjî rihme te be. (Dengbêjê Jaran î)*

*Ez dengbêj im hatim vira,
Heta hebin dengê mîra,
Ez ê binivîsim ser kaxeta,
Ne diçim dêra ne mizgefta. (Mihacir)*

Peyvên wî tu dibêjî qey rewşa îro dilêvîn e; an jî derdê her demê ye.

*Şuxulê zor destê mîra,
Xirabe halê me feqîra,
Kes guh nade jar, sefîla,*

*Jar, sefîlê em dibêjin,
Derd, kula tev dirêjin,
Destê qûltiyê qere-gêjin,*

*Wê bên dewranê serobin,
Tovê bide ser serê min,
Heye wehde dirêj û kin. (Dewran)*

Hêviya wî jî xurt e. Hêvidar û xweşbîn e, ji bo jiyanê xweş û bê kedxwarî, bi mirovahiye ewle ye. Wek ku van rojan bibîne ye. Ev, ji helbesta wî ya jêrê diyar e:

*Ê BÊN
Ê bên rojek rojê amindar,
Ê hişyar bin sêfil û jar,
Ê qalkin pêşiya mîrê xedar,
Ê textê wan bikin wêran.*

*Hûn bizanbin mîrê xedar!
Ez ê ji dinê herim yekcar,
Lê ew beytê min ê zêrîn,
Ji dev û lêva nayêne birîn.
Ew ê bikin gujîn û şingîn,
Çawa birûska erşê ezmîn,
Li erda çawa şûrê hêşîn,
Wê dilê we bikin birîn.*

(Tembûr, Zûrich / Schweiz)

3) Hostê peyvan e, Feqî... Hunera wî pir cuda ye. Dema ku peyvê, wateyê û hestê dirêse; dil û mêjiyê mirov ronî dike, têr dike, geş dike. Mîna hosteyê Medî ku li navsera Zaxrosan qesran lêke û her kevirekî mîna gulistana dilan binexişîne. Mîna ku kevirê eqdan bihûne. Tu dibê qey li mêrga dila rûniştiye, evînê mîna rêsiyan dirêse ji jiyana kurdewar. An dildarê diloan e; rûniştiye li cem yarê keziyên wê dihûne. Yan jî mîna dayika dilkovan jê re dilorîne, distirê, kilamên hêviyê, yên evînê, yên dilê şewitî yên bêmi-

rad, lê bihêvî dibêje û serê xwe ditewîne, di-kewîne. Bi vê hûnandinê hûrî dibe zerî, dibe zeriya porzer dibe zeriya zagrosan a gûtiyan a hûriyan û dilan disotine.

Wek ku tê zanîn di wêjeya gelêrî de, dema helbest bi çarînan tê hûnandin; her rêz bikêşe ye, rêz-benda wê, kêşa wê heye. Rêzbenda yan: a-b-a-b ye, yan a-a-a-b ye, yan a-a-b-a ye, yan jî a-a-a-a ye. Feqî zê-deyî vê bi sêrêzan dinivîse û rêza navê ku dubare dibe, ahengiyeke xoşnawa dertê holê. Mîna "Ey Dîlberê":

*Li baxê me bû zivistan,
Ey dîlberê bêm gulîstan,
Ey dîlberê bêm gulîstan,
Çîlmisî li me bax û bîstan,*

Rêza çaran 'Wêran ez im malam xirab' li temamê helbestê belav dibe û wateyeke cihê ava dike. Ev lorîna dilê gelê kurd, ê gelê qedîm î li ser vê axê ku bi wateya dil û mêjiyê Zardeşt, Manî û Hûriyan xwedî bûye, ye. Tu kes nizane derdê dilê xwe, evîna xwe wiha bide der. Xweserî û gencîniya helbestê, ya vê rewşê pir tiştêkî derasayî ye.

Zimanê Feqî yê gel e, mîna zimanê îroyîn e. Lewra ew hozanê gel e. Mirov dikare bibêje li ser rêya Baba Tahir ew pêşikêş û nûnerê Wêjeya Gelêrî ya Kurdî ye. Ji şaxa wêjeya gelêrî xwedî dibe û wî cobarî dicoşîne, xurt û tekûz dike. Xwe di derûnî û hestên gel de bi cî kiriye û tê de dijî. Bi vê rewşê ji M. Cizîrî û ji Ehmedê Xanî pir cuda ye. Mirov dikare bibêje Melayê Cizîrî nûnerê Wêjeya Dîwanî, Feqî jî yê Wêjeya Gelêrî ye û Ehmedê Xanî jî senteza wan e, herdu şax; wêjeya dîwanî û ya gelêrî bi hev re hûnandiye lê wêjeya gelêrî di ramanê de serdestir e û wêjeya dîwanî di nivîsê de ji aliyê şeweyê ve li pêştir e. Feqî kurmanciya xweser bi lêv kiriye, ne biyaniyê civaka xwe ye, lewra îro her kes rasterast wî fêhm dike. Mîna robarên çiyê bi coşî û bi hêz diherike. Xweseriyeke helbestên Feqî ya dinê heye ku ev zêde

balkêş û xweşawaz û hûnande ye: Peyvek ji ya dawîya çarîne, dikeve rêza pêşîn a çarîna di pey re û wiha didome. Helbestê wiha xweş girêdide ku qet xera nabe. Wek ku tu tevnê çêbiki. Ji aliyê wate, şewê û xweşahengiyê ve tevahiyeke balkêş derdixe holê. Wek ku



tê zanîn hûnandin bi sê tayan pêk tê. Weris, kevkanîk, gulî û kezî û her wiha... Du ta li hev tên badan û tayê sisêyan bi rêzê, bi hosteyî û zaneyî dikeve navê û ben tê hûnandin, xurt dibe, qet naqete. Feqî helbestên xwe wiha rêsandîye. Du ta çarîn û rêzbend in ku ev di her helbestên gelêrî yên klasîk de hene. Feqî, tayê sisêyan afirandîye; ev jî wek ku li jor jî min anîbû zimên, peyvek ji dawîya çarîne ke-

tiye rêza pêşîn a çarîna li pey û hûnandin wiha didome. Mîna ku gulî û keziyên yarê bihûne û gulekê yan jî keskesora biharê pê veke, mîna çilkeziyên hûriyan... Guliyên keçên kurdan hê jî wiha tên hûnandin. Bi vê hûnandinê heta herhebûnê diji û sînorê jiyanê ji ber radibe, ji ezelê ber bi ebediyetê ve diherike. Di mînakên li jêrê de ev rewş zelal xuya ye.

Ji aliyê dinê ve jî dilê Feqî warê kurdî ye; lê cîhanî û gerdûniye jî... Ji van tevan re mîna herî xweş "Şêxê Sena'n" e. Him hûnandin û him jî gerdûnî... Beşek ji vê hunerê dê bêtir meseleyê ronî bike. Bila ew bibêje:

*Dûr bû ji ber minahiyan,
Ne dihate eyd û şahîyan,
Ji şerma selwat û çeyan,
Şîrîn dihate taetê*

Taet dikir daym medam,
Ge ji qewd ge ji qiyam,
Heftê û heft salê temam,
Xalî nebû ji xizmetê.

Her **xizmeta** bi xwe dikir,
Zikirê mezin jî pê dikir,
Bi çêhiyan xelq çê dikir,
Danî rêya hedayetê.

..... (Şêxê Sena'n)

Minakeke dinê jî dê ronîya dilê wî, cîhana
wî zelaltir bike:

Ey av û av, hey av û av,
Ma tu bi eşq û muhbetî,
Mewcê pêlan davê pêlan,
Bê sekunî û **bê rehetî**.

Bê rehetî û bê sekinetî,

Yane eşqa ya xwe xwenetî,

Yan şîhbeta qelbê min î,

Ji eşqa natebitî.....

(Heza)

Dilê Feqî gencîniyeke mirovahiyê ya dew-
lemend e. Li benda vekirin, nîrxandin û ro-
nîkirinê ye. Mirov dikare li ser her xalekê
bêtir vebikole. Dê mirov zêdetir mîrasê xwe
bibîne û hebûna xwe şîrîntir bike.

Rêz ji dilê Feqî re û hezar spas.

Mal ava Feqî û tê dê her bijî...

Dengê te bayê azad ê serê çiyayan e û her
digobile...

Çavkanî: Antolojiya Helbestên Kurdî

(A. Balî)

Têbîniya Kovara Wyê: Ev nivîs ji pirtûka
"Zimanê Zimên" ya Feratê Dengizî hatiye
wergirtin.

JI we anxaneyê AVA 3 berhemên nê


Ronahiya Zerdeştî
Felakeddîn KAKEÛ



Kevnedostê Min
Gumgumok
Şebnem ÎŞÎGUZEL



Dûrsel û Marê Reş
Hogir BERBIR



Feqî xwezanîn û paşxane

Serwet DENÎZ

Kesên ku bibêjin em şoreşger an jî muxalîf in û haya wan ji Feqî tune be derewan dikin. An jî ew ne yên kurdistanê ne, yên dereke din in. Yên ku dixwazin kulekî û kêmasiyên siyaseta me ya îroyîn bibînin bila ji kerema xwe re carekê jî ji vî aliyê ve li pirsgerêkê binihêrin.

‘Kî me ez?’ Ji bo mirov û mirovahiyê pirsêke bingehîn e. Ji destpêka mirovahiyê û heta niha tê pirsîn. Hewldanên ji bo bersivandina vê pirsê bûne mijara gelek efsane, çîrok û lêkolinan. Armanca ol, zanist û felsefeyê bi xwe jî bersivandina vê pirsê ye. Hinek ji bo ku vê pirsê bibersivînin derdikevin asîmanan, hinek dadikevin binî erdê û hinek jî xwe berî nav derûniya mirov didin. Ev hewldan her didomin û wê bidomin jî.

Di çarçoveya pirsgerêkê civakî de gava ku em li vê pirsê binihêrin, pirsgerêka nasnameyê dertê holê. Kes an civak li gor cihêtiyên xwe yên ji derdorê, xwe pênase dikin û dibêjin; em ev in. Gava ku wisa dibêjin sînorên xwe diyar dikin. Piştî ku sînorên xwe diyar dikin ji di nav wan sînoran de xwe bi rêxistin dikin. Ji derveyî kurdan û çend gelên din piraniya civakan ev pirsgerêkên xwe çareser kirine. Van civakan pirsê mirovahiyê ya bingehîn ‘kî me ez’ nebersivandin jî bûne xwediyê nasnameyê civakî. Dizanin ku ciyê wan ê di nav koma civakan de çi ye, xwediyê kîjan paşxaneyê ne û ev nasnameya wan bi çi û çi awayî xwedî dibe.

Wek kurd em kî ne? Ev demeke dirêj e em li bersiva vê pirsê digerin. Dibe ku hinek kes bibêjin ev pirs hatiye bersivandin û kurd bi xwe dizanin. Bi ya min ne wisa e. Xwezanîna heyî tenê wek gûzeke pûç e. Qalîk heye lê kakil tune ye. Sedema vê yekê jî bindestiya hişmendiyê ye. Pêvajoya pêkhatina rewşenbîriya kurdî ya nûjen tê zanîn. Li Stenbolê dest pê dike, ji çavkaniyên biyanî xwedî dibe û di pêvajoyêke ku tevahiya mi-

letên bindestên osmaniyan rizgar dibin de, têkiliyêke baş bi gele xwe re danayne û li hemberî tevgera kemalîst têk diçe. Em serhildanan li dû hev rêz dikin û dibêjin ji ber filan sedeman têk çûn lê em nabêjin rewşenbîrî û rewşenbîrên wê demê ji gel dûr bûn, ji çavkaniyên xwe xwedî nedibûn.

Piştî demeke bêdengiyê, di salên 1960î de dîsa liv û tevger dest pê dikin. Serkêşên van liv û tevgeran bi piranî xwendekarên zanîngehan bûn. Bi kurdîtiya xwe hesiyabûn lê bi tirkî pê hesiyabûn. Jixwe gelek ji wan endamên tevgerên çepgir bûn û paşê ji wan veqetiyabûn. Yên beriya wan jî xwendekarên *Aşîret Mekteplerî* bûn û gelekên ji wan di serî de di nav *Îtihat Terakîyê* de cih girtibûn. Cihêtiya yên nû çepgirî û ramanên civakparêz (sosyalîzm) bû. Li gor adetên çepgiriyê ji xwe re li paşxaneyekê digeriyan. Lê di dawîya dawîn de diçûn li zanînen xwe yên ku ji çepgirên tirk girtibûn diqelibîn, çîrokên derbarê Şêx Bedredîn de dikirin benîşt û dicûtin. “*Ben Halîmce Bedredînem*” ew mest dikirin. Baba Îshaq, Torlaq Kemal, Borkluce Mustefa, Pîr Sûltan... Şoreşgerên herî mezin bûn. Bingeha ramana civakparêz bûn. Li hember pergala feodal derketibûn. Em qala Thomas More, Campanella û hwd. nekin.

Gelo di nav kurdan de kesên bi wî rengî qet tune bûn? Di nav kurdan de kesî li hember pergala feodaliyê serî hilnedabû? Kesî rexne li vê pergalê negirtibû? Yan me bi xwe nizanibû? Bi ya min pirsê dawîn rast e. Me bi xwe nizanibû û haya me ji paşxaneya me

tune bû. Ji ber wê yekê jî me qala hinekên din dikir. Me nizanibû ku Feqî gotiye;

Ê bên rojek rojê amîdar

Ê hişyar bin sefîl û jar

Ê qal kin pêşiya mîrê xedar

Ê textê wan bikin wêran

Feqî tenê ne ev e û dikare ji gelek aliyên ve bê nîrxandin. Ez bawer im wê hîna gelek lêkolîn li ser bîrê kirin û aliyên wî yên ku baş zelal nebûne dê bîrê zelalkirin, agahiyên kêr bîrê temamkirin.



Gava ku navê “Feqî” tê gotin, ê min têkiliya kurdan a bi paşxaneyê wan re tê bîrê min. Dikarin qala bi hezaran muxalîf û şoreşgerên dinyayê bikin lê muxalîfiya Feqî qet nayê bîrê wan. Ku agahî rast bin, Feqî jî malbateke mîrek be û mîrekî nepejirandibe, dev jî pergale berdabe û bi dinyayê ketibe li gor şert û mercên wê rojê şoreşgerê herî mezin e. Lê mixabin ev yek nayê dîtin û zanîn, ku bê zanîn jî nayê nîrxandin û gotin. Bi kinasî kesên ku divê kurdan perwerde bikin û ji bo kurdan hişmendiyeke nû ava bikin taybetmendiyên Feqî di bin hişê gel de bi cih nakin, bi awayekî berfireh wî nakin ê gel. Di rojên giran de nikarin bibêjin Feqî gotiye;

Gul ê rabin bihar bihar

Mêrg ê şîn bin mîna her car

Avên kaniyan bizên zelal

Ê tune be feqiyê dilsar

Gelo kêşên ku ji van gotinan fêr bikin û çêjê jê bigirin, dibe ku li hember zor û zehmetiyan serî deynin, dibe ku ji hêviyê bêpar bimînin. Ku ev gotinên Feqî bibin taybetiya nîfşekê û bi taybetî jî bibin taybetiya nîfşên ciwan piştî kurdan bi tu awayî nagihîje erdê. Çima? Gava ku her tim hinek ji me qala muxalîf û şoreşgerên dinyayê dikin û dîroka mirovahiye bi wan şîrove dikin, di dest xwe re derbeke giran li binhişa me

(guhbaran, ciwanan) dixin. Lewre di nav wan de kesekî/e kurd tune. Yê guhdar dibêje qey ji kurdan tu carî muxalîf û şoreşger ranebûne. Bi vê hizrê re jî gotina serdestan a ku digot “kurd tune ne, bê esl û binyad in, kurd nabin mirov.” Tê bîrê wî/ê û xwe biçûk dibîne, qidûmşikestî dibe. Lê yên ku dixwazin hişmendiyeke nû ava bikin, ku bi gotinên Feqî dest pê bikin, dê rewşeke pir cihê derkeve holê.

Pêşiyên me gotine “her giya li ser koka xwe şîn dibe.” – hem erênî hem jî neyînî- Lê ya rast a niha giyayê me li ser koka xwe şîn nabe û kula me ya herî giran jî ev e. Ji ber ku koka giyayê me xwe bernade nav dîroka me û jê xwedî nabe zû hişk dibe û dibe pûş. Kesên ku bibêjin em şoreşger an jî muxalîf in û haya wan ji Feqî tune be derewan dikin. An jî ew ne yên kurdistanê ne, yên dereke din in. Yên ku dixwazin kulekî û kêmasiyên siyaseta me ya îroyîn bibînin bila ji kerema xwe re carekê ji jî vî aliyê ve li pîrsgirêkê binihêrin.

Gelek kes di jiyana xwe ya rojane û nivîsên xwe de qala Feqî dikin. Lê tenê wek helbestvanekî qala wî dikin, navê wî bilêv dikin. Qala felsefeya wî û naveroka helbestên wî nakin. Ew mirovekî mutasawîf e. Di gelek berhemên xwe de evîna Xwedayî vegotiye. Lê di wê vegotinê bi xwe de jî cihêtiyek heye. Ji ber vê yekê mirov dikare bibêje helbestvaniya Feqî helwestvaniyeke pir xurt e. Helwesta xwe jî wiha diyar dike;

Ez dengbêj im hatim vira

Heta hebin dengê mîra

Ez ê binivîsim ser kaxeta

Ne diçim dêra ne mizgefta

Feqî pêncêd sal berê helwesteke wiha tûj û tund li hember pergala feodal daniye û bi ya min dîsa gelperweriyê daye. Bi vê jî nemaye li gor wê demê analîzeke pir xurt ki-

riye. Têkiliya pergala mirîtiyê ya bi dêr û mizgeftan re pir xweş dîtiye û gotiye heta ku ew rewş bidome dê ne biçê dêran ne mizgeftan. Ya na ew mirovekî xwedênas û oldar e, çima ne diçe dêran ne mizgeftan. Ev jî bi me dide zanîn ku ew, tenê ne xwediyê helwesteke rijî ye, wî jî pergale baş fêr kiriye û li wê gorê jî rexne li pergale girtiye.

Awa û bilêvkirina rexneyên wî jî pir bal-
kêş in û bi baweriya min ev jî wêrekiya Feqî
didin nîşandan. An na wê çawa rasterast bi-
gota “dê roj bên wê feqîr û jar li hember
mîrên xedar şer bikin û wê textê wan wêran
bikin.” Gotina van tiştan ne karekî hêsan e.
Bi heman awayî xwediyê baweriyeke pir xurt
e û tu şik û gumana wî tune ku dê pergala
heyî hilweşe û dê rojên xweş û geş bên.
Gava ku dibêje; “gul ê rabin bihar bihar” ev
bawerî pir xweş xuya dibe û heman bawerî
bi mirovan re jî çêdibe.

Balkêşîyeke din a ku divê mirov di ser de gavnede jî ev rêzik e; “Lê ez diçim xortên cahil”. Bangî ciwanan dike û şîretan li wan dike. Ez nizamim jî hevçaxên Feqî kesî goti-

neke wiha kiriye yan na. Lewrê helbestva-
nên wê demê pesnê siltan, mîr û began ji
xwe re kiribûn karê sereke. Ev rêzik dikare
bibe mijara lêkolînên dûr û dirêj.

Bi qasî ku ji destê min hat min bal kişand ser çend gotin û taybetiyên Feqî. Ji ber ku ji aliyên wî yên dinê zêde tê qalkirin min dest neda wan aliyan. Û pîrsa min ev e; em çima bi paşxaneyê xwe re têkiliyeke baş danaynin, avahiya ku em dixwazin ava bikin li ser vê bingehe avê nakin, diçin konê xwe li ser erda hinekê datînin? Çima em nîzanin ku Feqî bi tenê negotîye; “Ey dîlberê...” di heman demê de gotîye; “Şuxlê zordestê mîra/ Xirab e halê me feqîra/ kes guh nade jar û sefîla”? Ku Feqiyê mirov hebe ne şerm e ku mirov biçe ji hinekê din dîsa gelperwerî û gelperêziyê bigire.

Û tevî ku ne mijara nivîsa min e jî ez tiştekî pir meraq, divê bipirsim. Gelo ku Feqî îro bijiya û ev helbestên xwe binivîsandina wê hinekan bigota; ev propaganda ye, ne wêje ye, divê helbestvan qala tiştên wiha neke, ev cize ne.

JI we anxaneyā BELK,
berhemeke nβ

Zimanê Zimên
Feratê DENGİZÎ



JI we anxaneya TevnE
berhemeke nß

Pêlên Xîretê
Rodî ZINAR



“ Mîr Mih ” û “ Mîm û ‘ Hê ”

Seîd DÊREŞÎ

Seyda Cegerxwîn gotarek bi navê “Mîr Mihê” di kovara Hawarê pişka tîpên erebî de belav kiriye, wisa dide xuyakirin ku dotmama wî “Sînem” evîndara wî bûye û wî strana Sînemê pê gotiye, ku destpêka wê wiha ye:

Li vêrê me divêt bizanîn ka Mîr Mih kiye û çi girêdan bi Mîm û ‘Hê re – ku nasnavê Feqiyê Teyrane – heye. Ev her du navê yek kesî ne, yan jî du kêsên jî hev cuda ne? Eger her du yek kes bin, pêbendiya wan pêkve çi ye û girov çi ye ku yek kes in?

Di hindurê divçûna min bo tûjandina helbestên Feqiyê Teyran û vekolîna jîn û berkarên wî, çend caran ev nav, anku navê « Mîr Mihê » bi ser min de boriye, gelek tişt bi vî navî, çi çîrok, çi helbest, çi jî wek nav bo Feqiyê Teyran, belav bûne.

Niho jî vê çendê dê berfirehtir di van xalên jêrîn de xuya bikin:

1. Seydayê nemir Cegerxwîn helbesteke dûr û dirêj li ser helbestvanên kurd nivîsiye, tê de navê gelek helbestvanan aniye ziman, yek jî wan jî « Mîr Mihê Miksî » ye. Dibêje:

Mîr Mihê hozanekî Miksî

Li ser Sînem dibêje û dipirsî

2. Sala 1988’an hêja Pîr Xidirê Silêman “Beyta Dîlî” anku, “Dilo rabe veke çavan” bi kaxezekê re bo me şand, ku jî bo tûjandina diwana Feqiyê Teyran mifa jê wergirin. Di dawîya helbestê de navê “Mîr Miho” hatiye, ku dibêjit: **“Mîr Miho her ‘heft felek çûn”**¹

3. Destnivîseke di jî helbesta *Dilo Rabe*, di sala 1972’yan de ku bi destê Mela Hisên hatiye nivîsîn, dîsan tê de navê şairî li dawiyê wisa hatiye “Mîr Mihê ‘heftê felek çûn”.²

4. Seydayê Cegerxwîn gotarek bi navê “Mîr Mihê” di kovara Hawarê pişka tîpên erebî de belav kiriye,³ wisa dide xuyakirin ku dotmama wî “Sînem” evîndara wî bûye û wî strana Sînemê pê gotiye, ku destpêka wê wiha ye:

Ez ê Hîzanê dicînim

Du caran tê bihare

Ez ê wekî bilbil dixwînim

Li ser gulan û xar e

Ez ê herim Sînem bibînim

Dinya min û Sînem ev car e

Di vê çîrokê de jî Cegerxwîn wisa daye diyarkirin ku Mîr Mihê helbestvanekî xweser e, heta ew berêkana di navbera Feqiyê Teyran û Melayê Cizîrî de, bi navê Mîr Mihê bi nav kiriye. Cegerxwîn dibêjit: “çend caran - anku Mîr Mihê- digel Mela Ehmedê Cizîrî hevalî kiriye. Carekê reşbelekê jê re şandiye, bendek jê hêj va ye di bîra min de ye:

Selama min heqîrê

Sedefek divê têkin

Îro di Cizîrê

heqe li Melê kin

Li dawiyê dibêjit: “Serpêhatiyên Mîr Mihê di nav kurdan de bêjimar hene”.

5. Sala 1995’an hêja Bedel Feqîr Hecî beytek dûr û dirêj bi navê Dastana Mîr Mih di kovara “Laliş” de daye weşandin.⁴

Her ev beyt e bi navê Mîr Mihê digel vekolînekê Dr. Xelîl Cindî di kovara “Roj” hejmar 7 û 8’an de belav kiriye.

6. Di mējûya 29.6.2000 hêja Dr. Xelîl Cindî kaxezek bo min şand, tê de du bend jî wê strana ku Felekê di çîrokê de, bi Mîr Mihê gotî, hene, benda dawiyê dibêjit:

Mîr Mihê mi te hîzar û çêl û salekê li ba mi mayî

Wekî îro kurre Mîr Mihê xwe ne dîtî û ne bînayî

7. Di destnivîsa (c4)de ⁵ destpêka helbe-

sta “Îro ji Dest Husna Hebîb” wisa hatiye “hazihî qesîdet Mîr Mihê”. Di nava helbestê de, li cihekî hatiye:

‘Aşiqan ra’het ku kême

Agirê pêta dilê me

‘Heftê çend caran dibême

Mîr Mih bê ezman im ez

Dawiya helbestê jî hatiye:

Mîr Mihê ‘eqil biderda

Sicla hicretê biderda

Ev qelem nîne bi serda

Me’fûê ‘ xufan im ez

8. Dîsan di destnivîsa (c4) de,⁶ dawiya helbesta “Hûn Werin Lêzim Werin” de, navê şairî bi vî rengî ye:

Mîr Mihê şairê pak e

Her kesê ruh bû ji mak e

Hemiyar dê ew fenak e

Ewî şahê qudrêtê

9 Di destnivîsa (c5) de jî, dawiya helbesta “Hûn Werin Lêzim Werin” bi vî rengî ye:

Mîr Mihê şa’rê pak e Her kesê ruh bû ji mak e...⁷

10. Celadet Bedirxan dibêje; ji eserên wî “wesfê Şêx Senhanî” nik min heye. Yê ku ev nîsxê nivîsandiye di dawiya wê de bi erebî gotiye **“ Qisîda wesfê Şêxê Senhanî ya ku Mîr Mihemed nezim kiriye temam bûye. Ev Mîr Mihemed bi navê Feqehê Teyran meşhûr e”**⁸

Li vêrê em dê hindekê li ser wê çendê bi axivîn ka Mîr Mih kî ye? Eger em binihêrîne hizrên Feqiyê Teyran, berkarê wî û dîsan kesokiya wî ya seyr û ecêb, dê bînin ewî tev tixûb perandine, ji misilmanetiyê, cihê xwe di nava ol û olriyên dî jî de kiriye, ji zarê xwe, şapa wî bi ser tev zarên kurdî de girtiye, ji tiştên xwe yên ku nivîsiye derketiye û ketiye hizr û mêjiyê peyrewên wî de û piraniya berkarên wî hatine jiberkirin. Îcar vê diyarokê (zahîre) wisa kir ku kesên dî ji kesokiya Feqiyê

Teyran dirust bibin. Xala herî girîng jî ku bûye egera peydabûna kesekê di di jîna Feqiyê Teyran de nasnav an paşnavê wî “Mîm û Hê” ye.

Ji ber ku her wekî me gotî, hizrên Feqiyê Teyran û berkarên wî, dan ser hemû tixûba û helbestên wî ketin di nav devan de, dev bo devî hatin vegêran û her yekî jî yê di wergirt, îna guherîn ketin tê de. Di awayê helbestê de guherîn pêk hatin, naveroke wan de hin guherîn pêk hatin, heta dawiyê gihîştîye paşnavê wî û ew paşnav jî bûye kesekî di. Ev diyaroka “kesekê di” di kesatiya Feqî de, ne bi tenê bi rêka devkî çêbûye, belkî di destnivîsan de jî, her wekî me li silal îşaret dayê, navê wî bûye “Mîr Mih”. Ji ber ku kesên nexwanda û heta xewndayên ne şareza jî, tenegehîştîne, ka “Mîm û Hê” çî ye û çî ramanê didet, ji ber wê çendê jî şûna “Mîm û Hê” bûye “Mîr Mihê” yan “Mîr Mih” ku awayê her du paşnavan wek hev e, dengên wan jî temet yek in û şikestinê jî naxin kêşa malika helbestê.

Eve ji layekî ve û ji layê dî ve eger em binihêrin wan helbestan ên ku navê Mîr Mihê tê de hatî, ew hemû helbestên Feqiyê Teyran in û di destnivîsan de paşnavê wî “Mîm û Hê” bi duristî hatiye. Mîna “Beyta Dilî” dîsan helbesta “Îro Werin Lêzim Werin” û “Îro ji Dest Husna Hebîb” û “Beyta Şêxê Sen’anî” û helbesta “Sînemê” û gelek helbestên wî yên dî ku li hin cihan şûna “Mîm û Hê” “Mîr Mihê” hatiye.

⁹. Ev beyte – her wekî hêja Pîr Xidir dibêjît- bûye yek ji qewlên Êzidiyan.

¹. S. Dêreşî û P. Alixanî diwana Feqiyê Teyran bp. 135.

². Binêre kovara “Hawar” hejmar 22, sal 1933 bp. 455, Weşanên Nûdem 34 Hawar Stockholm 1998.

³. Bedel Feqîr Hecî (Dastana Mîr Mî’h) kovara Laliş, hejmar 5, tebax 1995, bp. 5, pişka latîni.

⁴. Ji arşîva destnivîsên pr. Celîlê Celîl.

⁵. Jêdera berê.

⁶. Jêdera berê.

⁷. Hawar h. 33, bp. 812-813, Weşanên Nûdem 34 Hawar Stockholm 1998.

Şopên Feqiyê Teyran

Mîrza RONÎ

Di nav gelê Cizîre de hêj ev çîrok tê gotin ku helbesta Feqiyê Teyran a bi navê “Ey Avê Av” li bin wê dara tûyê li pêşberî Çemê Dîcleyê hatiye nivîsîn

Di şaristaniya herêma Botanê de, gelek mirovên, kesayetên zanyar û ilîmdar; li ser axa Botanê jiyane. Ji van mirovên zanyar hinek jê Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyrann û Ehmedê Xanî ne. Ev zanyar û filozofên ziman û wejeya kurdî, gelek jiyân û serpêhatiyên wan li ser vê axa pîroz derbas bûne. Ew dîwan û helbestên wan bi pênûsa wan ya hêja hatiye nivîsandin; mirov îro jî şopa wan dibîne. Taybetî jî îro gelek warên ku Feqiyê Teyran lê jiyayî û serpêhatiyên xwe tê de bihurandine li herêma Cizîrê hene.



Medreseya Feqiyê TEYRAN
Ji arşîva Mîrza RONÎ

Di nav gelê Cizîrê de îro jî gelek mirovên kal û pîr qala Feqiyê Teyran dîkin. Taybetî jî çîrokên ku li ser Feqiyê Teyran hatine gotin, gelek kalên vê herêma me dizanin û tînin ziman. Îro şopên ku Feqiyê Teyran ji me re hiştine medreseya wî, mizgeft, gund û deverên ku lê rûniştine û dîsa şîretkarê wî çemê Dîcleyê ye.

Medreseya Feqiyê Teyran:

Ev medreseya Feqiyê Teyran dema mirov jî Cizîrê derdikeve nêzî 15 km'yan mirov jî Cizîrê dûr dikeve li ser rîya Basa (Güçlükö-

nak) li kêleka gundê Kereşa, navbera çiyayê Gabar û çemê Dîcleyê de hatiye avakirin. (Ji ber ku heya niha tu lêkolînên zanyarî lê nehatine kirin mirov nizane di kîjan demê de hatiye avakirin) Nava derdorek xwezayî de ye û rîya diçe Basayê di ber re derbas dibe. Ev şopa ku Feqiyê Teyran ji me re ava kirî hêj ser piya ye, lê mixabin wek her warê me yî kurdan ev medreseya Feqiyê Teyran jî ji bêxweyîti, neparastin dîwarên medreseyê gelek jî hilweşiyaye û dîwarên mayî jî li ber hilweşînê ne. Heke ku tu parastin û avakirin jê re pêk neyê heta demeke dirêj xwe li ser piya nagire û wê hilweşe xira bibe.

Rewşa ku îro medrese tê de ye tenê menzelek ji medreseyê maye û dîwarên hewşa medreseyê jî rêzek jê mayê û derdora medreseyê bûye xirbe. Rola vê medreseyê jî wek medreseyên din; perwerdehiya ilmî dihate dayîn û Feqiyê Teyran di vê medreseyê de xwendîye û medrese li ser navê wî ye. Dema mirov şopên Feqiyê Teyran dinêre, dema mirov kûr difikire ew demên ku Feqiyê Tey-

Mizgefta Feqiyê TEYRAN
Ji arşîva Mîrza RONÎ



ran tê de bû tê pêş çavên mirov û mirov xemgîn dibe ji ber ku medreseya wî di vî halî de ye.

Mizgefta Feqiyê Teyran:

Dema min da dû şopa Feqiyê Teyran û digeriya, piştî ku em ji medreseya wî derketin apê ku ji gundê Kereşa ji me re got ku: li nêzî medreseya Feqî mizgefta wî ji heye û li wê jî binêrin. Piştî me ev jî zanî ji ber piştrastkirina mizgeftê em çûn ser mizgefta wî; me dît ku bi rastî jî menzeleke xirbe li nêzî medresa wî heye û derdora vê menzelê jî tirb bûn. Li gor kevnûna menzelê diyar bû ku ev mizgeft jî di dema avabûna vê medreseyê de hatiye avakirin lê wek medreseyê tu lêkolîn li ser vê mizgeftê jî nehatine kirin û tu encamên zanyarî me bi dest nexistin. Lê heke mirov medresê û mizgeftê bide ber hev di heman demê de hatibin çêkirin mirov dikarê bibe jî ku ev mizgeft dibe ku ya Feqiyê Teyran be.



Medreseya Feqiyê TEYRAN
Ji arşîva Mîrza RONÎ

Finik:

Di jiyana Feqiyê Teyran de, li gor ku tişt a ji bo Feqî re hatî gotin; piraniya jiyana wî li derdora gundê Finikê derbas bûye. Ev gundê Finikê jî nêzî medreseya Feqiyê Teyran e û diroka Finikê li gor ku çîrokên ji bo Finikê hatin gotin, avabûna wê dibe ku beriya Medreseya Feqiyê Teyran hatibe avakirin. Îro jî kaviên ji bermahiyên gund mane li ser piyan in. Wek keleha Finikê û cihê guleyên ku Tîmûr avêtine keleha Finikê, îro jî wan şopan re “pençên Tîmûr” tete gotin.


Wek ku me di serî de anî ziman ji ber ku ev kevnareyên diroki nayên parastin; îro ev diroka pîroz li ber windabûnê ye. Dema mirov bala xwe dide ser van kevnareyan xuya dike ku jîna Feqiyê Teyran di derdora Finikê û li ber çemê Dicleyê derbas bûye. Ango li gor çîrokên li ser Feqiyê Teyran hatine gotin; Feqiyê Teyran dema ku dixwest helbestên xwe bixwîne, yan jî binivîse; ji medreseyê an jî ji Finikê derdiket û dihat aşê ku dikevê milê Finikê yê rastê li ber Çemê Dicleyê li bin darê reke tûyê rûdinişt û helbestên xwe dinivîsî û dixwend. Di nav gelê Cizîre de hêj ev çîrok tê gotin ku helbesta Feqiyê Teyran a bi navê “Ey Avê Av” li bin wê dara tûyê li pêşberî

Çemê Dicleyê hatiye nivîsîn. Dîsa hatiye gotin ku dema Feqiyê Teyran li wir helbest dixwendin; ava Çemê Dicleyê lê guhdar dikir û radiwestiya. Balkeş e dema em li şopên wî digeriyan de vera ku tê gotin Feqî lê helbest xwen-

diye a niha jî ava çemê Dicleyê wek rawestiyayî xuya dikê. Û şopên Feqiyê Teyran wek giyan xuya dikin li ber çavên mirov.

Çemê Dicleyê:

Gelek çîrokên li ser Feqiyê Teyran hene û dema mirov naveroka wan dinêrê; Çemê Dicleyê gelek tê de derbas dibe. Wek ku me anî ziman jî helbesta xwe ya bi navê “Ey Avê Av” li ser ava vî çemî nivîsiye. Em dikarin bibejin ku ev çemê ku şahidê gelek dirok û neteweyan e. Ji gelek mirovên navdar re bûye hêlîna çîrokan. Lê taybetî şopa Feqiyê Teyran li ser vê ava Çemê Dicleyê xuya dikê. Wek çîroka ku



dibêjin: Feqiyê Teyran di ber vê avê de derbas bûye û ev helbesta bi navê “Ey Avê Av” xwendîye û ji avê xwestîye ku raweste, lê avê guh nedaye Feqiyê Teyran. Piştî ku Feqî dibînê av ranaweste Feqî lingê xwe ji milekî avê diavêje milê dî û xwe dixê nav avê û ji avê dixwazê ku raweste. Lê av guh nade Feqiyê Teyran û ehda li Feqî dixwinê. Piştî ku av hewl dide ku Feqî noqî avê bike, Feqiyê Teyran jî; qewetê ji Rebê alemê dixwazê da ku bikaribe avê rawestîne. Feqiyê Teyran di nav avê de xwe wek bendê qayîm dike û nahêlê ku av derbas bibe. Her çiqas av jê daxwaz dike dibêjê: min berde ez ê herim masiyên min mane bê av, ma tu ji min çi dixwazî min bernadî. Her çiqas av hewl dide ku xwe ji Feqiyê Teyran xilas bike ji Feqî bernade û dibêje ji ber dengê te gelê

Cizîrê ranakeve û tu gelekî dikî guşeguş û derbas dibî. Şertê min jî ev e ku êdî bêdeng derbas bibî û bila tu kes ji te aciz nebin. Piştî ku av vî şertê Feqiyê Teyran qebûl dike, Feqiyê Teyran jî avê hedî hedî di nava lingên xwe re berdide û çîroka wî wisa diqede. Li gor vê çîroka ku me bi kurtî got, ya ku di navbera Feqiyê Teyran û ava Çemê Dicleyê derbas bûyî anî ziman xuya dike ku jîna Feqiyê Teyran gelekî li ber vî çemî derbas bûye.

Îro mirov Medreseya Feqiyê Teyran, mizgeft, gund û çemê ku şopên Feqiyê Teyran lê xuya dikin bide ber hev; mirov bi rihetî dibîne ku şopên Feqiyê Teyran xuya dibin. Ev şopên wî li benda lêkolînê mane.

Warê Feqiyê Teyran; Muks û Werezoz

M. Xalid SADINÎ

Ez bi xwe di wê qinyatê de me ku Feqiyê Teyran yanî Mîr Muhammed Beg
kurê Ewdal Begê Duyemîn ê mîrê Muksê ye

Di derbarê Feqiyê Teyran de, jiyan û berhem û dema jiyanê wî û mijarên cur be cur yên li ser wî gelek tişt hatine nivîsin. Ez bawer dikim ku ji bo Kovara Wyê jî di sa ev tişt hemû dê bên dubarekirin. Vêca jî ber hindê ez dixwazim di vê gotarê de behsa ciyê Feqiyê Teyran, yanî warê wî bikim. Ji ber ku çend meh berê ez çûbûm serdana Feqiyê Teyran, çûm ser merqeda pîroz û çûm ciyê wî, ez dixwazim behsa wan deran bikim.



Ji arşîva M. Xalid Sadînî

Her wekî têtê zanîn Feqiyê Teyran, xelkê Muksê ye. Di sala 1563'yan de li vî bajarokî hatiye dinyayê. Piştî salên 1640'î jî li gundê Werezozê ku bi Muksê ve girêdayî ye çûye ser dilovaniya xwe û merqeda pîroz niha li wê derê, li pişt vî gundi ye. Der barê vê mijarê de min pirtûkek daye çapkirin û heta niha sê caran çap bûye. Ev pirtûk di nav weşanên Nûbiharê de bi navê *Feqiyê Teyran Jiyan, Berhem û Helbestên Wî* ye. Ji ber hindê em vê meseleyê dirêjtir nakin. Werin em biçin ciyê Feqiyê Teyran.

Pêşiyê Hinek Erdnîgarî.

Muks/Mikis/miks; Muks, îro qezayeke (bi navê xwe yê tirkî Bahçesaray) bi bajarê Wanê ve girêdayî ye. Dikeve başûrê Gola Wanê. Lê belê jî ber ku Çiyayên Şehap ketiye navbeyna Muks û Gola Wanê, Miks û Golê jî hev veqetiyane. Ji ber hindê jî Muks ne di hewza Gola Wanê de ye.

Dema mirov ji Wanê here bo Muksê,

hêj negehiştî Kawaşê dê bo aliyê Rojhilat bizivire û hêj negehiştî Gulpinarê jî vêca bo aliyê başûr yanî ber bi Şaxê ve diçe. Lê hêj 10 km. maye bo Şaxê vê carê jî çepeke din li xwe dide bo başûrê rojhilat. Êdî girik û milik û kox û çiyayên mezin mirov hildigirin nav dol û newalên xwe heta kêriyê Kirapêtê. Di heman demê de çiyayekî sext û zevt e ev Kirapêt. Lê di sa jî rê dide ku mirov di kêriyê wê de derbas bibe. Ev kêrî bi nêzikahî 3000 mt. jî behrê bilind e. Ji serê kêrî dema mirov ber bi jêr bû, sahm û selabeta kûrahiya Geliyê Miksê, mezinahiya çiyayên wê serê mirov digire. Bê nepixandin însan dikeve hiseke wisan ku heke mirov here Muksê êdî bawer nake ku dê bikaribe di sa bi ser wan çiyayan bikeve.

Dema di vî geliyê de bi sedan çiran û çep qediyên û mirov gihîşt binê Çiyayê Axirov, di şikefteke mezin de aveke mezin û spî jê derdikeve. Ev av e ya ku jiyanê dide vî geliyê mezin heta digihê çemê Dicleyê. Her wisa ev av e ya ku Feqiyê Teyran wiha li ser nivîsiye:

*Ey av û av, ey av û av
Ma tû bi 'îşk û muhbetê
Mewc û pêlan tavêy belav
Bê sekne û bê rahetê*

*Bê rahet û bê sekne yî
Yan aşiqê baxwê xwe yî
Yan şubhetê qelbê me yî
Ji 'îşqa kê na tebitê*

*Ji 'îşqa kê her têt û têt
Heta kengê her bêt û bêt
Bo min bêt heyranê kê
Da ez bizanim qissetê*

*Da ez bizanim vê sûrrê
Ji hindekê heta purrê
Ji me'neya vê gur gurê
Ji kêra diki vê ta'etê*

*Dengê te têt bê pê û hev
Ta'et dikî bê qelb û dev
Peyda dibin ji te mewc û kev*

Şîn bûy ji rengê qudretê

.....

.....

*Geh geh spî şuphetê şîr
Qet mislê te naçin tu tîr
Reng e ku te yar têt te bîr
Meyla hebîb ji çûna te têt “*

Û wiha dewam dike heta dawiyê ev helbest.

Muks, sê, çar km di jê-rahiya vê serekaniyê de, li ber

qiraxa avê hatiye avakirin. Ev bajarokê biçûk û şîrîn bi çiyayên; Axirov, Hesamsîr, Arnos, Kureşehap, Kirapêt û bi silsileyên wan ve hatiye dorpêçkirin. Her wisa di berwêdayî van çiyayên de; ji bakur ve Kawaş û Karkar ji rojhilat ve Şax, ji rojava ve Hîzan û ji başûr ve jî Perwarî yê doralîyên Muksa rengîn girtine.

Her çenda ku ji Perwarî, Hîzan û Şaxê ve jî rê bête Muksê, di zemanî de heta niha riya karwan û bazirganiyê di Çiyayê Axirov re derbas dibe bo Kawaş û Wanê. Ji ber vê karwanberiyê jî li ser vê rêkê xanên yanî karwansarayên bi nav û deng hene. Wekî Xana Mîr Hesenê Welî, Xana Xef ku nêzîkî serê Çiyayê Axirov e, Xana Dûder û Xana Sêvo.

Bajarokê Muksê bixwe nifûsa wê nêzîkî 4000'î ye. Lê gelek gundên Muksê hene. Jixwe di nava van çiyayan de jiyanekê bi ser û ber û balkêş hebûye. Di mintîqa Muksê de gelek geliyên jiyanbar hene ku di tevan de jî gund û warên qedim hene;

Geliyê Sundisê, Geliyê Xanê, Geliyê Liçanê, Geliyê Arincikê, Geliyê Arincê, Geliyê Arwasê, Geliyê Nanîs û Geliyê Delan ji van geliyan in. Ev geliyên hanê hemû jî avadar û bi dar û ber in. Piraniya wan gund û warên kevnar in.

Di geliyê Sundisê de; gundê Sundis û gundê Pesevank hene wekî din hemû zozan û çêre ye. Geliyê Xanê jî Xana Mîr Hesenê Welî lê ye ya din zozan e.

Ji Arşîva M. Xalid Sadîrî



Geliye Arincikê gunden bi navê Kenekas, Par, P o l i s , Arincik / Surs hene.

Geliyê Arincê; gundên bi navê Qesir, Mezra Şêxî, Dêra Elî Axa, Ker-kîças, Taxa Şêxo, Kitrîs, Arinc, Demkar û Xelwa hene.

Geliyê Tere-maxê; gundê Tere-max, yanî gundê Elî Tere-maxî, zimanzanê me yê bi nav û deng jî li wir e. Gundên din yên vî geliyê; Mangûne, Nankas, Amûs, Zedas, Palanis û Şityara ne.

Di geliyê Muksê bi xwe de dema mirov ber bi jêr biçê bo rexê Hîzanê, li aliyê Nîzarî heta gundê Feqiyê Teyran, ev rêzegund hene; bajar (Muks bixwe), Westing, Nurewas; Mezre, Axîn, Pirasor, Xazepilul, Akrok, Werkendî, Peringas, Tusûs û Werezoz. Gundên aliyê berojî jî ev in; Merekas, Pirnişîn, Nankas, Amûs, Mangûne, Şityara, Paranis, Zerdas û Kîcoxş.

Gundê Feqiyê Teyran: Werezoz

Her çenda ku em nîzanin ka Feqiyê Teyran li vî gundî hatiye dinyayê yan na jî, îro li vî gundî gor ango merqeda wî, mizgefta wî, mala wî û di binê gund de golege bi navê wî heye. Ji ber hindê em dikarin bibêjin ku Feqiyê Teyran piraniya jiyana xwe li vî gundî derbas kiriye.

Mizgefta wî li ser navê wî ku îro jî heye, xaniyakî bi ax û kevir û daran (xêtire) ve hatiye avakirin e. Xaniyekî kevnare ye. Li ser wî xaniyî xaniyekî din ku ew jî her mizgeft e hatiye avakirin. Gundiyên Werezozê di wê



qînyatê de ne ku xaniyê serî paşê hatiye çêkirin; lê yê binî yê dema Feqiyê Teyran bi xwe ye.

Gora Feqiyê Teyran li pişt vî gundî ye. Dehleki bi dar û ber e. Darên hezar salî tê de hene. Gora wî aşkere ye, li cem gora wî medfûnekî dîn jî heye kes nîzane ka kî ye. Li ser gora Feqiyê Teyran

çi îşaretên wekî kêla kevnare diyar nîn e, lê belê hem gundiyên Werezozê hem jî yên dor û berê tîz ziyareta merqeda wî. Ciyekî pîroz e di nava xelkê de. Dar û berê li ser gora wî qet nayên birîn û sotin. Li gor gundiyan kesê/a darên li ser gora wî bîne û bisoje dê tûşî belayeke zêde bibe. Her wisa jî ber ku çirtê çûkan li ser wan daran zêde diyar nabe, ew kesên der û dorê bawer dikin ku çûçikên wê daristanê jî ji bo xatirê Feqî çirt nakin wan deran

(Mirov pê bextewar dibe ku îro li wî gundî, li ser merqeda Feqiyê Teyran gumbeteke dîrokî û li pişt goristanê jî mizgefteke xweşik tê çêkirin.)

Her weki jî navên gundên der û dora Werezozê diyar e ku piraniya xelkê vê derê Ermenî û Asûrî bûne. Ji ber hindê mirov îro çêtir têdigihê ku ka Feqiyê Teyran çiroka Şêxê Sen'an jî bo çi nivîsiye. Her wekî dibêje:

“Muksî jî îşqê sohtî ye

Ev Qewil bi şêx nû gotiye

Halê xwe tê de gotiye

Li "Xeyn û lam" a hicretê

Hinek Dîrok...

Piştî ev qas erdnigariyê em binêrin rûpelên dîrokê ka ev ciyê wiha asê, avadar û jiyabar de kî jiyaye û di dîrokê de çawa cih girtiye?

Muks, her demekê maye di navbeyna bajarên Hekarî û Cizîrê de. Para pirtir jî di hewza kulturî ya Hekariyê de maye. Kî desthilatdarê wan her du bajarên qedîm be, xwestiye ku Muksê jî têxe bin bandora xwe. Ji ber hindê jî her wekî xirecira li ser Cizîr û Hekariyê; Muks jî jî dîroka kevn heta niha jî gengeşî û pevçûnan xelas nebûye.

Navê Muksê di çavkaniyên kevn de wekî "Moksena" hatiye nivîsîn. Dema împaratoriya Romayê Kurdistan zevt kirî, bi navê Eyaleta Moqsena, eyaletê hatiye çêkirin. Her çenda ku ev eyalet di bin desthilatdariya Romayê de be jî xwecihiyên wê Gurciyên Kartvelî bûne. Di dema împaratorê Roma Diyoletiyons de, ev eyalet ligel Cizîrê merkezeke leşkerî ya girîng bû jî bo împaratoriya Romayê. Vê rewşê wiha dewam kiriye heta di sedsala heftemîn de êrişên Ereban hatine ser

Muksê. Wê demê Ermenî li vê deverê desthilatdar bûne. Piştî sala 646'an dema qûmandarê Îslamê yê bi nav û deng Emîr Hebîb bîn Mesleme Erzerom zevt kirî û zivirî bo Gola Wanê, ciyên wekî Xelat û Muks jî wergirtiye bin hukmê xwe, lê belê tu guherînên olî nekiriye. Her dîsa hikumdarên

xwecihî serî ji Misilmanan re tewandine; lê belê rewşa civakî û olî wekî xwe maye.

Di dema Ebasiyan de Muks û gelek deverên dorhêlê di bin desthilatdariya Ermenîyan de bûn. Ev hikumdariya bi navê hikumdariya Vasporakan dihat binavkirin û navenda wê Westan bû. Di sala 908'an de xelifeyên Ebasî tac dane Qiral Gagîk. Ev qiral jî sulaleya Ardîzîrûnî bû. Êdî Westan bi dor û berên xwe ve girêdayî Ebasiyan bû. Muks, Adilcewaz, Kawaş û gelek kelehên din ên devera prensiyên vî qiraliyetê bûn.

Di sedsala 10'emîn de Muks di nav bajarên Wasporakan de hatiye hejmartin û prensê Muksê Grîgor, pêvenûsiya xwe nîşanî qiral Gagîk daye. Di sala 977'an de prensê Muksê Zapranîk bûye û ligel hêzên Vasporakan şerê împaratorê bîzansî Bazîl kiriye.

Di sedsala dehemîn de bîzansiyan desthilatdariya Wan û der û doran bi dest xwe xistine û ev prensiyên Ermenîyan jî dîsa ketine bin desthilatdariya wan.

Di sala 1018'an de êrişên Selçûqîyan dest pê kirine. Wê demê qiralê Vasporakan Senekherîm bûye. Senekherîm di sala 1021'ê de bi împaratorê bîzansî Bazîlê duyemîn re peyman çêkiriye û ev der û dor bo bîzansi-



Ji arşîva M. Xalid Sadîf

yan hêlaye. Ew bi xwe jî bûye magistor û çûye Sêwasê. Bi vê bûyerê jî desthilatdariya Vasporakan li wan û der û dorên wê bi dawî hatiye.

Gelek şûnmayiyên vê dema Vasporakan li der û dorên Wanê û Muksê he jî diyar in. Wekî; Dêra Axtamar, Dêra Saint Georgies. Jixwe Dêra Axtamar bi nav û deng e. Di navbera salên 915 û 921'an de ji aliyê qiralê Vasporakan Gagîk ve hatiye avakirin. Her wisa Manastira Saint Georgies jî li deverê navendeke girîng a ola Mesîhî bû û demeke dirêj karê perwerdehiyê kiriye. Ji bilî van her du dêrên girîng gelek dêr û manastirên din jî li devera Muksê mane. Wekî Manastira Saint Ciroix, Manastira jinên Ezîz, Dêra Spî û Dêra Ancoqs û hwd.



Di sedsala yazdemîn de êrişên tirk û moxolan li ser Wan û Muksê dewam kirine. Di sedsala sêzdemîn de desthilatdariya kurdên misilman li Muksê rû daye û desthilatdariya Ermeniyên roj bi roj kêmîr bûye. Lê heta serdema Osmaniyan desthilatdariya kurdan xurt nebûye. Bi rêzê pezreş, pezsî û sefewiyan jî desthilatdariya Muksê bi dest xwe xistine û ev cî bi mirovên xwe dane birêvebirin. Hema her di van sedsalan de pêkhatinêke mîrên kurdan jî çênebûye li ser Muksê û her dem gengeşî û minaqeşeyeke mezin li van deran hebûye. Car mîrên Hekariyê caran ên din mirovên xwe li wir kirine hikumdar. Vê rewşê heta serdema Osmaniyan dom kiriye. Lê belê piştî împaratorê osmanî Yavûz Siltan Selim 1514'an de ligel

mîr û begên Kurdistanê peymanek çêkiriye, Muks jî ketiye nava vê peymanê. Ji sala 1514'an heta sala 1555'an di navbeyna osmaniyan û safewiyan de gelek şer û pevçûn hatine kirin. Dawiyê di sala 1548'an de osmaniyan Westan û dor û berên wê zêft kirin û safewî jî wan deran qewirandin. Di sala 1555'an de safewiyan û osmaniyan bi hev re peymanek çêkirin.

Li gor vê peymanê Azerbeycan, Tebrîz, Kurdistan û Îraqa Erebe kete destê osmaniyan. Osmaniyan jî Westan (Wan) kirin eyaleteke sereke û mîr û begên kurdan ên vê deverê hemû pêk ve girêdan. Muks jî di vê çarçoveyê de bû begîtiyeke sancaqî û bi Wanê ve hat girêdan. Li gor şerefnamayê mîrê yêkemîn ê vê dewrê Evdal Beg bû.

Jixwe di nav kurd û osmaniyan de têkiliyeke federatîf ava bû, her mîrê bajarekî Kurdistanê ligel osmaniyan kar û barên xwe bi rêve birin. Ji ber ku şer û pevçûnên navxweyî û yên ji derve kêmtir mîr û begên Kurdistanê bi îstiqrar ketin û pêşveçûnên girîng li Kurdistanê rû dan. Bes divê em ji bîr nekin ku mîrîtiya Muksê her dem di bin bandora mîrîtiya Hekariyê de maye. Piştî Evdal Begê Mîr Ehmed piştî wî Mîr Hesenê Welî piştî wî Evdal Begê Duyemîn li Muksê hikumdarî kiriye. Ez bi xwe di wê qinyatê de me ku Feqiyê Teyran yanî Mîr Muhammed Beg kurê Evdal Begê Duyemîn ê mîrê Muksê ye.

Ji ber ku mijara me Feqiyê Teyran e, em vê behsa dîrokî li vir bibirin.



Romana Omer Dilsoz

“Bêhna axê”

Lokman POLAT

Naveroka romanê dewlemend e, bûyer balkêş in, tevna wê û hûnandina wê serketî ye. Romaneke herikbar e. Pêkhatina bûyeran di atmosfereke kelecânî de, bi şeweyekî herikbar tê pêkanîn

Nivîskarê kurd Omer Dilsoz sê romanên kurdî nivîsiye. Romana wî ya yekem di sala 2003'yan de derketiye û navê wê "Hêviyên Birîndar" e. Ya duyem di sala 2005'an de derketiye û navê wê "Bêhna Axê" ye û ya sêyem di sala 2008'an de derketiye û navê wê "Neynika Dili" ye. Navê pirtûka wî ya helbestan jî "Bila Gotineke Min û Te Ji Hebe" ye. Pirtûka helbestan û romaneke wî di nav weşanên Berçemê de û du romanên wî di nav weşanên Aramê de hatine weşandin. Romana Omer Dilsoz a bi navê "Bêhna Axê" di nav weşanên Berçemê de di sala 2005'an de li Stenbolê hatiye weşandin. Roman 207 rûpel e.

Omer Dilsoz digel romanivîseriyê helbestan jî dinivîse û weke helbestvan jî tê nasîn. Gelek helbestên wî yên baş hene ku hatine weşandin. Ew redaktorê rojnameya rojane Azadiya Welat e. Wek tê zanîn ev rojname rojnameya rojane ya herî pêşîn a bi kurdî ye ku li bakurê Kurdistanê derketiye. O. Dilsoz hema her roj di vê rojnameyê de sernivîs, meqale (gotar) nixandîn û heta nûçeyên rojane dinivîse û lewre jî ew nivîskarekî jîr e, xebatkar e û kedkarê çand, ziman û edebiyata kurdî ye.

Rojnamegerê kedkar, nivîskarê berhemdar Omer Dilsoz sê roman nivîsiye û weşandiye. Lê, di derbarê van her sê romanên wî de gelo çend nivîsên şîrovekirinê, nixandînê derketine? Gelo bi şeweya zanîna edebî romanên wî hatine analizkirin? Rexnegirên edebiyata kurdî di kijan waran de rexne li romanên wî girtine? Mirov li bersiva van pirsan bigere tiştê berbiçav li holê nabîne.

Dostekî min ê nivîskar ku ji herêma Serhedê ye ji min re got " binêr Kek Omer Dilsoz sê roman nivîsiye, lê masmedia kurdan û rexnegirên kurd di derbarê romanên wî de tiştê nenivîsine. Ji bo ku ew ne ji Mêrdînê, ji Colemêrgê ye. Heger ew ji Mêrdînê bûya niha çendik û çend nivîs li ser romanên wî hatibûn weşandin."

Ev îdiaya dostê min ê nivîskar çiqas di cî de ye, ez nizanim. Lêbelê ev rastiyeke e, gelek pirtûkên kurdî yên kurteçîrok û roman derdikevin û kesek li ser wan tiştê naniwîse. Hinek romanên kurdî hene ku tenê min li ser wan nivîsiye. Gelek roman jî hene ku tenê min û birêz Salihê Kevirbirî li ser wan nivîsine û hew. Ev jî rastiyeke din e ku, nivîsên nixandînê û şîroveyên li ser pirtûkên kurdî yên ku heta niha hatine weşandin bi piranî nivîsên li ser pirtûkên yek, du nivîskaran in. Kurdên spî yên ku di derbarê edebiyata kurdî de bi tirkî dinivîsin tenê behsa yek, du nivîskarên kurd dikin. Di rojnameya tirkî Radîkalê de jî li ser yek, du nivîskarên kurd nivîs derdikevin. Gelo pirtûkên van yek, du nivîskaran jî yên din baştir in loma behsa wan tê kirin? Na. Mesele başî û nebaşiya berhemên nîn e. Mesele meseleya mentalîteyekê ye. Lobiyeke neyînî li gor mentalîteya xwe dixwaze tenê yek, du nivîskarên kurd derxe pêş. Ew li gor hesabê xwe û her wiha li gor mentalîteya xwe dixwazin edebiyata kurdî hindik, bi sînor û qels bidine nîşandan û ji bo vê armanca xwe jî hinek kurdên spî bi kar tînin.

Piştî van çend gotinên gelemperî, niha ez ê bi kurtahî behsa naveroka romana Omer

Dilsoz a bi navê Bêhna Axê bikim. Beriya ku ez têkevim nav naveroka romanê û wê rave bikim, ez dixwazim vê bibêjim; zimanê O. Dilsoz zimanekî edebî û helbestkî ye, zela e, vekirî ye. Ev zimanê wî yê xweş bi hunereke edebî di romanê de hatiye bikaranîn û asta romanê ya ji hêla hunerî û edebî ve bilind kiriye. Naveroka romanê dewlemend e, bûyer balkêş in, tevna wê û hûnandina wê serketî ye. Romanekê herikbar e. Pêkhatina bûyeran di atmosfereke kelecânî de, bi şeweyekî herikbar tê pêkanîn. Di romanê de babetên girîng hene û her wiha tema û mijarên cure naveroka wê hîn pirtir dewlemend kirine.

Roman bi zor û zehmetiya berdestiyê dest pê dike. Du lehengên romanê Dilgeş û Sozda ne. Her du leheng ji aliyê vebêjê romanê ve bi kurtahî hatine taswîrkirin. Dilgeş û Sozda di bin baranê de dimeşin û diçin aşxaneyê. Ew bi hev re xwarinê dixwin û sohbet dikin. Ji sohbetê wan fêr dibe ku Dilgeş berê hatiye girtin, heyamekê di zindanê de maye û paşê hatiye berdan. Dilgeş ji Sozda re behsa guhertinê, guhertina civakî dike.

Piştî sohbetê, her du ji aşxaneyê derdikevin. Her du bi mêvanî li mala kurdperwerekî ku navê wî Serbest e, dimînin. Navê jina Serbest Zeyneb e. Hem Zeyneb û hem jî der û cîranên wan qayil nîn in ku ew – zîlam û keç anku Dilgeş û Sozda – di mala Serbest de bimînin. Ew ji bo wan paşgotiniyê dikin. Li nav taxê gelek derew ji bo wan dihatin gotin. Cîranên wan digotin "taxa me bûye cihê fihûşê." Dema Serbest û jina xwe li ser van paşgotiniyên cîranan û taxê bi hev re axifin deng çû Dilgeş. Lewre jî wî dixwest ew û Sozda ji vê malê biçin. Divê mirov ji cihê ku lê nayê xwestin dûr bikeve. Dilgeş û sozda ji mala Serbest diçin. Dilgeş bi alîkariya dostekî xwe xanî kirê dike.

Ji ravekirina vebêjê romanê mirov fêr

dibe ku, Dilgeş nivîskarekî jixwerazî û Sozda jî şoreşgereke westiyayî ye. Çarenûsa her duyan bi hev ve hatiye girêdan. Her du jî afirînerê xeyalên xwe ne. Her du jî dilşikestî ne. Pênûsa dilê her duyan jî qerimiye. Ji axaftinên Dilgeş û Sozda mirov fêr dibe ku her du ji berê li çiyayê Kurdistanê şerker û şervan anku gerîla bûne. Ew ji weke hemû gerilayên hêza çekdar di jiyana zor û zehmet a li çiyayê de jiyane. Wan fedekariya herî mezin nîşan daye, mirina xwe dane ber çavan, bûne canfîdayê gel û welatê xwe. Sozda li çiya birîndar bûye, hevalên wan ên çekdar li ber çavên wan hatine şehîdkirin. Sozda jî Dilgeş re bi dilekî xemgînî behsa şehîdbûna fermanîdarê hêza çekdaran ku navê wî Mêrxas bûye, dike. Dilgeş jî behsa heps û zindanê, berxwedana li hepsxaneyê û şehîdbûna hevalên wî yên ku di berxwedanê de şehîd ketine, dike.



Serlehenga romanê Sozda, Kurdistanê dişibîne bûkeke birîndar. Bi rastî jî Kurdistan, gelê kurd birîndar e û hê jî ji ber birîna xwe dinale. Digel birîndarî û nalîna xwe jî, civak guheriye. Civak ew civata dema

ku Sozda derketibû çiya û Dilgeş ketibû heps û zindanê nîn e. Yek li çiya û yek li hepsxaneyê bûbû biyaniyê ve civakê. Di civakê de û di siyasetê de guherînên wisa çêbûbû ku; ew tiştên ku Dilgeş û Sozdayê ji bo wan şer dikirin kirasê xwe guhertibûn. Daxwaz û têgehên ku ji bo wan (ji bo çekdarên çiyayan û berxwedêrên zindanan) pîroz bûn, bûbû pêleyiz. Ruhê şoreşger yê berê westiyabû. Êdî tu tişt wekî berê nebû. Di nav civakê de û di siyasetê de dejenerasyonêk çêbûbû û dejenerasyonê wisa kiribû ku kes, mirov bi rûpêç digerin. Kes wekî xuya dike nîn e. Însan rûsar bûne. Evînen berê yên pîroz di bin ajoyên zayendî de herişîne.

Dilgeş xanî kirê kiriye lê di xanî de livîn

tune ne ku tê de razên. Dilgeş û Sozda li hundirê xanî digerin, li menzelan dinêrin, di odeyekê de naylon dibînin. Sozda dibêje: "...dema ku em li çiya bûn; gelek caran bi şev em di bin naylonan de radizan. Naylon, mirov ji sermayê diparêze." Û her du di bin naylon de radikevin.

Sozda ji bo azadiya gel û rizgariya welat û her wiha ji bo jiyanê azad bûye şervan û çek hildaye, têkoşiyaye, şer kiriye. Dilgeş ji çekdarekî jîr û zana, rewşenbîr û her wiha mihendisê civakê ye. Anku ew wek mihendisê zanyarî û zanayekî civakî civakê dinase. Sozda li çiya maye, birîndar bûye, hatiye girtin, dîl ketiye. Wê di heps û zindanê de lêdan xwariye, êşkence ditiye û paşê piştî demekê hatiye berdan. Jiyana wê herimiye, bûye du perçe. Jiyana dema şoreşgerî û şervaniyê û jiyana piştî şervaniyê. Lewre ji ew dixwaze hewl bide ku xwe ji nû ve vejîne. Lêbelê ew westiyaye, ji refê xwe veqetiyaye û di navbera nal û bizmarê jiyanê de asê maye.

Jiyan hêsan nîn e. Di jiyanê de mirov rastî gelek zor û zehmetiyan tê. Sozda di nav xaçerêyên jiyanê de tê xapandin û bi pey zilamekî ku navê wî Ado ye dikeve. Ew ji wek her keçeke ciwan xwedî xeyalên xweş e. Xeyalên keçan zewac, malavakirin, zarokanîn û her wiha dewlemendiya zilaman e. Xeyala bi mêrekî dewlemend re zewicîn hişê Sozdayê ji serê wê dibe û loma ji ew bi pey Ado dikeve.

Ji bo ku Sozda bê xeber û bê sedem Dilgeş terk kiribû û li pey Ado çûbû, bi Dilgeş gelek zor hatibû, loma ji ew qehiribû, xemgîn bûbû û wî xwe dabû araqvexwarinê. Di ser çûyîna Sozda re çend roj derbas bûbûn, Dilgeş bûbû wek araqxwirekî serxweş.

Dilgeş beriya ku here çiya û bibe çekdar û were girtin û her wiha di heps û zindanê de raze, bi navê Roza evîndara wî hebûye. Ew û Roza evîndarên hev bûne, lê miradê wan neçûye serî. Piştî ji holê wendabûna Dilgeş, Roza ji bi zilamekî navsal re zewiciye. Bi tesadûfî mala ku Dilgeş kirê kiriye di locmanêke ku mala Roza ji li wire de ye. Ew û

Roza piştî çendik û çend salan hevûdu dibînin. Dema Dilgeş dibe araqxwirekî serxweş, Roza pê re dibe alîkar.

Dilgeş berê aşîqê Roza bû û niha ji aşîqê Sozda bû. Di jiyana rasteqînî de ji hatiye ditin ku; zilamek dikare bibe aşîqê du keçan, du jinan û keçek an jinek dikare bibe aşîqê du xortan, du mêran. Dilgeş li evîndara xwe Sozdayê difikire, dirame. Ji bo ku wê wisa bêwext û bêsedem ew terikandiye, qehr dibe, gelek xemgîn dibe.

Ado bi sozê ku ew dê bi Sozda re bizewice wê dixapîne, pê dilize, wê wek paçekî qirêji diherimîne û piştî çend rojan derew û rûyê wî yê reş derdikeve holê. Ado ji Sozdayê têr dibe û ji derve jinan tîne malê, bi jinan re pevşabûnê pêk tîne û Sozdayê ji weke qewraşa malê bi wan dide nasîn. Sozda vê neheqiyê qebûl nake û ew Ado terk dike û vedigere cem Dilgeş.

Gelek keç bi zilamên rûşêrin, xweşxeber û çeleng tên xapandin. Rûyê wan zilaman şêrin e lê ew talpijandî ne. Ew dikevin ber ba û babelîska wan û gelek tiştên serê wan. Divê keçên nûgiha bi rûşêrinên dilreş neyên xapandin. Divê ew hişyar bin û bîzanîbin ka bi kê re ne. Divê tîkîlî li ser bîngê hên dilpakîyê pêk werin. Kesên hesûd, dilreş û nîfşê jirêderketî dikarin gelek xirabîyan bikin û mala keç û jinan bişewitînin. Digel xirabîyên ku di nav civakê de hene, xirabîya herî giran û mezin jî bi destê hêza dagirker a dewletê tê bikaranîn. Dagirkerên xwedan apolet, polisên êşkencekar, tîmên taybet ên xwînxwar gelek xirabî bi keç û jinên kurd kirine û dikin. Sozda yek ji wan keçan e ku di êşkenceyê de, di zindanê de keçanetiya (bakîretiya) wê hatiye xirakirin. Di hucreyên zindanên dagirkeran de jopên wan di nav lingên keç û jinên dîlketî de digerin. Di êşkencexaneyan de voltajên elektrîkê didine memik û laşên tazî yên keç û jinan. Êşkencekarên çavsor û destbixwîn di wan êşkencexaneyên "bêxweda" de li ser laşên keç û jinan fantaziyên xwe diceribînin. Divê kurd van kirinên dagirkeran ên xedar ji bir nekin. Sozda bi şeweyekî aşkere û vekirî ji Dilgeş re dibêje ku di êşkencexaneyê de

keçaniya wê hatiye xirakirin.

Roman van mijarên ku min li jor behs kir bi teferuat rave dike û li ser babetên girîng radiweste. Di hêla pêşkêşkirina rastiya civakî û ravekirina mijarên girîng û bûyerên balkêş û her wiha nîşandana dîmenên ji-yana zor û zehmet de jî, ev roman hejrayî pesindanê ye.

Di romanê de serlehengê romanê Dilgeş hewl dide ku bibe nivîskar. Loma jî ew gelek dixwîne û car caran di ajandaya xwe de dinivîse. Sozda helbesteke wî ya evînî di ajandeyê de dixwîne. Helbesta wî, nivîs û gotarên wî serkeftî ne. Helbesta ku wî jî bo evîna xwe anku ji bo Sozdayê nivîsiye gelek li xweşa Sozdayê diçe, li ser wê bandoreke xweşbînî pêk tine û ew pê dilşad dibe. Di helbesta evînî de -ku Sozdayê mendehûş dike- hes-tên evîndaran dişibin pêlên deryayê.

Nivîskarê romanê Omer Dilsoz bi şeweyekî hunerî, bi peyv û hevokên edebî roman xemilandiye û ew bûye mîrê gotin, peyv û hevokan. Bûye mîrê dilê evîndaran, bûye vebêjê derbirîna kesên birîndar û pêşkêşvanê jana civakê. Jana jibîrbûyiyan, jana bêmirazan, jana birîna birîndaran, jana ciwanên dilpak, jana gundên wêran û jana zindaniyan. Û her wiha ew bûye parêzgerê doz û rastiya pîroz a kurd û Kurdistanê, bûye dengê tîfinga gerilayên çiya, bûye xwêdana keda karker û kedkaran, bûye dengê bilûra şivanan, bûye vebêjê evîndarên birîndar. Bûye hawara gundiyan gundên wêran, qerîna lehengên berxwedana heps û zindanan, nalîna çekdarên dilketî. Bûye dengê çekên çekdaran, bûye tirêjên hêviya ji bo pêşerojê û bir û baweriya pîroz a azadîxwazan. Doza netewa kurd di nav rûpelên romanê de bi şeweyekî edebî hatiye raxistin û bi rengên hunerî û bi dîmenên rengîn hatiye xemlandin.

Nivîskarê romanê Omer Dilsoz jî Çolemêrgê ye. Qada cihê romanê jî Çolemêrg e. Di romanê de gelek peyvên herêmî hene ku ez bi xwe maneya wan nizanîm bê ew peyv tene çî watayê. Ez ê wek mînak çend peyvên li jêr rêz bikim.

Venûs, mendehûs, mijlank, niquloz, qir-nij, sergop, nijin, heçko, xifsek, verût, nekamî, sermest, demildest, lîrxîn, nogov, sexbêrî, diazirî, bakurîfk, lêmişt, rajen, mandî, lîlav, verestî, vemalist, verêj, mandel, sûsmar û hwd, gelek peyvên herêmî di romanê de hatine bikaranîn. Xwezî li dawîya pirtûkê ferhengokeke kurdî bi kurdî hebûya û maneya van peyvên herêmî bihata nivîsandin. Helbet peyvên herêmî jî bi kurdî ne û ev jî dewlemendiya zimanê kurdî ye. Lêbelê ji bo ku ev peyv di herêmekê de tîne bikaranîn, kesên herêmên din bi maneya wan nizanin. Nivîskar Omer Dilsoz di romana xwe ya bi navê "Neynika Dîlî" de li paşîya pirtûkê ferhengoka peyvên herêmî amade kiriye û ev tiştêkî gelek baş e.

Piştî vê balkêşîya peyvên herêmî, dîsa em vegerin naveroka romanê. Lehengê romanê Dilgeş hem aşîqê Rozayê ye û hem aşîqê Sozdayê ye. Ew jî her duyan jî hez dike û di nav her duyan de maye. Ew bi her duyan jî şa dibe. Pevşabûna Dilgeş û Rozayê sahnayeke xweş a erotîk radixe ber çavên xwendevanan.

Belê, Dilgeş di nav her du evîndarên xwe de maye û nizane çî bike? Bi kîjan aliyê ve biçe? Li aliyekî evîndara wî Roza û li aliyê din evîndara wî Sozda. Di navbera Dilgeş, Roza û Sozda de çî dibe? Çî diqewime? Çima Dilgeş dev ji Rozayê berdide û bi Sozdayê re berê xwe dide çiya? Bersiva van pirsan bila wek meraq bimîne. Dema xwendevanên kurd vê romanê bixwînin dê bersivên van pirsan bizanibin.

Piştî xwendina romana Omer Dilsoz a bi navê Bêhna Axê û şirovekirina wê ya di vê gotarê de, wek gotina dawîn, ez vê bibêjim; nivîskarê heja O. Dilsoz bi zîmanekî edebî û bi hûnandineke hunerî berhema xwe afirandiye û wî bi berhemên xwe cihê xwe yê bi qîmet û rûmet di nav nivîskar û romanivîserên kurd de girtiye. Ev gotara min nivîseke derengmayî ye, lewre jî ez ji xwendevanên kurd û ji nivîskar doza lêborînê dikim. Divê min nivîseke wiha ji zû ve binivîsiya.

Du gulî

Dilşêr BÊWAR

Mirin û Hêvî

Di şeva tarî de
Bajar di xewa mirinê de digevize
Mêvanê hewşa peyvên telaqavêtî me
Di guhê min ê ker de
Newayek ji tembûra bê tîl dinale
Melkemot di pêgermoka mirinê de ye
Bi tiliyên hişk û terikî
Bîra guliyên kezîkuran vedikolim
Gulistaneke tozgirtî dipijiqe
Bi dilşadî
Serê xwe datînim ser çoka şevê
Digirnijim li yarê
Lê lê
De were bifirkîne pişta êş û elemên westiyayî

Birîn û Bîranîn

Lê lê rûheyvê
Evînên westiyayî diweşin ji kenê te
Yarî û henekên te yên kovanbar
Lalîa ya xwe bi xwîna pêûsê dilorînin
Awazên dîlkizirî ji xunava biskên te dibarin
Şevên porgijik birînên xwe di
Êvara guliyên te yên hinekirî û
Reşika di çavên te de diçûrise dikewînin

26.07.2009 Stenbol

Sê helbest

Mehmedxan GULŞENOGLÛ

Hilma Tehl

Qesr û qonaxên derewîn
bila biqelibin di ser me de
jînperestên bê xem û bê bext

Evîn çima bê wate ye bê te?
Ma kanî ew kenê te yî revok,
ka bêhna şevê, ka hilma tehl,
çavên te yên li ser goran peritî?

perçikî roj li ber lingê te
hîv bê hêvî ma li ser rûyê te,
rozerîn ji hev bela bû li ser memikên te

Şikestim

Bazik û bejna spî
li ser singa reş...
Bavê mirî,
diya sêwî
çavê peqle li ser bedena te yî geş
ez bavê mirina te me!
Diya min çû erdê,
bi dev û rû
şemitî hesta min a şikestî
pelixî lingê min î li ser serê min.
kopê min î bê rêz û çewt,
li ser rûyê min î bêar
cana şêrîn şikest..
li ser mirêka min î di şibakê de
porê hûnayî ketiye
bi bayê sorbûnê.
sot û bizot cemidîn
di himbêza te de!

Mehr

Marmarok li canê min geriya
Pûçbûna te me yarê
Xelasiya min çavên te yên sor in
Perçikandina min jîna te ye!..

Ez Xwedanê jêr im
te ax û oxa min ji bîr kir
li ber sûra çiya?
Ez nemir im
û najîm.
Porên ewriya şevê,
tariya min revandina çavan e.
Çongên min bê qudûm in.
milên xwar bûyî,
pozê çiya destûra xeyalên min e.

Çawa herim û wan tenûran bihêlim?
Nanê min
cana min î rêbaz û bi lez
eeeey diya bê gor,
birayê bêmirad,
çavên şikestî!
Çi ye daxwaza van gundên qelişî?
Ma çi li ser ewrên çiryayî qewimî?
Udra wan birûskan xema kê ye?
Ma kî ma kî mir?
Kî mir?

10.08.2009

Berxik

Fewzî BÎLGE

Awêneyek hebûya
Li ber çavên stêrkên porkur
Wî ya
Gava berhev berhev li dewsa maçên
dêya te dida
Ezman xemginiya çavên Eyşe Şan
Bêdengiya çolan
Belkî ji ber wendabûna dewsa maçên
dêya te ne
Tu ket
Tivîlkên kut li ezmana dikûliyan (difir-
yan)
Di rûyê wan de bişîrîneke Mona Lisa
Zeman li xwe vegeriya
Geriya
Çavên te asûmanê sad diderizandin
Tu di nav okyanûseke bê av
Di devê gurekî manco de ma
Binêrin
Çavên te rengên roja ku wê hilê
Tev di xwe de civandine
Bê text
Bext
Pelek
Pelek dikira biweşiya bê wext
Ji dewsa nigên mediyên
Ax

Ax avis e dîsa
Tu nemaye -zik li ber dev- dike bizê ber-
xikekî weke te çavbelek
Belkî bifilte
Vêca ji derba
Ax awêneyek hebûya
Binê behrên bêbinî
Û
Kenê te
Çavên te
Gava perda çavan diçirand rê bidaya
Di wê kêliya
Weke çirokan de
Stêrkan porên xwe berdana
Û hinekan çend maçên jidil yên wan
Ji berdêla yên dêya te
Ji te re bianiyana
Ax! çirokek min hebûya
Dîmenên hovekî
Û yekî nizane helbesta binivîsine
Çend roj e di şer de ne
Şev mir
Sebir kevîr
Û tişteke hebûya bibûya hibîr
Wê hinekan helbest binivîsandina
Ax! Helbestek min hebûya

Dêranî gundê Xurûcê

Dengbêj: Aşemê ŞUKRÎ

Amadekar: Hîlmî AKYOL

De dêranî dêranî dêranî dêranî dêranî dêranî dêranî dêranî
Wele yadê rebenê dibê li Xurûca şewitî rabiye kafîstanî nemaye bisilmanî bira dêranî,
De Dilşa radibû garana mala bavê xu ji xopana Xurûcê derdixistin, derdiketin ser me-
zelê Xurûcê.

Were bira dêranî
De bala xu didanê sê siwar sekinîne li ser kaniya Xurûcê.
Dizgînê hespê wan berdandî ne,
li serê wan şerê Mosilî ne,
wele li nava milê wan ebayê hesenî ne,
di piyê wan da gîzmê qonderî ne,
li ser qorikê wan demançe birebêlî ne, navbera wan û zîna wan da tîfîngê bêşlî ne were
dêranî, were dêranî dêranî dêranî dêranî de Dilşa dizgîna hespê leyê Hecî Mûsa Begê digirt
digo:

Winê werin qawekî mala bavê min bixwin hêna herin were bira dêranî, were dêranî mi
dî de leyê Hecî Mûsa Begê serê xu bilind fikir. Digo: Dilşa dêranî wele min ê xizalkî raki-
riye ji Pozê Entabê.

Wele berê xizala min ketiye xopana vî Sîpanî,
Ti yê here ji birayê xu ra bêje. Roja ser erdê Xurûcê paxnotkî perê min li wan bû. Bira ji
mi ra bişeyne. Bira dêranî,
Were dêranî dêranî dêranî dêranî
de Dilşa li ba diketin derê malê. Bala xu didanê. Emîn û Ezîz û Emerê bira her sê bi tenê
rûniştî ne li ber derê malê bira dêranî.

Wele dibê bira li Xurûca şewitî rabiye kafîstanî, nemaye bisilmanî, min ê ji we ra digot
îro sê rojê we ye fişekê serpîlê di mala we da qedyane. Win ê rabin ji xopana Xurûcê derk-
evin.

Wele rokî ley Hecî Mûsa Begê bavê ser Xurûcê. Ê heyfa cendekê Pozê Entabê ji ser we
helîne, Bira dêranî.

Bi xwedê dawa paxnotê pera dike. Derdê wî ne paxnotê pera ye. Derdê wî heyfa cendekê
Pozê Entabê ji ser we helîne, Bira dêranî.

Were dêranî dêranî dêranî dêranî dêranî dêranî
Mi di Emerê bira serê xu bilind fikir. Digo Dilşa dêranî.
Ti yê rabe berê xu bide mala Xelîlê Şalfire.
Xelqê welatê jêrîn e, wez pê hesiyame fişekê serpîlê di mala wî da hene.
Ti yê jê ra bêje apo gelek silavê birayê min ji te ra hene.

Wele dibê bira ji me ra bişeyne cotek fişekê serpîlê. Cotekî gamêşê min ê box hene, jê ra
bişeynim. Bi wî jî qayil nabe. Nîvê garana Xurûcê garana Mala Emer e. Sibê jê ra veqetî-
nim bira dêranî.

Ege bi wî jî qayil nabe bîst û heft heb tapiyê me hene li xopana Xurûcê. Sibê li Melazgira
şewitî jê ra bikim yek tapîkî li ser navê wî derînim wî bira dêranî.

Were dêranî dêranî dêranî
Mi di de Dilşa radibûn berê xu didane mala Xelîlê Şalfire dilezîne, bira dêranî.
Dibê: Lo apo de wez ê dexilê mala apê xu ketime apo gelekî silavê Birayê mi ji te ra hene.

Dibê bira ji me ra bişeyine cotekî fişekê serpilê cotekî gamêşê min ê box hene, jê ra bişeyinim. Bi wî jî qayil nabe. Nivê garana Xurûcê garana Mala Emer e. Sibê jê ra veqetînim bira dêranî.

Ege bi wî jî qayil nabe bîst û heft heb tapiyê me hene li xopana Xurûcê. Sibê li Melazgira şewitî jê ra bikim yek tapîkî li ser navê wî derxim apo.

Were dêranî dêranî dêranî dêranî dêranî dêranî

Dibê de bira mala apê min here ber mîratê. Dibê de çawa nade. Bira dêranî.

Dilşo li ba diketin ber derê malê. Bala xu didanê. Emîn û Ezîz û Emerê bira her sê bi tenê rûniştî ne li ber derê malê, bira dêranî.

Wele dibê bira li Xurûca şewitî rabiye kafîrstanî, nemaye bisilmanî, bira dêranî.

De mi di Ezîzê bira serê xu bilind dikir. Digo Dilşa diya diya min ê de ti yê rabe lez ke bi-lezîne de berê xu bide Melazgirê wele çawa başçawîşkî kurmanç e li wê derê

Ti yê jê ra bêje. Bira tîlefônî bike üçîncî ordiya Erzeromê Hesênqele-yê bi ser me da bişeyine. Bira dêranî.

Were dêranî dêranî dêranî dêranî dêranî dêranî

Xwedê zane de Dilşa radibû, lez dikir dilezîne berê xu didane Melazgirê, bala xu didanê

Leyê Hecî Mûsa Begê li ser zinar rûniştîye. De wele Reso serê xu bilind dikir, digo mala te xira be. Hela bala xu bidê Qîza Mala Emer e. Şiyandine bi ser me da vê sibekê li me ne-sîheta tîne bira dêranî.

Were dêranî dêranî dêranî

Mi di ley Hecî Mûsa Begê serê xu bilind dikir, digotin: Dilşa dêranî, bi Xwedê ti yê li ba-keve ber derê malê. Derkeve ser mezêlê Xurûcê. Kinga mi her sê cendkê birayê te kişande ser mezêlê Xurûcê, ti yê hêna here Hesênqele-yê bi ser me da bişeyine.

Were dêranî dêranî dêranî

De mi di Dilşa li ba diketin ber derê malê. Bala xu didanê Emîn û Ezîz û Emerê bira her sê bi tenê rûniştî ne li ber derê malê.

Dibê bira bi Xwedê li Xurûca şewitî rabiye kafîrstanî, nemaye bisilmanî,

de Mila Entabê, Hesênika, Sîpika, Qasimiyê her çar etrafê Xurûcê nobetçî tê da rûniştî-tîne lawo.

Wele her dû metkê we li Sîpanê Xelatê ne, per û baskê xwenga we ti nîn e, xwenga we bifre xu bavê Evdîlcewaza şewitî, bira dêranî.

Were dêranî dêranî dêranî.

De winê rabin destê xu bavêjin darê serpilê derkevin ser mezêlê Xurûcê. Bira dêranî.

Xwedê zane bira ley Hecî Mûsa Begê were heyfa cendekê Pozê Entabê ji ser we helîne, law qumatekê we rabin heyfa we bi destê xu helînin. Bira dêranî.



Ji bo du yaran

Mistefa TÛNÇYUZLU

Min ji bo du yaran rijand
Ser şarapnelên birçî
Çavên şahbelatî yên têr tiji
Min ji bo du yaran derman kir
Birinên derder bi şûjinên duh
Bi xwêdanên firmêskî merhem kir
Kulên dilê du dilên li ser hevdu digirîn
Ji hevdu dûr

Dîlgirtî me bi qasî Derwêşê Evdî
Ji bo ax û ava Kurdistan
Dîlgirtî me bi qasî Memê Alan
Ji bo bax û baxçeyên Lûrîsirûştê nayê-
ger

Min ji bo du jinan şer kir
Du jinên dilbendî azadî
Min ji bo du jinan xwe da kuştin
Li nav tixûbê mayînen hejîner
Bi bêhna porê yara dilgir ve

Ji bo du jinan hatim kuştim
Di bin baranên kuncikên kûrbûyî de
Ji bo dilên wan ên ji hev bûyî
Ji bo yara mûyê canê wê
Dikizirin di her kêliya yara azadiya dûr
Ji bo yara keziyên kurbûyî
Yên li ber pêlên Dijleya dilnêrm dayî

14.05.2009

Dev ji min berdîn

Nesrîn NAVDAR

Dev ji min berdîn dibêje girtî.
Tenê çî dixwazim?
Mafê herî xwezahî,
wekheviya jiyanê ye armanca min.
Di şerê man û nemanê de
hilkişiyam çiyayê heyînê
lê di rex dil de ez hatim girtin.
Û ez avêtim zindana rehên xwînber.
Ji jehriyê xwarin û vexwarin,
oksîjen faşîzan,
ronahî sor...
Lê dişa ez di taldeya xwe de kevo-
kekê xwedî dikim.
Ew hesreta asîmana şîn,
ez hesreta firîna wê.

Dev ji min berdîn dibêje dayik.
Hoo! Malkambaxno...
Rakin destê xwe yê qirêjî
ji ser kezêba min.
Ez di Arafê de mam
li benda wendayê xwe!
Ku bi vegera wî
dilê min veguhere bihuştê.
Lê te Araf jî ji min re zêde dît
Nema dikarim rakim
dîtina şewata vê xwezayê.
Dîmenên kesernak
û li qadan zûrîna kujerên
zarokên bê guneh.
Nefel û sosinên di dest min de
veguherîne striyan
nîgalên min xwînî dikin.
Û ez ne bi bêhna gulê mest,
ne jî bi dengê bilbil kêfxweş dibim.
02/10/2009

Du helbest

Şengul OGÛR

Kul(îlk)a diya min

Ez hêstira kul(îlk)a lertzok a sing li sen-
goya me

Ez maçîkirina te ya xatirxwestinê me li
pelgê wê

Ez dadgeha awirê te yên ku Xweda lê di-
hatin bexşandin im

Ez porê te yê kurkirî

Ez tilikên tê yên ku zila wê zexm zemt-
kirî me

Ez puxta ava kul(îlk)a ku di xwîna te ge-
riyayî me

De maçî bikin bêhîsino!

De bavêjin van sengoyan

Wan apoletan binpostal bikin

Wan unîformayan di êgir kin

Ramûsin dest û piyên diya min

Ramûsin çarika wê

Wê ji çavan ramûsin

Ji dilê wê

Ji kulên wê

Ji kul(îlk)a wê

Ma hûn nabînin ku ew ji biharan ha-
tiye!?

Meyzînin çi çem û robar in çavên diya
min!

Meyzînin porê wê simbilên reqsok ên bi-
haran!

Meyzînin mijgulên wê beybûn!..

Qey hûn bê dê ne bêhîsino!?

Qey nîn in xweşdiviyên wê

Nîn in xwîşk û bira

Û nîn e xewneke we ya azadî û aştiyê!?

Îlon 2009, Nisêbîn

Em biçin

Pêjna payizê tê li kûçeyên min ên kavi-
Toza li biniya hêtê ji bîr bûyî bi ber bê
dikeve

Û qirşikên bê nasname xwe li mijgûlê
min digirin

Ez gavên xwe di firazeyekê de winda
dikim

Ev roja han nikare van têlên direhî bi-
helîne

Ev çûkên han ji ezmanê xwe xeyidî,
Wekî dînan niklên xwe di jehra mêr
didin

Em biçin, di nav strîyên zer î hişk re

Di nav toz û xûbarê,

Ba û babilîsokê re

Ji bo berjewendiya gundiyan

Mihemed QOSERÎ

Dûre dîsa keçikek me çêbû. Pişt re me xwest lawekî me çêbibe lê her ku me ceribandinek kir, keç hat; her ku me ceribandinek kir keç hat. Bi vî awayî heta şeş keçan em nebûn xwedî law, lê dûre şikur ji Xwedê re ku lawek da me

Di odeya zilaman de:

Li oda gund gundî li hev civiyabûn, li benda memûrê tenduristiyê bûn. Gundiyê kejk Eliyê Silto:

— Îsal baran baş nebariya. Zadan serî hil-nedan. Gundiyê zeîf Micwel:

— Erê welleh, ê min tew min dused dolim erd jî ji gundê jêr deman kiribû, ew jî şewitî. Gundiyê ciwan Şêxê:

— Ji bo rîsiya giya jî baş çênebû.

Gundiyê navsale Xalê Êso:

— Vê zivistana ku were wê sewalên me jî birçîna bimirin.

Deriyê odeya gund bi zîqînî vebû. Her kesî wechê xwe ber bi derî ve zivirand. Memûrê ku ew li benda wî bûn bi lawê keya Ahmo re, ketin hundir.

— Selamunaleykim.

Civatê bi hev re bersiv dayê,

— Wey elêykimeselam.

Memûr çû li kêleka keyê rûnişt.

Keyê:

— Merhaba ji te re xwarzê.

Memûr:

— Merhaba, serçava xalê keya.

Xalê Êso:

— Merhaba birazê, tu çawa yî?

Memûr:

— Merhaba serçava apo ez baş im, Xwedê ji te razî be.

Micwel:

— Merhaba bira, tu bi xêr hatî.

Memûr:

— Merhaba keko. Tu di nav xêrê de bî.

Keyê berê xwe da civatê û got.

— Hûn pê dizanin ku civîna me ya li vir, sedema xwarziyê min e ku ew ê di der heqê hin berjewendiyan de agahîna bide me. Tiştên ku wê ew jî me re bêje jî bo fêda me ne. Bi rastî divê ku ew çî bêje em wan bi cih binin.

Li memûr nihêrî û gotinên xwe berdewam kir:

— De kerem ke xwarzê. Tu bêje û em li te guhdar bikin.

— Spas xalê keya.

Memûr li civatê zivirî,

— Weke ku xalê keya jî got, tiştên ku ez li vir bibêjim jî bo fêda me tevan e. Birano, weke ku hûn jî dizanin ku jiyan roj bi roj zortir dibe. Ne karê çandiniyê, ne karê xwedîkirina sewalan û ne jî karên bi piyan ku li bajarên mezin tên kirin êdî ne weke berê ne. Tu yek ji wan jî zikê mirovan têr nake. Jixwe yê me kurdan qet têr nake. Ne insanê me yê ku zana ne têra me dîkin, ne dewlet li welatê me pêşxistinan pêk tîne û ne jî dewlemen-diya me ya şexsî heye.

Xalê Êso:

— Erê welleh, tu rast dibêji xwarzê. Aha va ye nêzikî sed pezî ez xwedî dikim, lê bi Xwedê ez di ber êmê wan re nagihêm. Xwe xelas nakin.

Eliyê Silto:

— Tew îsal baran jî nehat. Li zozanan çêre jî bi dest nakeve. Yê min jî zad tevde di erdê de ma. Ez difikirim ku ez erd cot bikim.

Keya kete navbera gazinên gundiyan

— Tu tişt ji destê me nayê. De bihêlin bila xwarziyê min gotinên xwe biqedîne.

— Belê hûn tev rast dibêjin. Em derdên xwe rêz bikin, sê roj û sê şevan xelas nabin. Bi ser ew qas derd û kul de tebîetekî me yî din jî heye ku qet nayê gotin. Her yek jî me ligel vê xizaniyê dîsa jî zarokan di biniya şeş û heftan re çênake.

Xalê Ūso bi ken,

— Belê, bi Xwedê wisa ye. Tew carnar em neviyên xwe jî nas nakin.

— Divê ku em çareseriyekê jî vê meseleyê re bibînin. Bi vî awayî nabe. Hatina min a vê derê jî bi vê sedemê ye. Geli hevalan, ez û hevaleke xwe ya jin li gundan digerin. Di der heqê vê mijarê de em gundiyan xwe agahdar dikin ku çareseriyek jî ve pirsîrêkê re bê dîtîn. Belê dewletê em şandine vê gerê, em memûrên dewletê ne. Lê em jî kurd in. Em xwişk û birayên we ne. Wa ye hevala min li aliyê din jinên gund anîne ba hev û bi wan re diaxive. Divê ku hûn bi me bawer bin.

Xalê Ūso:

— Estexfirelah xwarzê, ev çi gotin in? Ma em bi te zanin, em bi eşîra te jî zanin û em bi gundê te jî zanin, “îcar bawer bibin” çi gotine?

Keya:

— Xwarzê tu rihet biaxive. Dibe ku em bi dewletê ne bawer bin lê ma tu, tu ne mîna dewletê yî. Tu jî me yî.

— Ez jî we re spasdar im. Erê; weke min gotî, em di der heqê mijara xwe de axaftina xwe bidomînin. Li vî gundî rewşa nifûsê çawa ye?

Şêxê:

— Hema te li her derê çi dîtibe, li vir jî eynî wisa ye. Li kolanan zarok jî mirîşkan zê-

detir in. Mesela yên Xalê Ūso, heft zarokên wî hene.

Memûr li hêla ku gundî nişan kir nihêrî, zîlamê ku behsa wî dihat kirin di bin simbêlan re dikeniya. Memûr bi ken got “Belê xalê Ūso jî vala nesechiniye” dûre li gundiyan nav-sale zivirî û jê pirsî:

— Apo, gelo zarokên te çend in?

Xalê Ūso:

— Çar lawên min hene.

Memûr:

— Baş e apo, te hew çar zarok çêkirin ha!...

Xalê Ūso:

— Na, zarok çêbûn. Deh çêbûn, lê pênc ji wan keç in. Em di hesabê zarokan de keçikan najmêrin. Min tenê yên mîr gotin. Zarokekê jî di biçûkantiya xwe de rehmet kir.

Memûr:

— Apo ma tu qîzên xwe jî xwe nahesibîni. Ew ne zarokan te ne, qey tu jî wan hez nakî?

Xalê Ūso:

— Ma çawa ne zarokên me ne, em çawa ji wan hez nakin! Lê ez çi zanim, hema wisa te gotin, ez jî mecbûr dibim ku wisa bêjim.

Memûr jî civatê re got:

— Heger hûn jî tevlî vê xebatê bibin em dixwazin ku vê pirsîrêkê jî nav gelê xwe rakin. Bila zarokanîna zêde ji nav me jî rabe.

Keya:

— Xwarzê jî me gundiyan re zarok divên. Di nexweşiyekê de, di karên gundan de, ez jî te re bibêjim di eşîrtiyê de. Zarok lazim in ha!

Memûr:

— Xalê keya belê zarok lazim in, lê ji bo her zarokekî jî çewalek pere jî lazim e. Em dixwazin ku zarokên me cahil ranabin. Bêkêr nebin. Bila zarokên me jî wek yên alemê zana bin. Bila bixwînin, li pêş civakê bimeşin û jî mîletê xwe re bibin kesayetîne minak. Ê em neh deh zarokan çêdikin û ji

vana jî yan yek dixwîne yan naxwîne, hemû yên din jî yan dibin şivan, gavan, karker yan jî dikevin nav karên ne li rê. Binerin tirk ji bo me çi dibêjin. Ew dibêjin zarokên me dixwînin, bi pêş dikevin lê yên we tev dibin diz û esrarfiroş. Em dizanin ku mesele çi ye, lê ew wisa nafikirin. Ê wan an du zarokan çêdikin an jî sê zarokan. Ew wan zarokên xwe jî bi îmkânên hêsan û xweş mezin dikin, wan li gor dilê xwe jî didin xwendin û serê wan jî aram e.

Şêxê:

—Ê ma weleh ê me jî weke wan dixwînin.

—Çawa weke wan?

—Mesela em bi xwe heft bira û du keç in. Birayekî min mamoste ye, yek teknîker e û xwîşka me ya biçûk jî li lîseyê dixwîne.

—Êêê...

—Yanî li gor vî hesabî tu wan bîdî ber hev ên me jî sê kes dixwînin. Tew bi ser de em bi şeş kesî jî ji wan zêdetir dimînin.

Memûr bi ken got:

— Weleh hesabê te rast e. Lê bifikire ku di van şertan de birayên te bûne mamoste, teknîker; heger şertin hebekî baştir hebûna wê çaxê ew ê bûbûna profesor.

Şêxê bi van gotinên memûr ên dawiyê hebekî xemgîn bû û got:

— Rast e. Mêjiyê birayên min dişixûle, heger şertin hebekî baştir hebûna belkî wê di cihên çêtir de bûna. Ê ka ev tiştê ku tu dibêji wê çawa çêbibe, em ê çawa zarokan kêr bikin?

Memûr got:

— Hêsan e! Her tişt di destê we de ye. Divê ku berî her tiştî mirov di mêjiyê xwe de bawerîya xwe çêbike. Mesela ez û Ahmo bi hev re ketin hundir. Berî ku em bîn, me bi rê de hebekî bi hev re sohbet kir. Ew dibêje me xwest ku zarokek jî me re çêbibe. Ya ewil çêbû keçik bû. Dûre dîsa keçikek me çêbû. Pişt re me xwest lawekî me çêbibe lê her ku me ceribandinek kir, keç hat; her ku me ceribandinek kir keç hat. Bi vî awayî heta şeş

keçan em nebûn xwedî law, lê dûre şikur ji Xwedê re ku lawek da me. Ji xwe meseleya Ahmo meseleyeke hebekî zor e. Bi texmîna min ev fikir di serê me tevan de jî heye.

Tevahiya civatê bi heqdayînî serê xwe hêjand. Di ber xwede jî bi gotinan “Rast e, bi serê kê de bê, wê wisa bifikire” gotin.

“Ya herî girîng ev e zarok ku keç be, law be; çi dibe bila bibe lê belê ew xwîna mirovan e. Divê ku mirov cihêkariyê nexer navbera zarokên xwe. Gava ku mirov bide dû zarokan û wan zêde bike, zarok her ku pir dibin, xwedîkirin û mezinkirina wan hîn zehmetir dibe.”

Xalê Ūso:

— Ê soxî, de ka ji me re bêje bê ev mesele çawa çareser dibe.

Memûr:

— Weke ku min berê jî gotibû, çareserî di destê me de ye. Ligel îradeya me di der heqê mijarê de hin şêwaz jî hene. Hevalino di tenduristiya însanan de qet tiştêkî ku mirov jê fedî bike tune ye. Ev di jiyanê de pir normal in. Em tev kêr zêde bi tiştina zanin. Gotinên ku em li vîra bîjin ne tiştên eyb in û ne jî fedî ne. Ji şêwazên dihemlebûnê ya herî hêsan û bê mesref ev e; gava ku munasebeta we ya cinsî bi jinen we re çêbû, di asta herî dawîn de hêdika xwe bi paş ve bikişînin. Bila tu tişt jî laşê we derbasî laşê jina we nebe.

eyê zeîfokî bi kenekî wênok got:

— Naa, bi vî awayî çênabe! Yabo bi Xwedê di wê asta ku tu qalê dikî de ne ez dikarim xwe bi paş ve bikişînim û ne jî artêşa tirk dikare min bi şûn ve bikişîne.

Fîqînî bi her kesî ket. Xalê Ūso:

— Êdî ji xwe mirov fam dike bê tu çima wisa mayî hestî û çerm.

Memûr li gundiyê zeîf zivirî û got:

— Ê madem tu wisa dibêji, wê çaxê ez ji bo te çareserîyeke din bibêjim.

Dûre gotinên ku dixwest ji gundiyê zeîf re bigota, berê xwe da civatê û ji her kesî re got.

— Hûn dikarin bi hesabê edeta jinên xwe jî munasebetên xwe yên bi jinên xwe re eyar bikin. Ew jî şewazek e ji şewazên lidijhemlebûnê ye. Roja ku edeta jinê pêk hat di bîra xwe de bihêlin û rojên ku munasebeta cinsî qedexe ne teqîb bikin. Piştî edeta jinê ji roja çardehan, heta roja bîst û duduyan an jî bîst û sisêyan bi jinen xwe re ranekevin, tu pirs-girêk çênabe. Lê bi texmîna min ev jî li we nayê, hûn ê bibêjin ma îcar karê me nema hema her meh, her meh em ê li benda edeta jinê û hejmartina rojan bin!

Lawê keya Ahmo:

— Tu me jî me bêhtir nas dikî. Kes nikare vî hesabî her meh her meh di serê xwe de bigire.

— Yek ji şewazên kontrolê jî dermanên mehane ne. Hebên ku nahêlin jin bi hemle bimin jî hene. Mehê derbekê hûn ê wan hebab bikirin û wê jinên we wan bixwin. Wê çaxê jî bi hemle nabin.

Eliyê Silto:

— Derman jî li bajaran li dermanxaneyan tîr firotin, ne wisa?

Memûr:

— Belê li dermanxaneya hene.

— Ma wê kî here dermanxaneyê û wê bête ka hebên dijihemlebûnê? Weleh em ê fedî bikin. Jixwe her meh her meh here baje û dermanan bikire, pere jî di ber re nagihên.

Memûr di wê navberê de ji çenteyê xwe kî-sikek derxist.

— Derman jî ji we re biha û bi zehmet bin, va ye ev jî hene. Ev qewlik li her dermanxaneyê peyde dibin, gava ku hûn çûn baje van qewlikan ji xwe re ji dermanxaneyekê li ser hev bikirin, wê têra we û salekê bike. Ne hewce ye ku hûn her meh ji bo wan herin baje. Evana ne biha ne jî.

Xalê Ūso rahişt qewlikê ku mîna lastikekê bû û hûrnêrîn li ser qewlik kir.

— Ev çi ne looo! Min qet neditibûn. Ji çi re dibin. Wek nepoxê jî vedizelin.

Keya:

— Ev lastik wê nehêle ku zarok ji mirovan re çêbibe?

Memûr,

— Erê.

Keye:

— Îcar! Ka ev mîrat çawa dixebite?

— Ji van re dibêjin qewlikê zilaman. Ew weke ku apê min jî gotiye, vedizelin. Gava ku hûn bixwazin bi jinên xwe re rakevin hûn ê bi kar binin û van qewlikan derbasî cihê xwe yî mehrem bikin. Piştî ku karê we qediya, hûn ê dîsa qewlik derxin û bavêjin sergo.

Keye:

— Weleh wê navê gundê me bi sosreti derkeve û em ê di nav dinya alemê de bihetikin. De ji xwe re hebekî bifikirin, wê çar aliyê gund bi nepoxên avêtî tije bibe. Ka wê çaxê em ê çawa li wechê hevdu binihêrin, em ê çawa derkevin nav xelkê?

Çênabe xwarzê, çênabe. Ev ne tu kar e, ya herî baş tu dev ji me berde. Em çiqas zarokan çêbikin jî bila çêbibin, ji nepox û hebikan çêtir in. Tu karmendê dewletê yî. Te wezîfeya xwe bi cih anî. Te ji me re her tişt got û me jî li te guhdar kir. Lê ev ne li gorî me ne. De ka em ji xwe re qala tiştêkî din bikin...

Di odeya pîrekan de:

Memûre çenteyekî reş di dest de ket hundir,

—Roja we bi xêr.

Jina Micwel Eysanê:

—Qey bi xêr, ser çava, xêr li te be.

Jina keya,

—Tu di nav xêrê de bî, tu li ser çavan hatiyî qîza min.

Memûre,

—Xêra Xwedê li te be xaltîkê.

Xalise:

—Tu bi xêr hatî xwakê.

Memûreyê lê nihêrî û bi ken got,

—Xêra Xwedê li te be. Hûn tev rihet in, baş in?

Jina keya û jinên din bersiv danê,

—Elhemdulillah, em baş in.

—Xwedê birayê te bihêle, em silamet in.

—Bila hûn ji me re baş û sax bin keça min.

Jina keya ji memûreyê sewal kir,

—De hela ka ji me re bibêje bê hûn bi çi sedemê hatine gundê me qîza min? We em civandin ser hev tu yê çi ji me re bibêji?

Memûreyê bi dengê maqûl û bi xwe bawer bersiv da jina keyê,

—Belê, me hûn civandin ser hev, li me bi-borin. Me hûn ji kar û barên we kirin. Ez û hevalê xwe em karmendên dewletê ne. Dewletê jî wezîfeyek da ber me û li ser zêdehiya nifûsa van gundan xwest ku em gundiyan ji bo kontrola zaroanînê agahdar bikin.

Jina keya:

— Ê ma em rebenên Xwedê karin çi bikin qîza min, Xwedê zarokan dixuliqîne. Ma mirov karin li ber emrê Xwedê derkevin.

— Na xaltikê, wisa nebêje. Gelek tişt ji destên me tên. Di der heqê vê mijarê de tiştê herî girîng dikeve ser milê pîrekan.

Xalîse:

— Yadê zilamên me dixwazin ku zarokên wan zêde bin. Em bi wan nikarin. Ma em ê li ber zilamên xwe rabin? Dibêjin zarokên zêde pêşeroja me ne, hêza malbatê ne.

Memûre:

— Dîsa ji hêza jinan ji ya mêran bêhtir e, jin karin bikin ku zarok çênebin.

Xalîse:

— De ka ji me re bêje bê em ê çawa nehêlin ku zarok çêbibin.

Memûre:

— Hêsan e. Ez ê hinek agahiyan bidim we. Ya ku hûn bi xwe karin bikin yek jê ew e ku, piştî di ser edeta we re sêzdeh çardeh roj derbas bûn, ji wê rojê û heta roja bîst û yek an jî bîst û duduyan mehêlin ku zilamên we werin derdora we.

Eyşanê:

— Weleh yadê kes ji me nikare di nav vî karî de wî hesabî bike. Him em nehêlin ji wê ew bi zora xwe daxwazên xwe bi cih binin.

Memûre:

— Madem hûn dibêjin ew nabe, hêza me nagihêje zilaman, wê çaxê vêya bikin. Gava ku hûn bi zilamên xwe re raketin li wechê zilamê xwe binihêrin. Nêzî demên dawîn we çawa dît ku çavên zilêm pehn û şaşo paşo bûn, hema hêdika xwe bi paş ve bikişînin.

Meqbûleya ku di nav jinên rûniştî de ya herî ciwan û bi xeml bû bi dengê şaşbûyî ji memûreyê pirsî û got:

— Yanî wan demên dawîn çavên wan pehn dibin, em ê ji wê çaxa ku çav pehn bûn xwe bi paş ve bikişînin?

Memûre:

— Erê, hûn li wechê wan û çavên wan binêrin, hûn ê texmîn bikin ku hûn ê kîngê xwe bi paş ve bikişînin. Bila tu tişt ji laşê zilamên we derbasî laşê we nebe.

Meqbûleyê bi kenekî muzîp:

— Yadê weleh di wan demên dawîn de ku tu dibêji çavên mêran şaşo paşo û pehn dibin ê min bi xwe tew çavên min girti ne. Ez wî jî nabînim û çavên wî jî nabînim.

Kenekî bi pîrekan girt, giş bi hev re kenîyan.

— Ê ji bo te jî çareserîyeke min heye. Tu karî hebên lidijîhemlebûnê bixwî.

Meqbûle:

— Heb bi pereyan in? Mirov bi pereyan di-kire yan dewlet wan belaş dide xelkê?

Memûre:

— Na, ne belaş in. Hûn ê bi pereyên xwe

wan bikin.

Meqbûle:

— Ma ji ku dikirî? Ew jî nabe.

Memûreyê ji pîrekên din re got:

— Çareserî pir in. Bes ku hûn bixwazin.

Tiştêkî weke lastîkê ji çenteyê xwe derxist û dest bi nasandina wê kir.

— Binihêrin, di der heqê tenduristiya xwe de divê ku em ji tiştêkî fedî nekin. Ev tiştên ku ez ji we re dibêjim di der heqê tenduristî û qenciya mirovan de ne. Qet ji hevdu jî û ji mêren xwe jî fedî nekin. Bi serbestî tiştê ku hûn pê nizanin ji hev re bibêjin, bipirsin û xwe hînî jiyane bikin. Hûn vî tiştê ku di destê min de ye dibinin ne?

Jinan bi hev re serê xwe hêjandin.

— Erê, em dibinin.

Memûre:

— Ev tiştê ku di destê min de ye, bihayê wan ji bihayê dermanan gelekî erzanîr e. Ji vî tiştî re dibêjin qewlikê zilaman. Zilam vana derbasî cihê xweyî mehrem dikan. Mina ku çawa goreyan dixin lingên xwe, ev ji wisa ye.

Xalîse:

— Bê lome be...

Memûreyê berdewam kir:

— Mêrên we karin vana ji bajêr ji xwe re bikin. Li her dermanxaneyê bi qutiyan tên firotin. Gava ku kirîn ji heger ku zêde bikin, wê têra we û salekê bikin û wê çaxê jî ne hewce ye ku ji bo qewlikan her tim herin bajêr.

Eyşanê rahişt yekê û bi şaşbûniyekê;

— Li min pepûkê, ev çi ye îcar? Eviya çawa çêdibe lêê?

Memûre:

— Bikaranîna wê hêsan e, gava ku zilam tên ba jinan weke ku goreyekê têxin nigên xwe; qewlikekî ji van qewlikan derbasî cihên xwe yî mehrem dikan.

Eyşanê:

— Ê ev pir biçûk xuya dike.

Memûre:

— Na, ne weke ku xuya dike ye. Ew mîna nepoxekê vedizeli û fireh dibe.

Eyşan kenîya:

— Bi Xwedê çiqasî fireh bibe jî qet fêde nake. Yê min weke hespekî ye, hema ez dibînim ku xwe bi ser min de avêtiye.

Memûre:

— Ê ev nabe, ew nabe... Ka em ê çawa kontrola zarokanîne bikin, em ê çawa pêşiyê li zarokanîna zêde bigirin? Hûn xwe nadin ber tu tiştî.

Jina keyê:

— Keça min ma çi ji destê me tê? Ne gotinên me bi serê zîlamên me de diherin û ne jî hêza me digihîji wan. Êdî pişt li me felîşandine. Tevahiya derdên zarokan ji xwe em jin dikişînin. Gotineke farqîniyan ji bo însanên mîna me heye, dibêjin; “Yek li hil e, yek li mil e û yek jî di zik de pilewil e.” Piştî wextekê em jî êdî hînî zarokan dibin û gava ku zarok tune bin, em jî di jiyana xwe de kêmasiyekê his dikan.

Memûreyê bi xemgînî got:

Ez çi bêjim... Çare ji we re tune ye, êdî Xwedê alîkariya we bike...

14/05/2009

Dîlok

Pîpa dimeşe

Robert BROWNÎNG

Wergera ji îngilîzî: Brahîm RONÎZER

Li werzê nûbiharê
Roj li berbangê
Wê vêga hilavêje
Li şaneşînan xwîsîtiya biriqokî
Beytî fira didin xwe
Şeytanokek bi dirihekê ve hildiperike
Xwedê li qata xwe ya heftan
Dinya di kayîna xwe de ye!
Bo Eva Saulitis

Şev...

Dr. Esed REŞÎDÎ

Wergera ji farisî: Dêrsim OREMAR

Li derî xistin...
Kenê pencerê, li ser lêvên wê winda bû
Û giraniya postala eskerî qirika taxê guvaşt!
Li derî xistin...
Ba bi dengê xwe yê melûl, ber bi newalan ve reviya
Û behr, diranên xwe yên spî bi ser hev de guvaştin
Li derî xistin...
Û şev ji ber şewqa şûrekî lerizî...

Em bi tevahî zarokên mişextiyekê ne

Baran NEZAN

Baye Baltiqê bi te re ey keçika ezîz
Hespên çargavî bi hêz bi ser we de dihatin
Dem dema çûyîna welatê xerîbiyê bû
Hê agir germ bû li ber mirinê
Dibiriqî wek axên kûr ji sing
Sosina çavên we yên hûr çirûsk vedidan
Mirin para we bû
Çûyin ji ya min...
Dengekî ji zaroktiyê digot: "Bavo
min ji bi xwe re bibe
li vir nehêle..."
Her çûyîne li pey xwe mirinek dihişt
Min nedizani
Jan a min e, rihok ê min e
Te ji çavên qederê ji min re hişt
Ez kor, bêçav mabûm...
Agir, tim agir dixwestin xwedayên kevn
Hê nefret û kîna wan ji bo mirovahiyê xelas
nebûbû
Diherikî bi ber çeman ve mişextiya we
Di kolanên teng de wek min
Wek diranekî tenê di devekî de
Wek soza ku min di bin axê de hiştiye.
Her tim li wenêyen kurmgirtî dinihêrim
Bo hêviyeke bextewar
Da ku min jî bibin ber bi Behra Baltiqê ve
Li ser gora bextewariyê
Li ser demsalên kevn û qedim.
Gulên bişkivî di ber gora kalan re derbas
dibûn
Maçkirin jî li ser lêven te yên avdayî ...
Cara yekem e min çavên te ramûsand
Yarê... yara minê
Dayê, bavo min jî bi xwe re bibin
Min nehêlin li vir
Li axeke biyanî û nebextewar
Ditirsim ku dengê xwe yê rastîn winda bikim
Li ser axên xezebgiştî
Ez kesekî tenê me
Ku carna bi dengê kalên xwe radizê
Di xeweke kûr de...
Mirin, tim mirin û çûyîn bû para me
Wisa dixwestin, wisa...

Hezar çûyîn li ser hezar hatinê nayên
avakirin, nayên şûştin bi avên şêlû
Dengê nalîna hespan bibihîze
Da ku em kî ne, ji ku ne...
Naxwazim dengê hespên reş bibihîzim
Dengê ax û nalînan.
Veger ji me re dibe mirin
Bêmalbûn dilê min e
Zarokiya min a sêwîmayî.
Ka dê kî zimanê min bide min
Ka dê kî hêsirên gora min ziwa bike
Ka dê kî ji bilî dengêkî bê ken
Dengekî din bide min?! Ka kî!
Ber bi taya mirinê pêxwas û bênas diçûm
Leşkerên sor û rengûreng li pey min
Bi qîrîna peyama wê çûyîne
Bi dengên xwe yên bilind digotin;
Mirin û mirin...
Gundên şewitî, miriyên bêgor...
Dilê min jî tevî wan bû
Ez şaş dibûm ka welatê min kîjan e
Kurdistan an Ventspils
Gundê ku ez lê hatime dinê
An jî Homerê Alaskayê...
Ax bêwelatî!!!
Biborin min jî bîr kir
Ku zimanê xwe jî tevî xwe bînim
Dê kê bigota ku ez ê bêziman û bêveger bimama
Dê kê bizanibûya min tim li pey xwe miri-
neke bidawî dihişt
Lerzokî me, lerzokî.
Peyvên min nemane
Ji bo te, ji bo mala min a şikestî
Ku bikaribim ji nû ve xwe ava bikim
Hêlinekê çêkim
Da ku vegera çûkan pûç nebe
Nisan û Gulan 2009 Ventspils

Noq

Ezra POUND

Wergera ji îngilîzî: Lenya DILA

dixwazim xwe bişom di nava xerîbiyê de
min difetisînin ev rihetiyên ku xwe avêtine ser min
werê dişewitim û dipêritim ji bo nû
rûyên nû, hevalên nû
ciyên nû!
axx bila her tişt dûrî min be
ji xeynî nû,

û tu,
Evîn, a ku her dem tê xwestin
ma qey ez nakerihim ji van dîwaran, kuçan, keviran
herî, mij û dûman
û ji van rêyên trafikê
wek biherikî ser çolek ziwa biherike ser min
lê, axx li dûrî vir!
giha û newal û gir
û roj,
axx roj tenê bes e
li derve û tenê, di nava hinek
mirovên xerîb de!

Şewat

Ciwan NEBÎ

Bi xumxuma sobê re
ez nikarim
li Karapêtê Xaço guhdarî bikim,
na nema dikarim stêrikek bim,
ez dest pê bikim?
Li her derê şev e,
li paş pencera min jî
û şev vajî tiliya ne.
Şev bi xewa xwe re
min razayî diguhêzin hev
û ji tenahiya min î zexel peya nabin,
ne jî xewnekê neynikek
ji nepeniya min re radixin,
ji hêviyên fediyok re,
ne jî
Ez ê şewatên Karapêtê Xaço
bilind bikim
û sarbûnê vêxim
da ji dêvila mêvanekî ve
tizbiyek
ji qula kilitê derbas bibe,
ez bi dawî bikim?
Ji vir herin bîranînên sibê.

Ez nizanim bê tê bîra te

Robîn ŞERNA

Ez nizanim bê tê bîra te
di şevên me yên şînasûman de
baranên gevezî dibariyan
mezriban rûbar rûbar xwîn dibeliqand
û nêrdewanên lavlavkê dispartin
birînên me, bîranînên me,
di serpêhatiyên me yên zaroktiyê de
tîrojên rojê û birûsk li hev dibûn rêsi
ken û girî li hev dibaniyan
Û ez nizanim ji bo çi
ji xafil de tu digiriyayî

û min her daîm dipirsî
tu bédeng dimayî
bi zaroktiya xwe ya stewyayî

Ez nizanim tê bîra te
serhildanek tîr, têr
dieciqand, şevên me yên nîvşikestî
bi tenêbûnê dorpêç dibûn
veşartokên me
û bi tunebûnê binçal dibûn
evînên me yên gerdenheliyayî
tu bi van şevan re bédeng dimayî
ez bê navber digiriyam

Me tûk fikir li qelaştîyan
îxaneta rûliken û bê navber em digirîyan
ku em neçûne serdana demên çilesirîn
tirs vecinîqandîneke zaroktî
an jî kontîngerilayekî bi rûpoş bû
me hêviyên xwe li tîrsên
xwe fikir û bê navber me xêlî vedikir

li pey evînên koçber
ber bi ba dibûn rondikên me
li ser geveziya binçavbûna
Qoserê bêhnek binçalî
Rapêçabû bajêr
bêhna xwîna şevdermayî

me xwe di bin şevên zaroktiya xwe
ya bi skorskî û apaçî de vedişart
şev bi ser zaroktiya me de dihedimî
Niqut, niqut diheliya zaroktiya me
bi ser xwîna şevdermayî de
û qîrîn bi şevê diket
zarokekî din jî diwelidî.



Xêz: Ahmet BİLGE